

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ

■ Wêje û Psikolojî **Berken Bereh** ■ Li Serbajarê Têkoşinê **Rojen Barnas** ■ Sirên Betalnebûyî **Cihan Roj** ■ Ger Bêhna 'Aşiq Teng Bibe **Mewlana Celaleddîne Romî** Wergera ji Farisî: Hayrullah Acar ■ Wehdeta Wucûdê li ba Melayê Cizîrî û Seidê Kurdî **Merdan Newayî** ■ Tirbêto **Berken Bereh** ■ Alî Bate: Neviyê Elîkê Betê **Abdurrahman Benek** ■ Dil û Xwez **Talat İnanç** ■ Pîvaz **Shahîn Bekir Soreklî** ■ Parçeyekî dî ji Dîwana Windayî: Şîrek nû ji Melayê Bateyî **M. Xalid Sadîni** ■ Delal **Aram Dêran** ■ Siyaset û Mux-tariya Ravînya **M. Xalid Sadîni** ■ Qelem Zêriya **Hinara Tajdîn** ■ Xedra **Bamed Serdar** ■ Du Haîkû **Sîdîq Gorîcan** ■ Delalê Delalê **Rahmetullah Karakaya** ■ Zar, zîman û jîyan **Nasir Kemalolu** ■ Ji hêla naverokê ve analîzkirina pirtûka Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo **Dilazad A.R.T** ■ Roja Tarî **Mehmet Çelik** ■ Xêrhatinek li du berhemên Edebiyata Zarokan a Kurdî: Du Legleg û Daweta Noko û Nîskê **Memê Mala Hine** ■ Rîsteyên ji wê Hayjêbûnê: Xezela Siyahpoş ya bi Tîpa "E"yê ve Paşserwa **Mahsûn Çakmak** ■ Çavbirçiyê hevşabûnê **Firat Keklik** ■ Di Kilama Hedê Rebenê de Guhertina Peyvên "Bêbext" û "Xayîn" **Evdî Hesqera** ■ 33ê 3ê Rêz Hasbîhal **Mela Muhemed Gulnar** Tîpguhêzî/Latinîzekirin: Sîpanî

Kurdîzade Ahmed Ramiz:
**"Emrê min bihata
firotin, bêteredud
minê di riya Kurdan
da serf bikira."**

Seîd Veroj

Alimekî Navdar:
**Mela Zekiyê
Amêdiyê**


Nevzat Eminoğlu

**Di Şerefnameyê
de Eslê Kurdan**

Murad Celalî

Cemil Turan Bazidî:
**35 sal in ez dûrî
welatê xwe
me, lê qet jê
neqetiyame!**









Hevpeyvîn: Nihad Gültekin



148

SAL: 27
CILD: 23
HAVIN 2019
BIHA: 15 TL

Ji Nûbiharê berhemên nû!



Tel: 0212 519 00 09 / nubihar@gmail.com

www.nubihar.com /nubihar @nubihar @nubihar_yayinlari

Ji Edîtor

Bi jimara 148an merheba!

Her çiqas heta niha gelek karên hêja hatibin kirin ji bi potansiyela xwe ya îro em dikarin hê gelek karên baştir bikin. Ji aboriyê bigire hetanî kêmasiya qedroyên gihiştî astengî gelek in li pêş me, lê digel wê ji em dikarin hejmarên dewlemendtir û xweşiktir amade bikin.

Mala we nivîskarên hêja ava be hûn bi nivîsên xwe, bi keda xwe ya pîroz destek didine *Nûbiharê*. Her jimareke me bi nivîsên we dixemile û bi nivîsên we yên cûrbecûr *Nûbihar* digihêje xwendevanan.

Ji ber vê dixwazim li ser nivîsên ji me re tîncend gotinan bikim. Wekî em dizanin, dema hin nivîs bi wêne û belgeyan biweşin, nivîs bêhtir bi qîmet dibe û nivîskar ji fikr, peyama û teze xwe baştir bi delîlan dikare îfade bike...

Rîcayek me ji we nivîskarên hêja heye: Dema hûn nivîsa xwe dişînin eger li cem we bi nivîsê ve aleqedar belge û foto hebin, ji kerema xwe digel nivîsa xwe wan foto û belgeyan ji xweşik scan bikin û bi rêya mailê bişînin. Li ser medya civakî neşînin, lewra otomatîkmen kalîteya wan belgeyan kêmtir dibe, ji ber vê di çapê de xweşik dernakevin.

Di vê jimara *Nûbiharê* de dişa wekî her car digel cûrbecûr nivîs, hikaye û helbestan hevpeyvînek ji heye.

Seîd Veroj li ser Ahmed Ramizê Liceyî nivîsiye; Ahmed Ramiz di destpêka sedsala 20an de di nav Kurdên ku li Stenbolê dijîyan de yek ji kesên herî çalak e. Bi baweriya min, Ahmed Ramiz pîrê me weşangerên Kurd e. S. Veroj bi berfirehî behsa wî kiriye...

Murad Celalî di *Şerefnameyê* de rîwayetên li ser eslê Kurdan derbas dibin nivîsine.

Merdan Newayî di nivîsa xwe de li ser mijara wehdeta wucûdê hûr bûye. Wehdeta wucûd di Dîwana Melayê Cizîrî de çawa derbas dibe û derbarê wehdet wucûdê de fikrê Seîdê Kurdî çi ye, M. Newayî pevra muqayese kirine û xwestiyê tesîra Melayê Cizîrî ya li ser Seîdê Kurdî nişan bide.

Abdurrahman Benek ji devê neviyê Elîkê Betê, jiyana Elîkê Betê kiriye mijara nivîsa xwe.

Di vê jimarê de li ser du melayan hatiye nivîsandin. Ahmed Seyarî dîwana Mela Eliyê Baqustanî ji aliyê tema, ziman, teşe û hunerên edebî ve, Nevzat Eminoglu ji jiyana Mela Zekiyê Amêdiyê nivîsiye...

M. Xalid Sadînî şî'reke nû ya Melayê Bateyî peyda kiriye û cara yekê di vê jimara *Nûbiharê* de diweşîne.

Nihad Gûltekin bi nivîskarê Kurd Cemil Turan Bazidî re ku li Yewnanîstanê dije re hevpeyvînekê tîr û tije kiriye.


Wekî din nivîskarên vê jimarê ev in: Berken Bereh, Shahîn Bekirê Sorekli, M. Xalid Sadînî, Rahmetullah Karakaya, Nasır Kemaloglu, Dilazad A.R.T, Memê Mala Hine, Mahsûn Çakmak û Evdî Hesqera.

Şairên di vê jimarê de cih digrin ji ev in: Rojen Barnas, Cihan Roj, Mewlana Celaeddînê Romî, Berken Bereh, Talat İnanç, Aram Dêran, Hinara Tacdîn, Bamed Serdar, Sidiq Gorican, Mehmet Çelik, Firat Keklik û Mela Muhemed Gulnar...

Hetanî jimara din bi xatirê we...

...


Sûleyman Çevik



Heskif-Hesenkeyf. Foto Veysel Aydeniz

EV JIMAR

22




Wehdeta
Wucûdê li ba
Melayê Cizîrî û
Seîdê Kurdî
MERDAN NEWAYÎ

32




Alî Bate:
Neviyê Elîkê Betê
ABDURRAHMAN BENEK

42



Parçeyekî
dî ji Dîwana
Windayî:
Şîrek nû ji
Melayê Bateyî
M. XALID SADÎNÎ

44



Mersiyeyên
Mela Eliyê
Baqustanî
AHMET SEYARÎ

Nûbihar

KOVARA ÇANDI HUNERİ EDEBİ
(Kültür Sanat Edebiyat Dergisi)

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.
Xwedî û Gerîndeyê Weşanê/Sahibî ve Yazî İşleri MÜDÜRÜ
SÜLEYMAN ÇEVİK

Edîtorê Şîrê
BERKEN BEREH

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumrui İş Merkezi No: 22/29 Vezneciler/ Fatih - İstanbul
Tel&Fax: (0212) 519 00 09 www.nubihar.com nubihar@gmail.com

Nûnertiya Almanya: Burhan Kaya
kizilkaya_burhan@yahoo.de
Tel: 0234 - 7922968

Çapxane:
Alloğlu Mat. Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti Orta Mh. Fatih Rûştü Sk. No: 1-3/A
Bayrampaşa/İstanbul Tel: 212 612 95 59

Yayın Türü: Yerel Süreli
Berdêla abonetiya salane: Tirkîye: 70 TL, Welatên din: 25 EURO, 30 \$

Hesabê Bankê:
Pak Ajans Yayıncılık Turizm ve Dış Tic. Ltd. Şti.
İş Bankası Laleli Şubesi: 1084 - 0452003
IBAN: TR24 0006 4000 0011 0840 4520 03

Nûbihar ji 3 mehan carekê: Payiz, Zivistan, Bihar û Havînê tê weşandin.
Mesûliyeta ramanên di nivîsaran de aîdê nivîskaran e.
Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên vegeandin.

■ Wêje û Psîkoloji Berken Bereh	04
■ Li Serbajarê Têkoşinê Rojen Barnas	05
■ Kurdîzade Ahmed Ramiz: "Emrê min bihata firotin, bêteredud minê di riya Kurdan da serf bikira." Seid Veroj	06
■ Sirên Betalnebûyî Cihan Roj	13
■ Di Şerefnameyê de Eslê Kurdan Murad Celalî	14
■ Ger Bêhna 'Aşiq Teng Bibe Mewlana Celaleddînê Romî Wergera ji Farsi: Hayrullah Acar	21
■ Wehdeta Wucûdê li ba Melayê Cizîrî û Seidê Kurdî Merdan Newayî	22
■ Tirbêto Berken Bereh	31
■ Alî Bate: Neviyê Elikê Betê Abdurrahman Benek	32
■ Dil û Xwez Talat İnanç	39
■ Pîvaz Shahîn Bekir Soreklî	40
■ Parçeyekî di ji Diwana Windayî: Şîrek nû ji Melayê Bateyî M. Xalid Sadîni	42
■ Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî - Ji aliyê Tema Ziman Teşe û Hunerên Edebî ve- Ahmet Seyari	44
■ Delal Aram Dêran	49
■ Siyaset û Muxtariya Ravînya M. Xalid Sadîni	50
■ Qelem Zêriya Hinara Tajdîn	53
■ Alimeki Navdar û Berhemdar li Serheda Mûşê: Mela Zekiyê Amêdiyê Nevzat Emînoğlu	54
■ Xedra Bamed Serdar	60
■ Du Haîkû Sidîq Gorican	61
■ Delalê Delalê Rahmetullah Karakaya	62
■ Cemil Turan Bazidî: 35 sal in ez dîrî welatê xwe me, lê qet jê neqetiyame! Hevpeyvîn: Nihad Gültekin	66
■ Zar, ziman û jîyan Nasir Kemalî	74
■ Ji hêla naverokê ve analîzkirina pirtûka Şivanê Kurmanca ya Ereba Şemo Dilazad A.R.T	78
■ Roja Tarî Mehmet Çelik	85
■ Xêrhatinek li du berhemên Edebiyata Zarokan a Kurdî: Du Legleg û Daweta Noko û Niskê Memê Mala Hine	86
■ Risteyên ji wê Hayjêbûnê: Xezela Siyahpoş ya bi Tîpa "E"yê ve Paşserwa Mahsûn Çakmak	88
■ Çavbirçiyê hevşabûnê Firat Keklik	91
■ Di Kilama Hedê Rebenê de Guhertina Peyvên "Bêbext" û "Xayîn" Evdî Hesqera	92
■ 33ê 3ê Rêz Hasbihal Mela Muhemed Gulnar Tipguhêzî/latînzekirin: Sîpanî	95

Wêje û Psîkolojî

BERKEN BEREH

Edebiyat û huner, kar û xebateke afrînerî ye. Hunermend jî ew kes e ku bi vê çalakiyê berhemekê diafirîne. Nexwe ew, ne însanek ji rêzê ye. Gelo ev cudahî ji ku tê? Aha li vir, psîkolojî derdikeve pêşiya me û gotin û dahûranên psîkanalîstan. Ew îddîa dikin ku hunermend û kesên ji hêla derûnî ve ne rehetin (şizofren û nevroz) dişibin hev.

Afrînerî çalakiyeke “hiş”î ye ku tiştina nû tevî heyîna me dike. Ku em mijara xwe bi peywendiya helbestê bihizirin, helbestvan; tiştina li dinyayê bi muxayila xwe, bi hêza teknîka melekeya xwe, wê ji nû ve dixuliqîne û raberî xwezayê dike. Di vê çalakiyê de teqez ji xwe jî tiştina tevî “ya nû” dike. Ew şevê dike roj, rijiyê dike zêr... ango

“wê” bi gor dilê xwe diafirîne. Ji vê ye tê gotin ku helbest “ê din e.” Ew, pencereyekê ji xwînerî an guhdarî re vedike û wan dibe gerdûneke din. Bervajî her helbest tenê kopiyekê a li ber çavê me ye.

Li vir ev pirs xwe dide der; psîkolojiya paşplana helbestê çi ye? Bersiva vê tişteke subjektîf e, lê bi min “helbest, rêwitiya ber bi aramiyê ye ku dawiyê vediguhêze hilberîneke bi aheng.” Di van helbestan de hizir û raman têra xwe kûr, di hest û dilînan de lîrizmeke hevseng û di vegotinê de estetîkeke zor ciwan heye. Gelo çend helbestvan digihin asta van taybetiyan. Ev pirs bixwe di derheqê psîkolojiya helbestê de (wêje) fikrekê dide me. Psîkanalîst bi vê destpê dikin û kirasê dînîtiyê li bejna helbestvan dikin û di jiyana wî

de li şopên kesayetiyek cuda, tirotîbûnê, terkandinê, derkirinê... digerin. Ji bo palpišta angaştê xwe jî jiyana helbestvanên navdar raberî me dikin. Tê gotin ku helbestvan ew kes e ku têkiliya wî bi binhişê wî re pir xurt e.

Bi gor Freud, hunermend bi kesayetiya xwe ve jî însanên din cuda ye, berê wî/wê tim li cîhana hundurî ne. Lewre her di bin bandora pêdiviyên xwe yê dozîneyî û azweriyên xwe de dijî. Sereke xwesteka wî erk, rûmet, mal û mîlk û evîndarî û heza jinan e. Lê ew, gelek caran jî van gencîneyan bê par e. Ji ber van sedeman ew, ji realîteya jiyane dûr dikeve û bi hemû hêza xwe wek şîzofrenêkî bi rêya xiyalan dide pey lîbidoya xwe û dixwaze wan bi vê rêbazê bi dest bixe. Bêguman bi gor vê pênaseyê hunermend, bi peyvan, wêneyê gerdûna xwe ya nîgaşî çêdike. Ev diyarde jî kesayetîkî nevrotîk radixe ber çavê me. Gelo ev şîrove têra pênaseya afrîneriyê ya hunermendî dike? Ger bi vî awayî bê pejirandin hingê tu cudahiya wî û zarokêkî namîne. Lê em baş zanin ku her însan xwedî taybetmendiyên resen e; hiş, nîrxên manewî, mengî û projeyên pêşerojê. Ji ber van sedeman em nikarin helbestvan an peykertiraşekê bi kesayetiyeke ku di heyna "fallik, latent", an "anal" de hatî asêkirin bin av bikin. Dibe ku xwedî hin hingofî an meyldarê fanteziyan be û kesayetek şîzoîd hebe. Lê ev hemû têra şîroveya afrîneriya hunerane nake.

Psîkologê Fransî Rîbot jî hêla nîgaşî ve hunermendan dike du beş; yek jî van xiyalên xwe li ser çavdêriyên xwe yê li ber çav, yê din li ser hest û dilî û heyecanên xwe yê bi derûniya xwe re di atmosfereke bi aheng de lihevhatî û bi îmajên xurt rapêçayî ye. Yek xwedî "xiyaleke çêbûwar" (plastîk), yê din xwedî "xiyaleke lêzêdekirinê" ye.

Nexwe hunermend çiqas bi "binhiş"ê xwe re têkeve têkiliyeke dirist, berhema wî jî hewqasî dê xurt be. Ango bi qas gotinên şîzoîd, vegotina hêmayî û simbolîk jî xurt dibe. ✪

Li Serbajarê Têkoşinê

ROJEN BARNAS

Li serbajarê têkoşinê, Heyvhanî!
Pê diweşin ji gûlê bêwext
Lê bîhna wan a dilge, vedigira esmanan
Û rengê wan ê ronak di tîran de çimant.

Bawer dikin hin kes ku bîye xwedî
Pêrangî bizata jiyane li wê
Û mirîye kerrekê, bê şûn û şûngê.

Lê, li serbajarê têkoşinê, Heyvhanî!
Hi nêv xwedîya xwe fildibe jiyana
Hi jiyana bi gerdûnê dibe nîgaşê va
Bêlî hê di pey veridaniya rojê li ser
Hama ku te diheştî li zindîyan.

Li serbajarê têkoşinê, Heyvhanî!
Gryasê me kolan bi kolan ximê digere
Harşand canêkê me bi jî nêvî va
Di binê piyan da bûnê çangêk az.

Li serbajarê têkoşinê, Heyvhanî!
Te heyl,
Em hene
Û çîkek hevl...

1

Malbat û ciyê jidayikbûna wî

Ahmed Ramiz, yek ji kesayetiyên pir balkêş, qedroyên pêşeng ên hişyar- kirin û rêxistina tevgera neteweyî ya Kurd e di destpêka sedsala 20an de. Lê mixabin navê wî û xebata wî ya hêja, pir nayê zanîn. Ew, li gundê Zengesorê ya bi ser navçeya Licêya Diyarbekirê di sala 1878an de ji dayik bûye. Navê bavê wî Mele Evdila ye û ya dayika wî jî Fatîme ye. Li gorî gotina Kek Yaşerê lawê Evdilqadirê lawê Mihemed Seîdê birayê Ahmed Ramiz, dara malbata wan wisa ye: “Mele Evdilayê bavê Ahmed Ramiz lawê Mele Mistefa ye, ew jî lawê Mela Xalid e û Mele Xalid jî lawê Mele Bekir e. Neh zarokên Mele Evdila çêbûne, heft ji wan law û dido jî keç bûn. Yên law: Helîm, Kerîm, Mihemed Tahir, Ahmed Ramiz, Mihemed Seîd, Esed û Mihemed bûn. Keçik jî Zeynê û Eysê bûn. Mele Evdila, di mezraya Mehmûdan a ser bi gundê Zengesorê de dijîya.”

Ahmed Ramiz, xwendina xwe ya pêşîn li ber destê bavê xwe tamam dike. Bavê wî bi wezîfeya memûrtiyê (li gorî agadariya Kek Yaşer mimkun e ku ew mele bûye yan jî di karê postexaneyê de xebitiye.) tê Diyarbekirê û Ahmed Ramiz jî bi vê minasebetê xwendina xwe li Diyarbekirê di Medresa Mesûdiyeyê de didomîne. Ji kar û barê bavê wî diyar dibe ku Ahmed Ramiz, ji malbateke xwenda ya wê herêmê bûye. Ew, di serê sala 1900î de ji bo xwendinê diçe Îstebolê.

2. Destpêka xebata rêxistinî: Cemiyeta Azmê Qewî ya Kurdistanê (CAQK)

Ahmed Ramiz, piştî ku diçe Îstebolê, li vê derê bi şexsiyetên namdar û rewşenbîrên Kurd re têkiliyên xwe germ û geş dike, tevî xebatên

rêxistinî û rewşenbîrî yên wê demê dibe. Rêxistina tewr (herî) pêşî ya ku tete zanîn, Cemiyeta Azmê Qewî ya Kurdistanê (Komela Vîna Zexm a Kurdistanê-KVZK) ye, serok û sazkerê komeleyê Fikrî Efendiyê Amedî ye û Ahmed Ramiz jî yek ji damezrêner û çalakvanên vê komeleyê bûye. M. Emîn Bozarslan dibêje: “Sala 1900î Komela Kurdan a pêşîn li Îstebolê hatiye saz kirin. Navê wê komelê bi zimanê Osmanî ‘Kürdistan Azm-i Kavvi Cemiyeti’ bûye. Sazkerê Komelê Fikrî Efendiyê Amedî bûye. Em ji endamên wê, tenê navê Kurdîzade Ahmed Ramizê Licêyî dizanin.”² Li gorî nivîsandina Qedri Cemîl Paşa: “Ew di sala 1900î de bi handana Fikrî Efendiyê Diyarbekirî beşdarê Komela Vîna Zexm a Kurdistanê dibe.”³

Malmîsanij di bareyê Cemiyeta Azmê Qewî ya Kurdistanê de ji kitêba çapnekirî ya Hesên Hişyarê Serdê neqil dike û dibêje: “Fikrî Efendiyê Diyarbekirî, Ahmed Ramiz, Mistefayê Hecî Emerî, Melayê Xasî, Mele Seîdê Licî, Mele Wisifê Xoşînî û Xelîfe Selîmê Gonigê û çend kesên din.”⁴ damezrêner û rêvebirên vê komeleyê bûne.

Komela Vîna Zexm a Kurdistanê; çi cure xebat kiriye, çend salan kar kiriye, damezrêner û endamên wê yên din kî bûn û çi wext hatiye girtin? Ev baş nayê zanîn û divê ji bo zelalkirina vê babetê xebatên hîn berfireh bêne kirin. Li gorî agadariyên M. E. Bozarslan, “Ew komele di binê zordestiya rejîma Sultan Abdulhemîdê II da umirdirêj nebûye û demek paşê hatiye girtin û Ahmed Ramiz jî di sala 1904an da reviyaye çûye Misrê.”⁵

Ji nivîsa li ser kitêba wî ya *Emîr Bedirxan* ku bi navê mexlasê Lûtfî hatiye nivîsandin, diyar dibe ku KVZKê hetanî dema çapkirina wê kitêbê jî kar kiriye. Lewra wî li ser bergê kitêbê nivîsiye û gotiye: “Hasilata vê kitêbê, diyariyê Cemiyeta Vîna Zexm a Kurdistanê dikim.”⁶

کێشخانهٔ اجنهاد
دیوان یولده

عروش	٢٥
حکمدار وادیات : دوکتور عبدالعزیز	١٥
حاملت :	١٥
روح الانوار :	١٠
ایقاعه مسلم :	١٠
تهزوات :	٥
شیلون محوسی :	٥
نون و نلله :	٥
ابکر ایل :	٥
اوانکتر ، اوانکتر :	٥
الجزیره کتێبگری : سلیمان تطیب بک	٥
کێژیل فاعل :	٥
معلوی اعلام :	٥
رؤیا ماموسه مکتوب : ادیب اعظم نایک کال بک	٥
١٢٠٠ فادوی شریه : مرحوم حافظ کراکندی	٥
دوکتور شرف الدین بکک سیاحت خاطر	٥
اری ، علم نباتات ، قاموس طی ، خواجهدردی	٥
آندینک نظم وعدلی ، واستصافکده مرجع	٥
بکامه کتێبخانه مزدر ، دوستانه دادده طشرده	٥
طبع و نشر اولان آثارک عمل کتێبخانه مزدر	٥
المرآة فی الحکایة السلجوقیه	٥
اعظم مؤرخین ایرانین وزیر محمد زیدی بک	٥
١٢٠٠ فادوی شریه : مرحوم حافظ کراکندی	٥
آندین طرفین مفصل بر دیباچه غلامسینه	٥
بو دمه نشر ایلمش علی ترک تاریخی در	٥
جهان و سعادت کتێبخانه مزدر حکاکرد	٥
شرق کتێبخانه مزدر کوری ده اسراء آندینک	٥
دانهنده ١٠ عروش نیشانه حسنیله مزدر	٥
طشره ایلمون ایکی عروش بوست ایترکی	٥
آلور	٥

Serbesti 132, K İctihad

3. Çûna wî ya Misrê û xwendina di el-Ezherê de

Endametî û xebata wî ya di nav rêxistina KVZKê de, nîşan dide ku bi kêmanî, ew, di destpêka sala 1900î de li Îstebolê ye û herweha mixalifekî dijwar ê Îstibdada Abdulhemîd dijwarê. Bi ihtimaleke mezin ji ber çalakîyên wî yên mixalif, ji aliyê rejîma îstibdadê ve hatiye nefîkirin ku Qedrî Cemîl Paşa dibêje: “Di sala 1904ê de îlticayî Misrê dîke û li wê derê li ser navê komelê xebata xwe didomîne û di beşa Kurdî ya Zankoya el-Ezherê de dixweyne û bi eqil û zîrekiya xwe jî bi nav û deng bûye.”⁷⁷

Wê demê Misir navendeke girîng a mixalif û nefîkiryên îstibdada Abdulhemîd bû. Ahmed Ramiz jî li Misrê, di xeta mixalefeta dijberê Abdulhemîd II de, digel Jon-tirkan tevî hinek çalakîyan

dibe û li wê derê dest bi karê weşandina kitêbên Kurdî jî dîke, di destpêka karê weşangeriyê de *Mewlîda Melayê Bateyî* bi bihayekî giran li Misrê dide çapkirin. Ew, hetanî îlankirina Meşrûtiyeta Duyemîn, li Misrê jî aliyekê ve xwendina xwe didomîne û ji aliyê din ve jî mijûliya wî ya bi weşangeriyê re dewam dîke.

Ji ragehandina Meşrûtiyeta Duyemîn şûn ve, efûyeke giştî hate derxistin û di encama wê efûyê de gelek nefîkiryên Kurd û Tirkên mixalifên Abdulhemîd vegeriyan Îstebolê. Ahmed Ramiz jî yek ji van kesan bû ku li ser ragehandina efûyê, vegeriya Îstebolê û careke din dest bi xebata rêxistinî û karê weşangeriyê kir. Ew xebata xwe ya rêxistinî di nav Komeleya Hevkarî û Pêşketina Kurdan (KHPK) de didomîne û bi tevî wê jî karê weşangeriyê berdewam dîke.


Cemiyeta Teawûn û Teraqiya Kurdan [Kome-

la Hevkarî û Pêşketina Kurdan-KHPK], bi serokatiya Seyid Abdulqadirê lawê Şêx Ubeydullahê Nehrî hatibû damezirandin. Paşê ji bo pêşxistina xwendin û nivîsandina Kurdî, girêdayî vê rêxistinê, Kürd Neşr-i Maarif Cemiyeti [Komela Kurd a Belavkirina Neşriyatê-KKBN] têtê damezirandin. Malmîsanij di pirtûka xwe ya bi navê *Kürt Teawûn ve Terakki Cemiyeti ve Gazetesi* de, ji Celîlê Celîl neqil dîke û navê van pênc kesan wek rêvebirên cemiyetê diyar dîke: “1- Emîn Alî Bedirxan, 2- Babanzade Zihni Paşa, 3- Xelîl Xeyalî, 4- Mîrîkatibzade Ahmed Cemîlê Diyarbekirî, 5- Ahmed Ramizê Liceyî.”⁷⁸ Ji bo perwerdekirina zarokên Kurdan bi KKBNê ve girêdayî li taxa Çemberlîtaşê dibistanek têtê damezirandin. Qedrî Cemîl Paşa dibêje: “Di vê qonaxê de welatparêz û mirovekî hêja Xelîl Xeyalî yê ji eşîra Modan a qeza Mudkî û hevalên wî yên hêja, canecan û niştimanperwer Mîrî Katibzade Cemîl û Kurdîzade Ehmed Ramizê Liceyî jî bo perwerdekirina zarokên Kurd xwendengehek û çapxaneyek ser bi komeleyê ve danîbûn.”⁷⁹ Ji van agadariyan diyar dibe ku Ahmed Ramiz, yek ji damezirîner û rêvebirê vê komeleyê ye. Çapxane û weşanxaneya ku têtê behskirin jî, mimkun e ku bi ser Komeleya Kurd a Belavkirina Neşriyatê ve be.


4. Karê weşan û weşangeriyê

Karê weşangeriya Ahmed Ramiz li Misrê dest pê kiriyê. Ew, ji ber cezayê nefîkirinê bûbû penaber li Misrê. Dema ku ew çûye wê derê, ji aliyekî ve li el-Ezherê xwendiyê û ji aliyê din ve jî dest bi karê weşangeriyê kiriyê ji bo hişyarkirina milletê Kurd û pêşxistina zimanê Kurdî. Ahmed Ramiz berdewamî di nivîsên xwe de, ji bo hişyarkirin û nivîsandina bi zimanê Kurdî, pêşxistina zanîn û perwerdeyî, bang li gelê Kurd kiriyê û gotiyê; divê em ji bo vê yekê fedekariyê bikin. “Gelî xelk û biraêd min! Ji bo hişyarkirina bira û bavêd xwe bixebitin hetta îlm û mearif bikin zimanê xwe da.”⁸⁰


Wî di “pêşgotina” *Mewlîda Melayê Batê* de, armanca weşan û çapkirina vê kitêbê weha aniyê ziman: “Niyeta min kitab û rîsaleyên Kurdî



Derbarê sirgûnkirina Ahmed Ramiz de belgeyek



Bediuzzeman Seidê Kurdî, İki Mekteb-i Musibetin Şehadetnamesi veyahut Divan-ı Harbî Örfî



Derheqê qedexekirin û cezakirina weşanên Ahmed Ramiz de belgeyek

teb û neşir bikim. Rica min ew e, her çi li cem we kitabek Kurdî hebit, ji fedl û îhsana xwe re ji bo namûs û xeyreta qewmê xwe ji me ra bişînin heta kû em çap bikin. Paşê digel nûsxa wî, çend nûsxeyê din jî jê ra teqdim dikim.”¹¹

Ahmed Ramiz ji bo pêşxistina ziman û perwerdeyiya bi zimanê Kurdî ferexat û fedekariyeke fewqalede nişan dide û herweha ji rewşenbîr û xwendayê Kurd re jî dibêje: “Fedakarî lazîm e. Xudan himmeta alî bin, ewil qewaidê lîsanê xwe çêkin. Kutubê dinê tercûme bikin, her fenan eserên feydedar bixin zimanê xwe da...”

Ahmed Ramiz, ji ber xebata xwe ya weşangerî û çapkirina pirtûkên cur bi cur, di sala 1911an de ji careke din tê sirgûnkirin. Ew, di sala 1330 (1911) an de ji ber çapkirina pirtûka *Dîwançe-î Dehrî* ya Husên Kamî ku nivîskarekî mixalîfê dijwar ê İtihad û Teraqî bû, hikûmeta wê demê, nivîskarê pirtûkê sewqê mehkemeya Dîwana Herbê dike. Husên Kamî dibêje: “Dema ku ez sewqê mehkemeya Dîwana Herbê kirim, Ahmed Ramiz Efen-diye muhterem û fedekar, beriya min çûye mehkemeyê û gotiye: Ev pirtûk ya min e û min bi xwe çap kiriye, tu eleqa wî û vê pirtûkê tune ye. Wî bi vî awayî ez xelas kirim û xwe avête agir.”¹² Li ser vê yekê bi biryara Dîwana Herbê, cezayê nefikirinê didin Kurdîzade Ahmed Ramiz û wî nefî dikin ji bo bajarê Kastamonuyê.


5. Nivîs û pirtûkên wî

Ahmed Ramiz, ne tenê weşangerê fedekar ê milletê Kurd bû, herweha ew qelemeke xurt û tund a milletê Kurd bû. Digel çapkirina pirtûkên bi Kurdî û Osmanî ku terciha wî li ser pirtûkên Kurdî bû, li ser navê xwe gelek nivîs û pirtûk jî çap kirine. Hinekên wan li ber destê me hene û hinek jî em navê wan dizanin, lê ew vê gavê di arşîvan de xuya nakin û li ber destê me tunene.


Qasê ku tê zanîn wî bi du navan nivîsiye; Kurdîzade Ahmed Ramiz û Lûtfî. Bi dîtin û gumanana min, nivîskarê ku di hejmara yekemîn a *Rojnameya Teawûn û Teraqîya Kurd* de, bi navê “Diyarbekirli Sakin” nameyek di bin sernavê “Kahire Milli Darülfünûnu” nivîsandiye, mimkun e ew jî navekî mexlas ê Ahmed Ramiz be.

6. Nivîs û kitêbên wî yên li ber dest

Emîr Bedirhan [Emîr Bedirxan]: Ev kitêba Ahmed Ramiz, li ser navê mexlas ê “Lûtfî” hatiye çapkirin. Kitêba *Emîr Bedirxan*, li ser hev 62 rûpel e û di çapxaneyê İctihadê de hatiye çapkirin. Di bergê pêşî yê kitêbê de hatiye nivîsandin ku “Naşîrê wê: bi navê Cemiyeta Kurdan Lûtfî ye.” û mafê jî nû ve çapkirina bi zimanê Tirkî jî yê naşîrê wê ye. Herweha hatiye nivîsandin ku hasilata vê kitêbê ya Kurdistan Azmi Kawî Cemiyeti [Cemiyeta Vîna Zexm a Kurdistanê/



Alfabeya Xelîl Xeyalî



Rojnameya Sêrbestî

CVZK] ye. Ji vê beyanatê wisa diyar dibe, dema ku ev kitêb hatiye çapkirin, cemiyeta navborî xebata xwe dewam kiriye.

Naveroka kitêbê; li ser tevgera Mîr Bedirxan û bûyera kuştina Şehremînî [Şaredar] Ridvan Paşa ya di 23yê Adara 1906an e. Di kitêba *Emîr Bedirxan* de ez rastî tarîxa nivîsandina wê nehatim. Lêbelê danasîna kitêbê di hejmara 5an a *Îctihadê* de hatiye kirin û ew jî di *Kanûna Sanî* ya sala 1908an de hatiye belavkirin. Dema em tarîxa pêkhatina bûyerê di ber çavê xwe re bigrin, bi îhtimaleke mezin ev kitêb di sala 1908an de hatiye nivîsandin.

Reşbelek: Reşbeleka Ahmed Ramiz wek kitêbeke bi serê xwe nehatiye çapkirin. Ew, wek beşek di nav kitêba *Xulaseya Eqaidê* de hatiye çapkirin. *Xulaseya Eqaidê*, berhema Şêx Ebdulahê Nehrî ye û di sala 1911an de li Îstebolê ji aliyê Kurdîzade Ahmed Ramiz ve hatiye weşandin. Di rûpela 12an a *Xulaseya Eqaidê* de, li gorî teqwîma Rûmî dîroka “3yê Kanûna Sanî 1326 (11ê Kanûna Sanî ya 1911)” hatiye lêkirin. *Xulaseya Eqaidê*, li ser hev 33 rûpel e. Ji rûpela 12an û şûn ve *Reşbelek* dest pê dibe û 20 rûpelên pirtûkê ji *Reşbelekê* re hatiye veqetandin. Di dawiya metnê de nivîskar navê xwe wekî “Xizmetkarê Kurdmancan Ahmed Ramiz” nivîsandîye.

7. Kitêbên wenda

Di rûpela tewr paşîn a *Xulaseya Eqaidê* de bi sernavê “Merûzatê Mexsûse”, li ser awayê nivî-

sandina kitêbên ku ji bo neşriyatê têne şandin agahdariyek kin dide, paşê jî behsa çar kitêbên xwe yên li ber çapê dike, ji wê şûn ve jî bûhayê kitêban li Îstebol û li Kurdistanê diyar dike û di binê wê de jî navnîşan û ciyê firotina kitêbên xwe diyar dike.

Li gorî vê agadariyê, navê kitêbên wî yên ku li ber çapkirinê bûne ev in:

“Xetaya Selef û Xelef;

Îxtara Ferat û Dicle yaxûd Gazî û Hawara Nabeyna Nehran;


Sebebê Paşwemana Kurdan yaxûd Kurd û Kurdistan;

Hîmaya Mearîf û Hîmayenekirina Mearîf.”¹³


Hezar mixabin ku îro ev kitêb li meydanê xuya nakin û li ber destê me nînin. Li ser vê yekê çend pirs têne bîra mirov; gelo ev kitêb hatin çapkirin yan çapkirina wan hate derengxistin û paşê şertên çapkirinê nema? Yan jî gelo kitêb hatin çapkirin û di çapxaneyê de polêsan dest danî ser? Eger bersiva van herdu pirsan ne “erê” be, bêguman rojekê dê ev eserên hêja ronahiyê bibînin.

8. Çûna wî ya Binxetê û ber bi Şamê ve


Di çar salên dema Şerê Giştî yê Yekemîn de, xebata hemû rêxistinên sîvil û siyasî yên Kurd dihête betalkirin. Gelek rewşenbîr û ciwanên Kurd rêdikin meydana şer. “Ji destpêka şer yanî ji sala 1914an bigire hetanî dawiya sala 1919an, xisareke pir mezin li Kurdistanê çêbûye; nêzikî milyon û




Mewlîd' n Nebî



Reşbelek



Kitêba li ser Emir Bedirhan



Xulaseya Eqaldê

nîvek însan mexdûr bûne ku piraniya wan Kurd bûn.¹⁴ “Di Şerê Giştî de gelê Kurd bedêleke mezin da; ji ber ku welatê Kurdan li ser sînore Rûsya-Osmaniyan bû û di nav sehaya hereketa artêşa herdu aliyan de bû, ji destpêkê ve bûbû meydana şer. Ev rewşa hanê, ne tenê di herêmên navbera Rûsya û Osmaniyan de pêk hatibû, Kurdistanana Îranê jî di rewşeke wisa de bû.”¹⁵

Ahmed Ramiz di çar salên dema şer de bi çî re mijûl bûye, em bi vê yekê nizanin. Lêbelê ji bidawîhatina şer şûn ve, ew, wek çalakvanekî tevgera neteweyî ya Kurdistanê, ji nû ve li meydana xuya dibe. Ji belgên ber dest weha xuya dibe ku Komeleya Kurd a Belavkirina Neşriyatê (KKBN), vê carê bi girêdayî Cemiyeta Tealiya Kurdistanê (CTK) di sala 1918an de ji nû ve tête sazkin. Navê Ahmed Ramiz, di nav listeya panzdeh kesên muessîs [damezirêner] de hatiye nivîsandin. Ji ber ku KKBNê girêdayî CTKê kar dikir, em dikarin bêguman bibêjin ku Ahmed Ramiz jî endamê vê rêxistinê bûye. Wisa xuya dibe ku ji ber karê komeleyê, di vê demê de dev ji weşangeriya şexsî berdaye, em rastî nivîsên wî jî nayên an jî bi navekî din nivîsandiye û herweha dengê wî nayê û şopa wî jî ne xuya ye.

Li ser vê dema Ahmed Ramiz, li vê derê em dikarin du pirsan bikin û li bersiva wan bigerin. Yekemîn: Gelo ew çî wextê jî Îstenbolê veqetiya-ye? Duyemîn: Gelo ew di dema Tevgera 1925an de li Kurdistanê bû yan na?

Bersiva pirsê yekemîn; mimkun e ku ew jî

wekî hemû rêvebir û çalakvanên tevgera neteweyî ya Kurdistanê, hetanî dawiya salên 1922an yanî ta ku Îstenbol ketiye bin kontrola hikûmeta Enqerê, ew û gelek hevalên xwe li Îstenbolê bûne û piştî wê demê ji mecbûriyetê Îstenbolê terk kirine. Belkî jî hîn zûtir terka Îstenbolê kirine. Bersiva pirsê duyemîn: Li gorî agadariya merivên wî, ew ji bo rêxistinkirina tevgera Kurd hatiye gundê Zengesorê Licê û derûdorên wê, lêbelê tarîxa ku ew dibêjin beriya Şerê Giştî ye. Mimkun e ev tarîxa ku ew dibêjin xelet be, lê hatina wî ya herêmê ihtimaleke pir mezin e. Biraziyê wî Yaşerê Evdîlqadir dibêje: “Beriya ku ew biçê Şamê, hatiye Zengesorê, çûye aliyê herêma Botiyan, Mistan û Kavarê, çûye gundê Zezenan li nîk hevalê xwe yê bi navê Heyder. Ji wî re gotiye: Were em li vê herêmê xebata rêxistinî ya ji bo serxwebûna Kurdistanê bikin. Heyderê hevalê wî jê re gotiye; biçê nik Mehmûd û Ehmedê lawê apê xwe, eger te ew herdu ji xwe re kirin heval û anîn ser rêya xwe, em hemû bi te re ne.”¹⁶ Eger ev agadarî rast be, mimkun e ku beriya Tevgera 1925an yan jî di wê hengâmeye de çûbe Binxetê û ji wê derê ve jî çûbe Şamê. Lê tarîxa çûyina wî ne diyar e.

9. Dawî

Qasî ku tê zanîn Cemiyeta Azmê Qewî ya Kurdistanê, yekemîn rêxistina modern a Kurd e ku di serê salên 1900î de hatiye avakirin û Ahmed Ramizê Liceyî jî yek ji damezirêner û endamên

çalak ên vê rêxistinê bûye. Herweha piştî wê jî çî wexta ku rêxistineke Kurd hatiye damezirandin, ew di nav de ye. Ahmed Ramiz, di destpêka sed-sala bîstan de yek ji wan kesên sereke û navdar ên tevgera Kurd e ku bi xebatên xwe yê rêxistinî, nivîskarî, rewşenbîrî, weşangerî û siyasî tete nas-kirin. Wî, bi xebatên xwe yê li ser perwerdeyî, weşangerî û çapemeniyê, ji bo pêşxistina xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî, xizmetên gelek girîng kirine. Ev xebat û xizmetên wî, di rêya hişyarkirin û pêşxistina fikra neteweyî ya Kurd de, pêngavên pir girîng in. Em dikarin bibêjin ku bi rêya xebatên weşangerî û çapemeniyê, pêşxistina xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî, parçeyek ji hewldan û armanca peydakirina zimanekî hevpar û neteweyî ye.

Ew, bi van xebatên xwe yê piralî, bûye yek ji tevdarên sereke yê avakirina nasnameya neteweyî ya Kurd. Wî ji bo biserxistina armanca xwe ya neteweyî, hemû teklîfên bona meqam, bertil û rişweta rêvebirên Îstîbdada Abdulhemîd, zordestiya Îtîhad û Teraqî red kirine. Xebata ji bo hişyarkirin û xizmeta milletê Kurd, di ser hemû berjewendiyên şexsî û grubî de dîtiye, ji ber vê, bûye mexdûrê her cureyê zext û cezayên desthilatdariya siyasî ya wê demê.

Eger tarîxa jidayikbûn û mirina Ahmed Ramiz rast be, wî, di 64 saliya xwe de ji nav me koç kiriye. Li gorî agadariyên mevcud, ew heta ku li bakurê Kurdistanê bûye nezewiciye, heke piştî wê zewicibe, tu agadariyeke me li ser malbata wî nîne. Di nav vê muddetê jiyane de, bi tevî hemû tengasî û astengiyan, xem û xiyala wî, xebat û xizmeta wî ji bo hişyarkirin û azadiya milletê Kurd bûye. Di vê rêyê de, ji tu fedekariyê xwe nedaye paş, ew ji dil û can xwebexşê doza rewşa ya milletê Kurd bû. Lewma di *Reşbelekê* de

gotiye: “Eger emrê min bihatana firotin bêtered-dud minê bifirota, di riya Kurdan da serf bikira.”

Kurdîzade Ahmed Ramizê Liceyî, di sala 1940î de li Şamê (Dîmeşqê) çûye ber dilovaniya Xwedê. Qedrî Cemîl Paşa jî dibêje: “Kurdîzade Ahmed Ramiz Beg, neteweperwerekî ji Licê ya bi ser Diyarbekirê ve ye. Hemû jiyana wî bi mijûlayiya siyaseta kurdîniyê ve derbas bûye. Merhûm, rojên xwe yê dumahîkê di nav Kurdên Şamê de derbas kiriye, gorna wî li bajarê Şamê di taxa Kurdan de ye.”¹⁷

Jêrenot

- 1 Yaşerê Evdîlqadirî (Öztek), Raporaj, Diyarbekir 25.01.2018
- 2 M. Emin Bozarslan, *Jîn*, cild:1, r. 7, Bn. Zinar Silopî, *Doza Kurdistan*, r. 25-26.
- 3 Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, Weşanên Bîr, Diyarbekir, 2007, r. 26
- 4 Malmîsanîj, *Yirminci Yüzyılın Başında Diyarbekir’de Kürt Ulusçuluğu (1900-1920)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstebol 2010, r. 16.
- 5 M. Emin Bozarslan, *Kürt Tevûn ve Terrakî Gazetesi (Rojnameya Komela Hevkarî û Pêşketina Kurdan)*, Weşanxana Deng, Uppsala/Sweden 1998, r. 5.
- 6 Lutfi (Ahmed Ramiz), *Emîr Bedirhan*, Matbaayî İctihad, İstebol 1908.
- 7 Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 26-27.
- 8 Malmîsanîj, *Kürt Tevûn ve Terakkî Cemiyeti ve Gazetesi*, Avesta Yayınları, İstebol 1999, r. 27.
- 9 Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 25
- 10 *Mewlûd’ın Nebî*, Neşir: Kurdîzade Ahmed Ramiz, Misir 1324-H (1906).
- 11 *Mewlûd’ın Nebî*, Neşir: Kurdîzade Ahmed Ramiz, Misir 1324-H (1906).
- 12 Dîvançe-î Dehri, *Bir Hakikatın Tezahürü*, Amedî Matbaası, 1330, r. 125-133.
- 13 Ahmed Ramiz, *Xulaseya Eqaid*, r. 33.
- 14 Dr. Nuri Dêrsimî, *Hatiratım*, Weşanên Doz, İstebol 1997, r. 47.
- 15 Wadî Jwaaldeh, *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi*, İletişim Yayınları, İstebol 2014, r. 251.
- 16 Yaşerê Evdîlqadirî (Öztek), Raporaj, Diyarbekir, 25.01.2018.
- 17 Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî), *Doza Kurdistan*, Weşanên Bîr, Diyarbekir 2007, r. 27.

Sirên Betalnebûyî

CÎHAN ROJ

bi sewta dengê berêvaran
heya stêrka navlêkirî bixurice
peyvek dibe posteciya derengmayî...
her peyva li tîna wechê te bi temaşe ye
li dilê mi bi hêlan û bi deng e
mi digo qey dilê mi bi hêlîn e
teyrên xewnên navrojê
dibêjin,
bibe Evdal,
herçî quling e,
bila ew jî fotografekî ji welatê çîrçîrokan be
saetê, deqê, gavê lezê,
heya
temenê te bibe kaxizek
û
qelemeke ji sirên
navbera çend stêrkan de betal bin
peyvek
aha mîna pelê cixarê zirav
qulinga hezkiriyan e
'Kê got?'
-Qelemê...
Qelesa qelemên bêqasid
Qelesa zimanê bêzeman mayî
Qelesa peyvên ker û lal mayî...

Di Şerefnameyê de Eslê Kurdan

MURAD CELALÎ

Destpêk

Şerefname wekî pirtûka ewil ya dîroka Kurdistanê tê qebûlkirin. Şeref Xan di serî de qala rîwayetên li ser eslê Kurdan û ziman û zaravayên wan dike. Her wiha behsa welatê Kurdistanê, mîr û hakimên Kurdan, xelk, dîn û baweriyên wan dike. Pirtûk bi vê taybetiya xwe ji bo dîroka Kurdan ya siyasî, çandî û civakî berhemeke pir girîng e. Heta hinek rîwayetên nivîskar neqil kirine çawa ku ji bo neteweperweriya Kurdan bûne jêdera selmandina qedîmiya dîroka Kurdan heman rîwayet ji bo aliyên ku Kurdan wekî miletekî serbixwe qebûl nakin ji bûne jêder. Ji vê hêlê ve jî Şerefname wekî çavkaniyeke zindî,

kartêker bandora xwe didomîne. Ji ber ku mijara me bi giştî ne nixandina Şerefnameyê ye, emê di vê nivîsê de tenê bala xwe bidinê ka li ser eslê Kurdan nivîskar xwedî kîjan nêrînê ye û di pirtûkê de der barê eslê Kurdan de kîjan rîwayet neqil kirine.


Şeref Xan

Emîr Şerefeddîn Xan bîn Şemseddîn bîn Şeref Xanê nivîskarê Şerefnameyê di 20ê zîlqadeya sala 949an/25ê sibata 1543an de li Kerehrûda nêzî Qumê ji dayik bûye. Kurê Mîr Şemseddînê Mîrê Bidlîsê ye û dayika wî keça Emîr Xan Misûlloyê hakimê Erzincanê ye. Şeref Xanê kalkê wî mîrê Bidlîsê bûye û di sala



921ê (1515) de serdestiya Osmanî qebûl kiriye. Di sala 940î (1533) de bi destê Tekelu Ulama Xan hatiye kuştin. Piştî ku Şeref Xanê kalkê wî hatiye kuştin, bavê wî Şemseddîn tevî eşîra xwe Rojkiyan xwe avêtiye ber bextê Safewiyan. Şah Tehmasbê Pêşîn rêvebiriya Serab, Meraxa û Kerehrûdê dide Şemseddîn. Şeref Xan li wê derê tê dinyayê û heya neh saliya xwe li ber destê qaziyên Kererûdê dixwîne û paşê wî dişînin qesra Şah Tehmasb ya li Qezwînê û li wê derê sê salan perwerdeyê dibîne. Di sala 961ê (1554) de gava Şemseddînê bavê wî nexweş dikeve, Şeref Xan li dewsa wî wekî rêvebirê Saliyan û Mehmûdabada li ser Şîrwanê tê wezîfedarkirin. Di sala 967an (1560) de Şah Tehmasb wî wekî

rêvebirê eşîra Rojkî tayin dike. Di sala 975an (1568) de serhildana Ehmed Xan ya li Gîlanê serkut dike û heft salan li wê derê dimîne. Dema vedigere Qezwînê wekî rêvebirê Şîrwan û derdora wê tê wezîfedarkirin. Dema Şah Tehmasb dimire û Şah Îsmailê zyemîn dikeve dewsa wî, payeya Emîrul Umera didine wî û gazî dikinê û tînin navendê. Di ragêşiya navbera Şah Îsmailê zyemîn û birayê wî Sultan Huseyn Mîrze de, Şeref Xan ji ber gumana ku piştgiriya Sultan Huseyn Mîrze dike, da ku derbasî ser text be, tê sûcdarkirin. Ji ber vê yekê Şah Îsmail, Şeref Xan wekî rêvebirê Nexçewanê wezîfedar dike. Piştî ku ev bûyer qewimîn Padişahê Osmanî Muradê 3yem hakimiyeta Bidlîsê da Şeref Xan û ew jî



ligel 400 merivê xwe di 3yê Şewwala 986an (3 Çileyê Pêşîn 1578) de hatiye Bidlîsê.

Ji vê dîrokê pê ve Şeref Xan wekî Mîrê Bidlîsê wezîfe kiriye û di gelek şeran de tevî leşkerê xwe piştî Osmaniyan kiriye. Peyra ligel Bidlîsê, Mûş, Elcewaz û Wan jî kete bin teserufa wî. Di bihara 990î (1582) de çû Stenbolê û derket hizûra Muradê 3yemîn. Di 29 zihiceya sala 1005an (3 tebaxa 1597) de Mîrtiya Bidlîsê û hawirê wê, ji Mîr Şemseddînê kurê xwe re hişt. Her wiha dest bi nivîsandina *Şerefnameyê* kir û di sala 1597an de *Şerefname* qedand.

Şeref Xan wekî kesekî edîb, helbesthez, hunermend, dîndar tê zanîn. Li ser dema mirina wî nîqaş heye û salên 1599 (Çağlayan, 2016: 321), 1603-1604 (Özgüdenli, 2010: 548) wekî dîroka mirina wî tên nîşandan.

Nusxeyên *Şerefnameyê*

Her çendî *Şerefname* dîroka malbata Şeref Xan be jî di heman demê de dîroka Kurdan a herî pêşîn tê qebûl kirin. Loma ji dema hatiye nivîsîn pê ve him jî bo dîroka Kurdan û him jî seba dîroka parzemîna Asya û Îranê bûye çavkaniyeke girîng (Ehmed, 1997: 43)

Şeref Xan bi xwe jî di destpêka *Şerefnameyê* de armanc û sebebê telîfa xwe wiha tîne ziman:

“Vêca ew kesên di bazara nivîsînê de

cewherfiroş û durmas in, ew dîroknasên ku lehengên nav şekeristana serpêhatî, çîrok, deng û behsan, heta niha riya xwe ber bi Kurdistanê ve nekirine, behs û dengên gernas û sernasên Kurdan nekirine bin devê pênûsê, ew dîroka gelek bi şanazî û xweşiyê ku di tam û bîhna xwe de wek hingivîn (hingiv) û gezoyê ne, gelek mixabin ji aliyê wan ve nayê naskirin û ketiye bin piyan û bi tu awayî dest û devên xwe lê nêzik nekirine. Ez î jar, bêtaqet, bêdest û ziman ketim ser wê xeyalê ku vê mijara han a ji taqet û qudreta min gelek der; behs û serpêhatiyên mirovên mezin, kesên bi nav û deng, serdar û fermanrewayên Kurd û Kurdistanê berhev bikim, di dîrokên ‘Ecem de min bi xwe dîtine û yên min ji mirovên bi hiş û zîrek û ji derewan dûr, raste rast bi xwe seh kirine, binivîsim û navê wê bikim: *ŞEREFNAME*. Hemû armanc û daxwaza min jî ev e ku, xanedanên mezin ên Kurdistanê navê wan di nav navan de bimîne û ji bîr neçe (Bedlîsî, 1997: 14).

Şerefname ji bilî muqeddîmeyê ji çar beş û xatimeyekê pêk tê. Nivîskar di muqeddîmeya cildê pêşîn de qala eslê eşîrên Kurdan, malbata xwe dike ku bi qasî 5 sedsalan rêveberiya herêma Bedlîsê kiriye û di cildê duduyan de jî behsa dîroka Îran û Osmanî ya navbera salên 1290-1597an dike. Ji ber ku nivîskarê wê Kurd e û bi berfirehî qala Kurdan, rêveberiya Kurdan dike; pirtûk jî bo dîroka Kurdan wekî çavkaniyeke sereke tê qebûl kirin. Jixwe wekî Şeref Xan bi xwe jî di muqeddîmeya xwe de dinivîse, beriya wî tu kesî pirtûkeke bi serê xwe ji bo vê mijarê hatiye amadekirin nenivîsiye. Di serî de qala rîwayetên li ser eslê Kurdan û ziman û zaravayên wan dike. Her wiha behsa welatê Kurdistanê, xelkê wê û dîn û baweriyên Kurdan dike. Lewma jî bo dîroka Kurdan ya siyasî, çandî û civakî berhemeke pir girîng e. Heta hinek rîwayetên wî neqil kirine çawa ku ji bo neteweperweriya Kurdan bûne jêdera selmandina bingehbûna dîroka Kurdan heman rîwayet jî bo aliyên ku Kurdan wekî miletekî serbixwe qebûl nakin jî bûne jêder. Ji vê hêlê ve jî *Şerefname* wekî çavkaniyeke zindî û kartêker bandora xwe

didomîne. Ji ber van egeran *Şerefname* wekî pirtûka dîroka Kurdistanê ya ewil tê qebûl kirin. Lêbelê wekî kevneşopîyeke zanyarên wê demê *Şerefname* jî bi Farisî hatiye nivîsîn.

Gelek nusxeyên *Şerefnameyê* heya îro hatine û ji wan bi qasî 22 nusxe li pirtûkxaneyên dinyayê yên bi nav û deng tên parastin (Ehmed, 1997: 44). Nusxeya muellif ya dîroka wê 29ê zîlhîcçeya sala 1005an (13ê Tebaxa 1597an) li Zanîngeha Oxfordê Pirtûkxaneya Bodleianê (Elliot, jimar. 332) qeydkirî ye. Nusxeya 5ê cemaziyelewwela sala 1015an (8ê Îlona sala 1606an) li Kilîsê bi destê Hesen bîn Nûreddîn hatiye îstinsaxkirin' dîsa li heman pirtûkxaneyê (Elliot, jimar. 331) qeydkirî ye. Li pirtûkxaneyên Stenbolê nusxeya herî kevn di sala 1034an de (1625) hatiye îstinsaxkirin, lê mustensîxê wê nayê zanîn. Ev nusxe jî li Pirtûkxaneya Suleymaniyeyê li beşa Halet Efendî (nr. 584) qeydkirî ye. Her wiha ya din jî nusxeya Lala Îsmail Efendî (nr. 357) ye ku di sala 1036an de (1627)² bi destê Mihemed bîn Mihemed el Helebî (Îbn Azgar) hatiye îstinsaxkirin. Li Pirtûkxaneya Zanîngeha Stenbolê sê nusxeyên din jî hene û dîroka wan hê nûtir e (FY, jimar. 23, 223, 224).

Wergerên *Şerefnameyê*

Heya îro *Şerefname* bi gelek zimanan hatiye weşandin. Di sala 1858an de Mela Mehmûdê Bazîdî cildê pêşîn yê *Şerefnameyê* ligel hin teserufan wergerandîye Kurmancî (Bedlîsî, 2007). Di salên 1667-1668an de bi fermana neviyê kurê muellif Emîr Şeref Xan bîn Ebdal Xan, *Şerefname* li gor eslê wê bi destê Mihemed Bey bîn Ehmed Bey Mîrze bo Tirkîya Osmanî hatiye wergerandin. Her wiha bi daxwaza Begê Exîlê Emîr Mistefa di sala 1681ê de Şem'î berhem kurt kiriye û tevî du îlaweyên piçûk wergerandîye Osmanî. Cara ewil Wolkow di sala 1826an de li gor nusxeya Saint Petersbûrgê *Şerefname* bi dinyayê daye nasîn (Özgüdenli, 2010: 548). Peyra *Şerefname* bi destê V. Vêliaminof-Zernof (1830-1904) bi navê *Scheref-Nameh ou Histoire des Kourdes, Preince de Bidlis* tevî Farisiya wê



ya Saint Petersbûrgê di salên 1860-1862an de wekî du cildan hatiye weşandin. Mihemed Ebas jî li ser vê çapê muqeddîme, têbînî û fêhrist zêde kirine û li Tehranê (1343/1965, 1347/1968) jî nû ve weşandiye. Heinrich Alfred Barb hin beşên wê di navbera salên 1853, 1857, 1858, 1859an de bi Almanî weşandine. François Bernard Charmoy (1793-1863) *Şerefname* jî Farisî wergerandîye Fransî û di navbera salên 1868-1875an de di nav çar cildan de bi navê *Cheref-Nameh ou Fastes de la Nation Kourde* li Saint Petersbûrgê hatiye weşandin. Bi destê Mihemed Cemîlbendî Rojbeyanî (1913-2001) di sala 1953an de li Bexdayê û Mihemed Elî Ewnî (1897-1952) - Yehya el-Heşşab bi du cildan di salên 1958-62an de li Qahireyê bi Erebî hatiye weşandin. E. I. Vasilyêvayê di sala 1967an de li Moskovayê bi Rûsî weşandiye. Ebdurehman Şerefkendî (Hejar) (1920-1990) jî *Şerefname* wergerandîye Soranî û wergera wê ya Soranî di sala 1972an de li Tehranê hatiye çapkirin. Wergera wê ya Tirkî ya ku Suleyman Savci di nav du cildan de çekiriye, li Diyarbekirê Pirtûkxaneya Bajêr ya Gel (jimar. 2605) e. Mehmet Emîn Bozarslan jî ji wergera Erebî ya Mihemed Elî Ewnî - Yehya el-Heşşab wergerande Tirkî û ev werger jî di sala 1971ê de di nav du cildan de hat weşandin. Wekî din M. S. Cuma *Şerefname* jî ber wergera Soranî ya Hejar wergerande Kurmancî û li Dihokê sala

2006an hat çapkirin û Ziya Avcî jî ji heman çavkaniyê wergerande Kurmancî li Stenbolê sala 2007an hat weşandin. Ji hêla din ve Celal Kabadayi, Rıza Kati û Vedî İlmen li ber wergera wê ya Fransî ya François Bernard Charmoy *Şerefname* wergerandine Tirkî û wekî pênc cildan li Stenbolê di navbera salên 2009-2010an de hat weşandin. Herî dawîn Abdullah Yegin cildê ewil yê *Şerefnameyê* ji orijîna wê angî ji Farisî wergerande Tirkî û sala 2013an li Stenbolê hat çapkirin û beriya wê jî Osman Aslanoglu cildê duduyan wergerandibû Tirkî û werger di sala 2011an de li Stenbolê hatibû çapkirin.

Di *Şerefnameyê* eslê Kurdan

Şeref Xan ji piçûktiya xwe pê ve perwerdeyeke baş ditiye, li qesrê mezin bûye angî him dîplomat e û him jî di warê ilmî de gihîştî ye, her wiha xwedî bîreweriyeye xurt e. Di heyama rêveberiya xwe de seba ku dîroka mîrektiyên Kurdan binivîse tevî karê xwe yê fermî lêkolînên xwe jî kirine. Şeref Xan gava qala eslê Kurdan dike, dibêje li ser vê mijarê gotin û rîwayetên curbecur û berevajî hevdu hene. Lê gava qebareya pirtûka wî û ew beşa qala eslê Kurdan dike tê berawirdkirin, tê dîtin ku ev babet tenê ji bo mijarê kêm nemîne hatiye dayîn, ne ku ji bo îsbat û tesbîtkirina eslê Kurdan e. Loma ji wan rîwayetan sê heban dide.

1. Ji wan ya pêşîn derheqê Dehaq de ye û li gor wî Dehaq hikûmdarê pêncan e ku li ser textê welatê Îran û Turanê rûniştîye û diyar dike ku ji ber zilm û zordariya Dehaq hin dîroknas wî wekî Şeddad bi nav dikin. Ligel vê zordestî û zilmkariya wî, Xwedê derdekî mezin lê peyda kiriye û li ser navmilên wî du hestiyên dişibin ejderha û maran derdikevin û ev nexweşî wî pir aciz dike. Êdî taqet nake li ber êşa vî derdî teyax bide û di encamê de gelek hekîmên zana û pîspor hewl didin, derman û tedawiyên curbecur diceribînin, lêbelê nikarin rê li ber êşê bigirin û wî pak bikin. Rojekê şeytanê mel'ûn di dilqê hekîmekî de tê û ji Dehaq re dibêje dermanê vê nexweşiya te ew e ku mêjiyê xortan li serê

van kînoran bidin û tenê bi vî awayî ev nexweşî wê baş bibe. Di encamê de her roj mêjiyê du merivan li wan kînoran didin û ev zilma giran û neheqiya mezin bi vî rengî heya demekê wisa dom dike. Di axiriyê de ew kesê wezîfedar e ku her roj du kesan bikuje û mêjiyê wan derxe, ji ber vî karê xwe yê xirab aciz dibe û dilê wî dişewite. Loma biryarê dide ku ji wan kesan yekî tenê bikuje û mêjiyê berxekê tevî mêjiyê wî bike û kesê din jî dizika ve berde û bişîne cihên ji bajêr û warên meskûn dîr. Her wiha şîretê li wan kesên berdide dike ku herin çiyayên vala û dûredest. Di encama vê de civakeke mezin derdikeve holê. Ev kesên li dol û çiyayan dijîn bi gelek zaravayên ji hevdu cuda diaxivin. Piştî wextan ev kes dizewicin û ji hev zêde dibin û li herêmeke mezin belav dibin û ji wan re "Kurd" hatiye gotin. Ji ber ku demeke dîrûdirêj ji berhemên şaristaniyê, war û welatên meskûn dîr mane; çand, ziman û zaravayên xwe yên berê ji bîra kirine û ji xwe re ziman û çandeke taybet pêk anîne û paşê li deşt û çiyayan belav bûne, bi heywandarî, cotkarî û bazirganiyê re mijul bûne. Bi vî awayî berhemên şaristaniyê pêk anîne, gund, qele û bajar ava kirine (Şeref Han, 1971: 18, 19).

Rîwayeta pêşîn ya ku Şeref Xan radigihîne ev e. Dema vê rîwayetê radigihîne ji aliyekî ve jî dinirxîne, rexne dike û fikra xwe jî dibêje. Angî mîna waqîenivîsekî tenê neqil nake, bi bîreweriyeye dîroknasekî vê neqla xwe dadihûrîne jî. Jixwe armanca wî ya nivîsîna *Şerefnameyê* ew e ku dîroka Kurdan ya ku heya dema wî tu kesî bi awayekî musteqîl nenivîsiye amade bike (Dehqan, 2014: 9). Lêbelê li vê derê gava Şeref Xan vê rîwayetê radigihîne dibêje: "Cihê xemgîniyê ye ku rêvebiran jî li gor pêşniyaza wî mel'ûnî hereket kiriye." Dema meriv vê dixwîne, dibêje qey Şeref Xan rastiya vê bûyerê bawer dike. Ji hêla din ve nexweşiya ku di vê çîrokê de qala wê tê kirin, di hinek versiyonan de wekî du mar û ejderhayan tê teswîrkirin, di hin cihan de jî wekî nexweşiya penceşêrê derbas dibe. Heta li gor hin rîwayetan Kurdan di dîrokê de ji ejderhayekî re îbadet kiriye, seba

xwedîkirina wî jî mêjiyê merivan pê dane xwarin. Di van hemû çîrokan de tiştê ku derdikeve pêş mar/ejderha û mêji/kuştina merivan e.

Wekî din dema ku ev rîwayet tê xwendin çavê xwîner li Kawayê Hesinkar digere, lê nivîskar behsa şerê wî yê li hember Dehaq nake. Ango rîwayetê bi kurtasî neqil dike û ev jî nîşan dide ku armanca wî tenê ew e ku beşa qala eslê Kurdan dike bi kurtebirî ragihîne.

2. Rîwayeta duduyan ya ku Şeref Xan radigehîne jî li ser navê Kurdan e û li gor vê rîwayetê tekane sedema navê "Kurd" li vê civakê kirine jî wêrekiya wan ya mezin û şervaniya wan e. Lewra Kurd li qada cengê, di van şert û mercên dijwar de bi vê taybetiya xwe derketine holê (Şeref Han, 1971: 19). Nivîskar bi xwe jî vê fikrê qebûl dike û ji dîrokê gelek lehengên bi mêrxwasî û wêrekiya xwe navdar in yên wekî Rostemê Zal, Behramê Çopîn û Girgînê Mîlad mînak nîşan dide û dibêje ew hemû jî Kurd in (Şeref Han, 1971: 22, 23).

3. Rîwayeta sisêyên ya ku Şeref Xan radigehîne ji wan herduyên din balkêştir e. Lewra li gor vê rîwayeta mîtolojîk Kurd civakeke ji cinan e û Xwedê perdeya li ser wan rakirîye û bi vî awayî bi çavê merivan tên xuyanê. Lê ev rîwayeta ku Kurdan wekî qewmekî ji cinan nîşan dide, bi çend awayên cuda tê vegotin. Şeref Xan behsa wê jî dike û dibêje li gor îdiaya hinek dîroknasan jî cin bi keçên Hewwayê re zewicîne û ji wan Kurd çêbûne (Şeref Han, 1971: 19).

Diyar e ku Şeref Xan seba xwîner çîrokên mîtik bihese, ev rîwayet neqil kirine. Wekî usûla nivîskarên dema xwe herî dawîn gotiye ya rast her Xwedê dizane. Ji bilî vê rîwayeteke din der heqê Buxduz de heye û Şeref Xan ne li ser eslê Kurdan, lê di peywendeke din de neqil kirîye û ji bo bêtifaqiya Kurdan delîl nîşan daye û beriya vê çîrokê neqil bike dibêje çîrokên ecêb tên vegotin û ji dû wê re vê çîrokê neqil dike:

"Dema navûdengê Hezretî Mihemed li asoyan belav bû, dengê banga Îslamê li her aliyê dinyayê olan da, Kralên welatan û herêmen memleketan bi vê rewşa nû re eleqedar bûn, xwestin serê xwe li ber vî mezinê hêja xûz bikin

û bi dil û can û coş îtaeta xwe ji wî re diyar bikin, bi wî rûmetdar bin; wê hingê Oxuz Xanê yek ji hikûmdarên herî mezin yên Tirkistanê, ji ewê ku li Medîneya Munewwere rûdinê re -selama herî hêja li ser niştecihê wê derê be-, serbilindiya pêxemberan û mezinê mexlûqan re heyetek şand. Pêşikêşê vê heyetê ji mezin û giregirên Kurdan kesekî bi navê Buxduz bû; reng û rûyê vî kesî nerind, bêteşe bû, yekî dilhişk, girîberanî bû. Dema ev qasidê rengûrûyê wî nerind, qirase li ber çavê Pêxember (selat û selam li ser wî be) ket, bêhna Pêxember teng bû û gelekî ji wî nefret kir. Çaxê ji qasid qebûleya wî û nesla wî pirsî, wî got ji qewmê Kurdan e. A wê hingê Pêxember (selat û selam li ser wî be) nifir li Kurdan kir, wiha got: "Xwedayê mezin vî qewmî miwafiq neke, heke di nav xwe de îtifaq û yekîtiyê saz bikin; bibin yek bi destê wan dinyayê xirab bibe." (Şeref Han, 1971: 24-25)

Rîwayetên bi vî rengî li ser gelek miletan hatine gotin û ji ber naveroka xwe ya dûrî bîr û baweriya Îslamê û dijî sîret û exlaqê Qasidê Xwedê pêwîst nake nirxandinên dirêj bîrê kirin. Ji ber ku ewqasî ji rastiye dîr e tu çavkaniyeke pêbawer ya hedîs û dîrok de jî tune, heta di pirtûkên li ser hedîsên mewzû de tune. Lê ji ber naverokê û navê Buxduz û Oxuz Xan hin aliyên xwestiye bi vî îsbat bikin ku Kurd Tirk in (Çay, 1994: 38). Her wiha hin aliyên dijberê Îslamê jî bi vê çîroka bêbingeh xwestine Pêxemberê Îslamê û dînê Îslamê wekî dijminê Kurdan nîşan bidin.

Encam

Piştî ku agirê neteweparêziyê gur bû (1789) defterên berê yên çandî, mîtolojîk, dîrokî, folklorîk û hwd hatin tevdan. Her gelekî ji hêlekê ve him karê xwe yê çalak yên wekî şerê rizgarî, serxwebûnê meşandin û ji hêla din ve jî seba bîngeheke zanistî (!) û qedîm (?) ji nijada xwe re peyda bikin xebatên xwe meşandin. Loma hemû jêderên ketibûn bîra jibîrkirinê dîsa hatin kifşkirin, nirxandin û bi reng û rûyekî nûjen pêşkêşî qada hizrî û siyasî kirin. Ji ber vê rîwayet, çîrok û metelokên li ser kok û eslê gelan bûne

xwedînirx. Wekî piraniya gelan, Kurdan jî di vê qadê de xebat, herçendî baskîketî û takêşî be jî, meşandin. A jî wan çavkaniyên jî nû ve hatine nixandî bêguman ya sereke *Şerefname* ye.

Şerefname jî bo nivîsîna dîroka Kurd û Kurdistanê gelek hêman û agahiyên bijare di nav xwe de dihewîne. Êdî kar li ser milê dîroknasên serdemê ye û wê li gor pêdiviya xwe jî bo jî nû ve nivîsîna dîroka Kurdan wê binirxînin. Lewra *Şerefnameya* ku jî bo dîroka Kurdistanê çavkaniyeke sereke ye, îro jî bi gelek aliyan ve kêrî dîroknivîsiya Kurdan tê. Bi naveroka xwe ya dewlemend ve di nav xwe de agahiyên girîng dihebîne. Tiştê divê dîroknas bikin ew e ku jî xwe re li gor nêrîn û armanca xwe jî nû ve şîrove bikin. Lewra hemû kedkarên hewl didin “neteweya xwe îcad bikin” heman tiştî dikin.

Em vê çima dibêjin? Şeref Xan dibêje li ser eslê Kurdan -ev mijar jî bo neteweparêziyê girîng e- gotin û rîwayetên curbecur û berevajî hevdu hene. Lê gava qebareya pirtûka wî û ew beşa qala eslê Kurdan dike tê berawirdkirin tê dîtîn ku ev babet tenê jî bo mijar kêrî nemîne hatiye dayîn, ne ku jî bo îsbat û tesbîtkirina eslê Kurdan e. Ango armanca Şeref Xan û ya dîroknasên nû li hev nake. Ji vê hêlê ve dibe ku têrê neke û heta bê rexnekirin ka çima hê agahiyên dewlemendtir û kêrhatîtir nedane. Ji vê helwesta nivîskar jî derdikeve holê ku wî jî bo îsbatkirin yan jî înkarkirinê ew rîwayetî nadaye. Lewra wê serdemê tu derdekî bi vî rengî yê dîroknasên tunebû û xema Şeref Xan jî ew nebû. Ango jî bo wî ev mijar ne tişteki girîng bû ku li ser hûr bibe. Lewra wê serdemê nijad, esl piştî dîn û baweriyê dihat. Heke qala neteweyekê bihata kirin, ew netewe umeta Îslamê bû û hêmana ku ew dikirin yek jî dîn bû. Welat jî Darul Îslam bû.

Çavkanî

- Anderson, Benedict (1995), *Hayalî Cematiyê, Iskender Savaşır* (wer.), Stenbol: Metis.
- Bazîdî, Mela Mehmûdê (2007) *Mem û Zîn*, Xelîl Duhokî, (vgz.) Di-yarbakir: Lis.
- Bedîlî, Şerefxanê (1997), “Destpêka Şerefnameyê”, Ziya Avcî (wer.), *Nûdem*, j. 21, r. 14
- Bedîlî, Şerefxanê (2007), *Şerefnameya Şerefxanê Bedîlî*, Mela Mehmûdê Bazîdî (wer.), Duhok: Spirêz.
- Beg, M. Emîn Zekî (1998), *Kürd ve Kürdistan Ünlüleri*, M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay, (wer.) Swêd: Apec.
- Bildîsî Şerefxan (2014), *Şerefname* f. Abdullah Yegîn, (wer.), Stenbol: Nûbihar.
- Celafî, Murad (2016), *Mela Mehmûdê Bazîdî û ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiyê*, Stenbol: Nûbihar.
- Çağlayan, Erhan (2016), “Şeref Han-ı Bitlîsî'nin ‘Şerefname’ eserine tarihsel bakış”, *Bakı Devlet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi'nin Elmi Macmuası*, j. 25.
- Çay, Abdulhalûk M. (1994), *Her Yönüyle Kürt Dosyası*, Ankara: Turan Kültür Vakfı.
- Dehqan, Mustafa (2014), *Index to Sharaf-nâma İndeksa Şerefnameyê*, Stenbol: Nûbihar Akademî.
- Ehmed, Kemal Mezher (1997), “Şerefname di Kurdnasiya Sovyetê de”, Ziya Avcî (wer.), *Nûdem*, j. 22, r. 43.
- Findî, Reşîd (2006) *Pertûka ‘Adat û Rusûmatnameê Ekradiyê ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, Duhok: Spirêz.
- Han, Şeref (1971), *Şerefname Kürt Tarihi*, Mehmet Emin Bozarslan (wer.), Stenbol: Ant.
- Hayes, Carlton J. H. (2010), *Milliyetçilik: Bir Din*, Murat Çiftkaya (wer.), Stenbol: İz
- Özgüdenli, Osman Gazi (2010), Şeref Han, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi* (c. 38, r. 548), Stenbol: Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi.
- Samî, Şemseddin (2001), *Tarihteki İlik Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürtler*, Mehmet Emin Bozarslan (wer.), Stenbol: Deng.
- Vatandaş, Celalettin (2010), *Ulusal Kimlik Türk Ulusçuluğunun Doğuşu*, Stenbol: Açılım Kitap.
- Yalansız, Nedim (2009), “Karşılaştırmalı Tarih: Tarih Öğretiminde Yeni Bir Yaklaşım”, *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Volume 2/9.

Jêrenot

- 1 Di madeya Şeref Han ya *Ansiklopediya İslamê (IA) ya Weqfa Diyanetê* de tê gotin ku muellif bi xwe ev nusxeya ku di sala 5ê cemaziyewwela sala 1015an (8ê İlonê sala 1606an) hatiye İstînsaxkirin xwendiyê û serast kiriyê, lê ev dîrok bi dîsa li gor heman madeyê şaş e. Lewra di wê madeyê de dema mirîna Şeref Xan wekî 1012/1603-1604 hatiye nîşandan. Bnr. Özgüdenli, 2010: 548.
- 2 Ev dîrok di madeya *Ansiklopediya İslamê (IA) ya Weqfa Diyanetê* de bi şaşî wekî 1027 hatiye nivîsîn.

Ger Bêhna 'Aşiq Teng Bibe'

MEWLANA CELALEDDÎNÊ ROMÎ
WERGÊRA JI FARISÎ: HAYRULLAH ACAR

Ger bêhna 'aşiq teng bibe, 'alem ber bi agir dibe
Ev 'alema bê binyad ji bini ser û bin dibe

'Alem yekser derya dibe, derya ji heybet "la" dibe
Ne adem û beşeriyet, her tişt ji bini "na" dibe

Diqelêşe asîmanan, nahêle kewn û meknan
Bi tirsê dikeve cihan, banga Sûrê matem dibe

Dûrxan radibe ji felek, ne xelq dimîne ne melek
Ji dûrxanê agirek tê, quba mîna ber xwe dibe

Gehî agir avê hildike, geh av agiran dadike
Pêlên deryaya nebûnê, reş û tarî l'ber xwe dibe

Roj dipengize jêrî, ji nûra canê ademî
Zêde mepirs j' namehroman, mehrem li wêdê kêr dibe

Merîx mêranî j' dest dide, defter disojit Mustêrî
Heybeta heyvê namîne, şadiya wê tev kem dibe

Çonga Utaridê dişkê, agir bi Keywan dikeve
Ziravê Zuhre diqete şadiya wê giryan dibe

Ne derd dimîne ne derman, ne dijmin û ne hogiran
Ne ney dimîne ne newa, ne çenga pê şadan dibe

Ne kesk dimîne ne sor, ne dilbera gerdenbilûr
Ne kêf dimîne ne fereh, birin tev bêderman dibe

Ne av erdê dineqşîne, ne ba ewran dilqşîne
Ne bax diwerzîne mêwan, ne ji nisan baran dide

Heq agirekî pêdixe, ta nehoqan tevî têxe
Agir disojite dilan, da li dilê cihan bide

Esbab ji holê radibe, saqî bi xwe saqî dibe
Can "Rebbîyu'l-e'la"*** dike, dil "Rebbîyu'l-e'lem"**** dibe

* Mewlana Celaleddîne Rûmî, *Kulliyane Dîwana Şems*, (New-î Bediuzzaman Fuzûlî), Intiqamê Behzad, xezel no: 175/344, Tehran, 1329.

** Ey rebbê min î mezin!

*** Rebbê min î mezin dizane.

Wehdeta Wucûdê li ba Melayê Cizîrî û Seîdê Kurdî

MERDAN NEWAYÎ

1 **Destpêk**
Mela Ehmedê Cizîrî di sedsalên 16 û 17an de jiyaye. Damezrînerê şê'ira Kurdî ya klasîk tê qebûlîkirin. Di dîroka edebiyata Kurdî de yekem kes e ku xwe-di-yê dîwaneke mureteb e, hemû kêşên arûzê di dîwana xwe de bi kar anîne. Kurd qudsiyetekê didin şê'irên wî, dibe ku her li medreseyan bi destê feqî û meleyan de dîti-ne lewma. Şê'ira wî digel ku hişk e; bi mecaz, sembol û teşbîh e, ne tenê li ser destê alim û zaneyan bûye li ser devê xelkê jî bûye. Gelek şairên Kurd di bin tesîra wî de mane, ev tesîr pîrhêlî ye. Mela ji hêlekê ve rihê edebiyata Kurdî vejandiye ji hêla din ve hizra tesewufa Kurdî kemilandiye. *Dîwana* Mela sînor derbas kirine li

her çar perçeyên Kurdistanê û li gelek welatên din belav bûye.

Dîwana Mela gelek caran hatiye rûnuskirin, cara ewil (bi qasî tê zanîn) Muhemmed Teyar Amêdî ew di sala 1915an de rûnus kiriye. Gelek caran hatiye çapkirin, cara ewil bi destê Martin Hartmann li Berlînê di sala 1904ê de hatiye çapkirin. Gelek şerh û wergerên wê hatine kirin. Bi Rûsî, Erebî, Tirkî hatiye wergerandin. Bûye mijara kitêbên lêkolîn û gotarên ilmî û tezên akademîk...

Di vê xebatê de emê li mijara wehdeta wucûdê hûr bibin; emê wehdeta wucûdê ya di *Dîwana* Melayê Cizîrî de bi fikra Seîdê Kurdî ya wehdeta wucûdê re berawird bikin. Armanceke din a vê xebatê nîşandana tesîra Melayê Cizîrî ya li ser Seîdê Kurdî ye.



2. Jînenîgariya Melayê Cizîrî (1567-1640)

Li ser jînenîgariya Mela Ehmedê Cizîrî gelek guftûgo hatine kirin, nexasim derbarê jidayikbûn, wefat û serdema wî de. Emê nekevin nava van nîqaş û hûrgiliyan. Li gorî me di vî derbarî de nirxandinên herî bi îsabet ên Mela Ehmedê Zivîngî û T. İbrahim Doskî ne û helbet agahdariyên di *Dîwana Mela* de ne, lewma emê jî para zehf ji wan sûdê werbigrin.

Li gorî *Dîwana Mela* navê wî Ehmed e: (*Ehmed*) *im sîne sîper pêşberî tîra felekê / De'wedarê te me îro tu ji dehlê were der* (*Dîwan*, r. 144, Doskî). Botî û Kurdistanî ye: *Gulê baxê îremê (Bohtan) im şebçiraxê şebê (Kurdistan) im* (*Dîwan*, r. 333, Doskî). Leqebên wî yên meşhûr Mela û Nîşanî ne: *Wehdetê mutleq (Mela) nûr e di qelban cela*. (*Dîwan*, r. 37, Doskî). *Carekî guhde (Nîşanî) ne (Melayî) were bavî* (*Dîwan*, r. 76, Doskî). Ji dayikbûna wî: *Ji herfa mah û salê ma nehat der şiklê falê ma / Kuca danendî halê ma sibikbaranê sahilha* (*Dîwan*, r. Pêşgotin/30, Doskî) حرفا = 289, ما = 41, سال = 97, وصال = 46, ماه = 41. Bi tevahî 957 dike ev hejmara ku Mela di nav fala xwe de dîtiye ev e. Ji vê diyar dibe ku Mela di sala 957ê hicrî beranberî 1567-1568ê miladî hatiyê dinyayê. (Doskî, 2005: Pêşgotin/20-21)

Doskî bi rêbaza ebcedê ji peyvên şikl/شکل=

350, reqem/رقم=340 û sersal/سرسال=351 bi tevahî 1041ê hicrî beranberî 1631ê zayînî derdixe. Dîsa Doskî dibêje, mebesta Mela ji du elifan du heb yek in ango yekê meha yekê, bi vî awayî $1/1/1041$ ê hicrî beranberê $29/7/1631$ ê zayînê tarîxa dawîya *Dîwanê* ye ku Mela 66 salî ye. (2005: pêşgotin/23)

Wefata Mela: T. İbrahim Doskî ji risteke şê'ira Feqiyê Teyran ya bi navê "Îro werin..." a ku tê gotin li ser wefata Mela hatiye nivîsin bi hesabê ebcedê derdixe ku Mela di sa 1640î de wefat kiriye; ew ristika şê'ira Feqî ya li jêr e, Doskî ev helbest wekî pêvek xistiye dawîya *Dîwanê: Heft e'yin ku lam jê bû cuda şîn û girî dîsa tê da* (*Dîwan*, pêvek/Doskî) $ع (70) \times 7 = 490, 490 - ل (30) = 460, شون = (360), گري = 230, Tevahî = 1050/1640$.

M. Ehmedê Zivîngî dibêje; navê wî Şêx Ehmed e. Leqeba wî ya meşhûr Melayê Cizîrî ye, nisbet e bi bal Cizîra İbn Emer ya ku wekî Cizîra Botan nav û deng daye, herwiha dikeve ser qeraxê çemê Dicleya nêzîkî Çiyayê Cûdî. Leqebeke wî ya din jî heye, ya ku hinek qesideyên wî pê diqedin ew jî Nîşanî ye. Nisbet e bi bal nîşanê ve bi maneya hedefa tîrên muhbet, bela û mûsîbetên bi sedem eşqê. (2013: Muqadîme/9) Xalid Cemîl Muhammed hejmara leqebên Mela' heta nehan dijmêre û dibêje ne ev tenê ne jî: "A'şîqu'l-hubî we'l-cemal" (Aşîqê hub û cemalê), "Behru'l-mea'nî"

(Behra ma'neyan), "Nişani" (Nişan-geh), "Emîru'l-uşşaq" (Mîrê aşiqan), "Emîru'l-beyan" (Mîrê belaxetê), "Şeyxu'l-aşiqîn" (Şêxê aşiqan), "Şeyxu'l-muhibbîn" (Mîrê dildaran), "eş-Şeyxu's-sani" (Şêxê duyem) [piştî Şêxê Sen'an], "el-Cezerî" (Cizîrî). (Muhemed, 2006: 17)

Di derbarê ka Mela li ku derê jiyaye Zivingî agahiyên Ebdulqadirê Elî Îmadî yê ku di sala 1938ê de *Dîwana Mela* rûnus kiriye ji rastiye dûr nedîtine û hilgirtine nav muqedîmeya şerha *Dîwana Mela*; navê wî Şêx Ehmedê kurê Şêx Muhammed e. Di sala 1407ê zayîne de li Cizîrê hatiye dinyayê. Ji eşîra Boxtan e. Di destpêkê de ji babê xwe ders wergirtiye. Pêleyekê li derdora Diyarbekir, Cizîr, Hekarî û Îmadiyê tehsîla ilim kiriye. Îcazeya xwe ya ilmî li gundê Sitrabas a nêzikê Diyarbekirê ji Mela Taha wergirtiye. Û li gundê Sirba ya li heman deverê demekê meletî kiriye. Piştî wê çûye li Heskîfê muderisî kiriye, îcaze daye gelek kesan. Di wê navê de eşqa tesewufê lê daye, dev meşxeleya ilmê zahir berdaye û hatiye bajarê xwe Cizîrê. Li wir maye heta sala 1471ê zayîne di 75 saliya xwe de wefat kiriye. (2013: Muqedîme/9)

3. Heyîn di Hizra Îslamê de

Berî teşekula bîrdoziya Îslamê jî tradîsyonên felsefê yên heyîne hebûn. Hinek êkolên felsefeyê ji bo çareserîya vê meseleyê hêleke heyîne tune hesabandine (panteîzm), hinan herdu hêlên kategoriyan heyîne ji hev cihê hesabandine (dulîzm, manîheîzm), hinan jî herdu hêl li hev anîne weke yek bin hesabandine. (wehmeta wucûdê). (Doru, 2012: 123)


Sofiyan pêşî, têgeha wucûd (heyîn)ê ji bo vegotina hal û rewşên di dema seyrûsilûkên xwe de pêrgî wan dihatin bi kar dianîn. Li gor vê "wecûd, wucûd" û "tewacud" a ku insan zorê dide xwe ku bikeve wecûdê vedibêje, di nava sofiyan de bûn ciyê nîqaşê û hatin van serdemên dawî. Ev têgeh di wateya vedîtin an zanîne de gihîştin hev û bi domana demê re bi maneya heyîn û hebûnê de wekî wucûd û mewcûdê wateyeke nû wergirtin. Digel wî sofiyan tu carê təkiliya zanîn û heyîne ji

“

Di tesewufê de təkiliya Xwedê-insan û alemê di bingeha xwe de li gorî bîrdoziya felsefeya Îslamê ya "heyîn"ê teşe werdigre.

hev neqetandin. Lewma sofî ji bo derbirîna xwe tebîra "ehlul-keşf we'-wucûd" ango yê ku hem ehlê wecûdê û ehlê wucûdê jî. Bi vegotîneke din tê wateya ehlê Heq. Teorîsyenên tesewufê yên nû yên ku bi Ibnu'l-Erebî û Konewî derketin jî vê îrtîbata heyîne ya bi zanîn û pêzanîne re domandin. (Demirli, 2007: 25) Ji bo têngîştina hizra sofîtiyê pêdivî bi zanîna termînolojiya wan heye. Nablûsî wiha dibêje: "Dema em ji Heq re dibêjin heyîn te-bîreke 'hêsan fêmkirîne' qest dikin." Nexwe mahiyet û heyîna Xwedê yek e. Lêbelê heyîna bi mebesta mahiyet û zatê Xwedê, wesfandîneke ne kifş e û selbî ye. Heke ne wisa be zanîna heyîna Xwedê dê bê maneya zanîna zatê Xwedê ku, ev ne mumkun e. (Demirli, 2012: 38)

Di tesewufê de təkiliya Xwedê-insan û alemê di bingeha xwe de li gorî bîrdoziya felsefeya Îslamê ya "heyîn"ê teşe werdigre. Ji ber ku ji bilî Xwedê kes bi heqîqeta heyberan nizane, zanîna



însan a derbarê heyberan de ji hêlekê ve ye, ne li gorî rasteqîniya wan e. Li gorî hizra Îslamê bi gîştî heyîn bi van awayan hatiye şîrovekirin:

a) **Wacîbu'l-wucûd** (Wucûda Mutleq): Xwedê Tea'la bi zatê xwe qaîm, ji bo heyîna xwe ne muhtacê kesî, qedîm, wacib, ji guherîn, perçebûn û kêmbûnê munezeh, baqî heq e.

b) **Mumkînu'l-wucûd** (Wucûda Umûmî): Ev wucûda ku bi alî eşyayan ve tê nisbet dan, ne wucûda rasteqînî ye, şikl û şemalên curbicûr ên teyîsîna nav û sîfatên Xwedê ne. Eşya bi zatê xwe ma'dûm, hedîs, mumkun, guherbar û fanî ye. Li gorî mutesewufan, ev heyberên ku hene bi îtibara heyînê eynî Heq in, bi îtibar te'eyun (derketina holê) xeyrê Heq in.

c) **Mumtenîu'l-wucûd** ('Edem): Ziddê heyînê ne, ango tunene. 'Edem ew tişt e ku ji ezê heta ebedê tiştêk jê dernayê û tevgerekê pek nayne.

'Edem du qisim e, 'edema mutleq û 'edema îzafî. 'Edema mutleq nayê tesewurkirin jî. 'Edema îzafî (îtibarî) bilquwwe mewcûd e, bi'l-fi'îl di dereceya tunebûnê de ye. Hunerweriya di zatê însan de heta ku dernayên bil-quwwe mewcûd in, bi'l-fi'îl nînin, 'edem in. (Kurt, 2009: 559-560)

Hüseyin Kurt dibêje têkiliya Xwedê-însan û alemê, yek ji mijarên herî girîng a hizra tesewufê ye. Vê têkiliyê hiştiye ku ekolên bi navê *Teîzm* (Theisme), *Deîzm* (Deisme), *Panteîzm* û *Pan-anteîzm* derkevin holê:

Teîzm; Ekoleke felsefeyî ye ku wekî prensîb di têkiliya Xwedê û 'alemê de yekîti û hebûna Xwedê, te'aliya wî, aferandin û îdarekirina wî ya gerdûnê, dînekî îlahî, wehyê, pêxemberiyê, rih û nemiriya wî qebûl dike.

Deîzm; Pergaleke felsefeyî ye ku di têkiliya Xwedê û 'alemê de te'aliya Xwedê qebûl dike û heyîna Xwedê weke mecbûriyeteke aqlî dihesibîne, lêbelê her cure wehyê, îlhamê, Xwedayê ku wehyê dişîne, dîn û qederê inkar dike. Di vê sîstemê de Xwedê 'alem xuliqandiyê û xwe daye kêlekekî, îşê xwe ji kar û barê dinyayê nayne.

Panteîzm; Pergaleke felsefeyî ye ku di têkiliya Xwedê û 'alemê de, sedema xulqandina heyîn û 'alemê cardin ji zatê wan dihesibîne; xaliq û mexlûq, Xwedê û 'alemê yek qebûl dike. Li gorî baweriyê, "Xwedê her tişt e" an jî "her tişt Xwedê ye."

Pan-anteîzm; Li gorî vê baweriyê jî di têkiliya Xwedê û 'alemê de wucûd (cewher) a Xwedê hemû 'alem îhate kiriye û tê de mundemîc e. Ev ekol dixwaze baweriyê te'alîbûna Xwedê û baweriyê ku Xwedê di her tiştî de ye telîf bike. Li gorî vê baweriyê Xwedê û 'alem ne heman tişt in. Her tişt di Xwedê de mewcûd e, lê 'alem bi temamî ulûhiyetê teşkîl nake. (Kurt, 2009: 561)

4. Tesewuf

Ji ber ku karwaniya tesewufî rewşeke halî ya me'newî ye hema bêje her mutesewufekî navdar tesewuf li gorî xwe pênase kiriye:

Nasrabazî: Xwegirtina bi Qur'an û Hedîsê,

rûbadana ji hewa û hewesan, hurmetnîşandana şêxan, qebûlkirina azadiya xelkê, dewama zikrê û derbarê îbadetê de bi pey tewilan neketin. **Şibli:** Dostanî û hezkirina dualî ye. Bêyî qet endîşeyek xwegirtina Xwedê ye. Guhnedana tiştên vala yên ruhî ye. **Ebû Saîd:** Terikandina îş û karên fuzûlî ye. **Îbn Hafîf:** Sebra li qederê, razîbûna dana Xwedê, ji bo bidestxistina rastiyê lihdana req û tor e. Xwegirtina bi ilmê heqîqetê ye. **Ebû Hafs:** Îbaretê ji edebê ye. Ev tesbîtên ji nava bi sedan pênaseyan hatine hîlbijartin nîşan didin ku hêla olî ya mijarê dertê pêş û milê sincî baş diyar dibe. (Kara, 1992: 9)

5. Wehdeta Wucûdê

Wehdeta wucûdê, yekîtiya heyberan. Di dîroka hizrî ya felsefeya Îslamê de wehdeta wucûdê, ew bîrdoziya tesewufê ye ku bi rêya keşf û tecrûbeyê, Xwedê bi zatê wî di ser hemû heyberan de, bi nav û sîfatên wî di nav hemû heyberan de dihesibîne; ji bilî Xwedê tu heyînên rasteqîmî qebûl nake, hemû heyberan wekî dîmen û teyîsingehên Wucûda Mutleq dibîne û wan bi nisbetî heyîna heqîqî wekî tunebûna ezêlî û ebedî hesab dike. (Kurt, 2009: 561) Wehdeta wucûdê ji hêla Muhyeddîn Îbn Erebi (1162-1240) ve hatiye birêkûpêkirin. (Turan, 2010: 729) Lêbelê wî di berhemên xwe de têgeha “wehdet’ul-wucûdê” bi kar neaniye. Piştî wî ev têgeh di nava muxtewaya fikrên wî de teşekul kiriye. Li gorî Îbn Erebi, heyîn ji yek heqîqetê îbaret e. Ew jî, bi gotina “*La mewcûde illallah*” angî “ji bilî Xwedê mewcûd nînin” îfade dike. Lêbelê ev gotin nayê wê maneyê ku “her tişt Xwedê ye”, Xwedê mewcûdê mutleq e. Sedema heyîna wî nîne, ew bi zatê xwe heye. (Kurt, 2009: 562) Piraniya mu-tesewufên piştî Îbn Erebi hatine pergela wehdeta wucûdê pejirandine û dane dîv rêça wî. Mesela; Mewlana Celaleddînê Romî, Sadru’-d-Dîn Konewî, Mele Camî ji van çend kes in. Çawa ku hinan pergala wehdeta wucûdê ya Îbn Erebi qebûl kirine yên qebûl nekirine jî hene. Heta kesên wekî Îbn Teymiye (1263/1328) û Aliyu’l-Karî ew tekfir kirine. Îmamê Rebbanî (971-1034/1563-

1624) jî pergala wehdeta wucûdê rexne kiriye lêbelê Îbn Erebi tekfir nekiriye. Rebbanî fikra wehdeta şuhûdê diparêze. (Turan, 2010: 729-730; Îmamê Rebbanî, 1977: 85-86)

6. Wehdeta Wucûdê li ba Melayê Cizîrî

Binyada sofîtiya Kurdan digihêje serdema destpêka sofîtiya cîhana Îslamê. Ji roja terîqet û sofîti derketiye holê ve behsa gelek alim û sofîyên Kurdan tê kirin. Lêbelê heta digihêje Mela di nav sofîyên Kurd de yên ku bi Kurdî berhem dane gelek kêin. Baba Tahîrê Uryan (m. 401/1010) bi Kurdiya Lorî rubaî nivîsîne, Ebdussemmed Babekê Hekkarî (m. 470/1078) û Elî Herîfî du kes in şê’îrên xwe bi Kurdiya Kurmancî nivîsîne. Piştî wan di sedsala XII. û XIIIan de kesê wekî Ebul-Berekat Hekkarî (m. 605/1208) û Şêx Fexrî hebin jî tesîreke ciddî li civakê nekirine. Lewma destpêka edebiyata Kurdî sedsalên XV. û XVI tî qebûlîkin. (Kavak, 2015: 56)

Li gorî Mela ji bo şîrovekirina piraniya di heyînê de, diyarkirina teceliya xwedayî û zuhûra wî û hwd. pêdivî bi ilmên felsefeyê heye. Li gorî wî da ku heyîn û hebûn bikaribin bî îzahkirin pêdivî ne tenê bi ilmên metafîzîkî, di heman demê de bi ilmên nezerî yên wekî matematîk, astronomî û fizîkê jî heye. Jixwe Mela pisporê van ilman e jî. (Doru, 2012: 155)

Mela hizra xwe ya wehdeta wucûdê weke têgeh “wehdeta Mutleq” û “Wehdeta Sîrf” bi nav dike û di bin sîwana van te’bîran de hizra xwe ya wehdeta wucûdê bi dehan remz, nîşan, metafor, mecaz û teşbîhan diyar dike:

*(Wehdetî mutleq) Mela nûr e di qelban cela
Zorî di vê mes’lê ehlê dilan şubhe ma.*

(*Dîwan*, r. 6, Misir)

*(Wehdetê sîrf) e me meşreb te çî iksîrê wucûd
Em lebaleb çî lebaleb bi xwe hem cem’ e lebaleb.*

(*Dîwan*, r. 15, Misir)

Hizra Mela ya wehdeta wucûdê ji bîrdoziyên ku Xwedê ji bo heyînê wekî delîl nîşan didin, an heyînê ji bo Xwedê wekî delîl nîşan didin nîne. Ji hêla din ve nikare bê gotin ku hizra Mela panteîstî

ye, ango li hember Xwedê heyberên di alemê de tune dihesibîne. Felsefeya Mela hizra heçî mayê ku hene wekî Xwedê dîtin e. Di bîrdoziya wî ya yekîtiyê de, di navbera wahid û ehed, ewwel û axir, zahîr û batîne de tu ferq nîne. Têgeha “wehdeta Mutleq” a ku Mela bi kar tîne, yekem car ji hêla Îbn Seb’în (1197-1270) ve hatiye bilêvkirin. Lêbelê, di navbera hizra Îbn Seb’în a wehdeta mutleq û hizra Mela wehdeta mutleq û wehdeta sirf a ku bi mebesta wehdeta wucûdê bi kar tîne de newekhevî heye. Mela wehdeta mutleqê ji bo îfadekirina yekîtiya Xwedê û alemê ji teceliya wî ye bi kar tîne. Hal ku ev e di pergala Îbn Seb’în de tecelî nîne, di hizra wî de Xwedê “her tişt e”, alem jî “ne tu tişt e”. (Doru, 2012: 158-159)

Dîwana Mela bi numûneyên wehdeta wucûdê ango wehdeta mutleq û wehdeta sirfê dagirtî ne. Abdulbaki Turan ji *Dîwana* Mela ji şêstî zêdetir beyt dest nîşan kirine.¹ Emê jî çend numûneyan pêşkêş bikin:

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu

Huwe’l-me’bûd huwe’l-meşhûdu bel la xeyre fi’d-dareyn.

(*Dîwan*, r. 95, Misir)

Li gorî Mela -an jî li gorî fêmkirina me ji ya Mela- her çi mayê li vê dinyayê û li wê dinyayê hene ji bilî heqîqeta Îlahî di hukmê tunehiyê de ne. Lê ji bo fêmkirina vê heqîqetê pêdivî bi feraseta naskirina rast a Xwedê heye.

Ji sirra la mekan wacib tenzzul kir di îmkanê

Fe eyne’l-’ilmu eyne’l-’eyn we eyne’l-eynu iz la eyn.

(*Dîwan*, r. 95, Misir)

Raza “La mekan wacib” ku Xwedê Te’ala ye, bi nav û sîfat û kirinên xwe ji ‘alema wacibê di-teyîse/dinizile ‘alema îmkanê. Herwiha ku ne Zatê Wacîbu’l wucûd be dîtin jî tê de dê heyîn nebin.

Herfê ji yek bûne fesil ger bibirî wan bi esil

Herfî dibit yek xetek xet ku nuqte ma.

(*Dîwan*, r. 6, Misir)

Mela destnîşan dike ku her tişt li eslê xwe vegere dê bibin yek. Ango hatina ji Xwedê û vegeerîna bi bal wî ve; wehdeta mutleq an wehdeta sirf.

*Çi zeman û çi mekan û çi cîhet çi hudûd
Çi meqadîr û çi tefasîl û hîsâb in çi ‘eded*

(*Dîwan*, r. 7, Misir)

Wehdeta şûhûdê, halê îstîxraqê, bi hemû hisekan hîskirina Xwedê Te’ala, demdemî be jî veguherîna Xwedayî ya hemû heyberan a.

Ji enelheq bi lebên le’lî xeberdarî buwîn

Bi gulaba serê zulfa xwe te Mensûrî kirin.

(*Dîwan*, r. 99, Misir)

Mela îşaretê bi teswîba meşreba wehdeta wucûdê dike û dibêje ji ‘îşqa te em sofî şet û sewda ne.

Tûr im û bi dil peyrewê Mûsa yim ez

Ateşperes û nûrê tecella yim ez.

(*Dîwan*, r. 55, Misir)

Weke hemû şêrên derbarê wehdetê de Mela li vir balê dikşîne ser wehdeta mutleq, dixwaze bêje ji bo danûsitandina bi Xwedê re ne hewce ye tu biçî Çiyayê Tûr, guhê xwe bide dilê xwe, ew teyîsingeha Rehman e.

Sed Nîl we tîn û diderin qelbê me

Pê nahisihîn qulzem û derya yim ez.

(*Dîwan*, r. 55, Misir)

‘Eynîbûn û wekheviya hemû heyberan vedibêje Mela, ji hêlekê ve. Ji hêla dîn ve dibêje ku ew dilê ku banga navê Ellah lê ye diltengî û sînor jê re nîne.

Herdu birhên te ne mihrab çi îman û çi kufîr

Bûd û nabûd ku yek in ev çi sewab û çi ‘iqab.

(*Dîwan*, r. 14, Misir)

Di halê wecd û îstîxraqê de metamorfoza mîstîk a seqaya wehdeta mutleqê vedibêje Mela.

Gote me durdane yî em ji te û tu ji me yî

Lew bi heqîqet yek in mes’ele bê şubhe ma.

(*Dîwan*, r. 5, Misir)

Li gorî min ev şêr şîroveyê qebûl nake, ji ber ku şahnumûneya wehdeta wucûdê ye û me’neya wê di “şiddeta zuhûr” a wê de veşarî ye.

Ji musemma ‘eded û kesretê esma tu mebîn

Zeyd û ‘Emrên me hetta çendî du nîne yek û yek.

(*Dîwan*, r. 81, Misir)

Mebest li vir “me’neya herfî” ye. Çawa di terkîbên rêzimanî de bi guherîna navan erka kirde û bireserê naguhere, a girîng destnîşankirin û nîşandana hêmayên hevokê ne, eynî bi vî awayî hemû heyber Zatê Wahidê Ehed nîşan didin û qîmeta wan jî ji wir tê.

*Senema sur ji Semed şewqê ji Heq daye wucûdê
Ger ‘Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê.*

(Dîwan, r. 174)

Ger di Adem bidîya sîrrê ‘îlim Iblîsî

Hînema ebserehu kebere hînen we secêd.

(Dîwan, r. 5, Misir)

Di van herdu şê’ran de dereceya wehdeta wucûdê ya Mela ew derxistîye çî astê diyar e. Di vir de “ehsenê teqwîmî”, “eşrefê mexlûqatî” û “xelifetîya însan” hatiye kifşkirin û qedr û qîmeta însaniyetê ku ji Xwedê Te’ala werdigre hatiye diyarkirin. Ji milê din ve cahilî û nezanîna xwendina raza Fatirê Xellaq hatiye zemkirin. Heger ‘Ezazîlê milyaket di wê sîrrê bigihîşt, ji secdekirina Adem/Însaniyetê rû banedida û nedibû Şeytan û Iblîs.

Wehdeta Wucûdê li ba Bedîuzzeman Seîdê Kurdî

Nezeriyeya “yekîtiya heyînê”, li gorî dîrokanên tesewufê, di bîrdoziya Îslamê de yek ji wan hizrên herî dewlemend û bi rêkûpêk e. Têgeha wehdeta wucûdê ya ku yekem car telebeyê Şêxê Ekber Sadruddîn Konewî bi kar aniye, xwe dispêre hizra “maxlûqatên ku ji ‘yek’ê sudûr di-kin ne xwediyê wucûdeke heqîqî ne”. “Wehdeta şuhûdê” ango “yekîtiya tiştên tîn dîtin” an di wateya “yekîtiya dîtinê” de tê bikaranîn; di halê wecdê de yek dîtina her tiştî ya salik, li her derê tecellîya Xwedê Te’ala muşahede kirin. Di wehdeta şuhûdê de yekdîtîna her tiştî ya salik halekî demdemî ye. Dema halê wecdê xilas dibe ev rewş jî namîne. Yekîti ne di zanînê de di dîtinê de ye. Lê di wehdeta wucûdê de yekîti di zanînê de ye. (Kurt, 2009: 564)

Çawa ku hizreke Mela ya wehdeta wucûdê heye ku wekî wehdeta mutleq an wehdeta sirf

binav dike, wisa hizreke Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî jî ya wehdeta wucûdê heye, an fêmkirina wî ji wehdeta wucûdê. Nûrsî, di şîroveya ayeta “Qul huwellahu ehed” de dibêje, cîlwe/teyîsîna ferdîyetê, sikeya wehdetê bi awayekî wisa daniye rûyê kaînatê, ku kaînatê xistiye rewşeke kul/yekgirtî, ku tecezzî/perçebûnê qebûl nake. Zatekî ku nikaribe li hemû kaînatê tesserûfê bike nikare li qîsmekî wî jî tesserûfê bike. Di berdewamiya wê de Nursî balê dikişîne ser mewcûdatên kaînatê ku çawa bi hev re dixebitin; alîkarî û piştgiriya hev dikin, hev himbêz dikin û bi awayekî wusa dikevin nav hev ku “wehdeta wucûdê” pêk tînin. Dibin wekî bedena însanekî ku nikarin ji hev biqetin. Eve ev teawun, tesanud, tecawub, teanuq, sikkeya kubra ya wehdetê ya rewnakdar e. (b2004: 469)

Bedîuzzeman di têkiliya Xwedê û alemê de, alemê ciyê “a ku di rûyê wê de bi hezaran şû’ayên tecellîya navê Rehman dixweyê” tesewur dike. Herwiha rûyê erdê ciyê a ku di rûyê wê de navê Rehman bi bêhed awayên cîlweyî yên Rubûbiyeta Mutleq a Îlahî tezahur dike” dihesibîne. Însan jî “eyneya ku sûretê Rehman dîtayîsîne” binav dike. (Bolay, Gotar)

Ji Seîdê Kurdî dipirsin: “Meseleya wehdeta wucûdê, ji hêla gelek kesan ve meqamê herî bilind tê telaqîkirin... Gelo ên piştî sehabe û muctehidan rabûne rêyeke çêtir dîtine?” Bersiv: Haşa! Ne heddê kesî ye ku ji sitêrkên herî nêzîk ên Şemsa Rîsaletê û warîsên wî yên herî nêzîk ku esfiya ne biborîne, teqez rêya mezin a wan e. Wehdeta wucûdê ku heye, meşrebek e, halek e û mertebeyeke kêma e. Lêbelê ji ber ku bi zewq e, bi neşe ye, dema di seyr û sulûkê de dikevin wê mertebeyê, zehfê caran naxwazin jê derên, di wir de dimînin, ji wan werî ew mertebeya herî dawî ye. Xwediyê vê meşrebê, eger ji maddiyat û ji wesaitan berî be û xwedî rihekî ku perdeya sebebî çirandibe û mezherê şuhûdeke îstîxraqî be, ne ji wehdeta wucûdê, belkî ji wehdeta şihûdê ya ku ji wehdeta wucûdê ne ya ilmî ya halî neşet kiriye, jê re asteke kemalê û meqamê temîn dike. (Nursî, a2004: 97-98)

7. Bi Gîştî Berawirdkirina Hizra Melayê Cizîrî û ya Seîdê Kurdî di Derbarê Wehdeta Wucûdê de Dîgel Numûneyên Bandora Mela li Kurdî.

Mela bi terzê xwe yê ‘îşqa heqîqî û îlahî wekî pêgirekî Muhyeddînê Erebî tevgeriyaye û li ser felsefeya wî ya yekîtiya hebûnê perspektîfa xwe ava kiriye. Wî jî ji gelek hêlan ve bangorê li gelek şexsiyetên alim û zana kiriye ku yek ji wan jî Seîdê Kurdî ye. (Ertekîn, 2017: 83) Ji hêla îtîqadî ve di navbera hizra Mela û ya Seîdê Kurdî de tu nako-kiyek naxweyê. Tenê ji aliyê uslûb û mesrebî ve dibe ku cihêrengiyek xuya bike, ew jî li ber fikrên mîna hev û dişibin hev hesab nabin. Seîdê Kurdî 300 sal piştî Mela ye, lê ji alî hizrî ve yê nizanibin dê bêjin hevdemên hev in, ji aliyê bîr û raman, têgeh û termînolojî û uslûba hiş ve ewçenk dişibin hev. Kurdî ne tenê ji aliyê ittîqadî ve ji aliyê hizrî û derbirînê ve jî gelek di bin bandora Mela de maye. Di behsên îmanî de hema bêje Kurdî bi term û têgînên Mela meseleyan şîrove dike.

Ji aliyê fikir, tabîr û têgehan ve tesîra Mela li Seîdê Kurdî eşkera ye. Seîdê Kurdî hê dema di Rojnameya *Volkanê* de dinivîsi di gotareke xwe ya Tirkî ya bi navê “Hakikat” de cî daye beyteke Mela: “Sırr-ı vahdet ji ezel girtiye hetta ta [bi] ebed.” (Saîd-î Kurdî, 1909: 3). Çend numûne dê merama me çêtir îfade bikin:

Mela dibêje:

*Ji vê [di hinek nusxeyan de şevê ye] zulmat
û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştîya bayê ‘ecacê wê şevê dayê.*
(*Dîwan*, r. 30, Doskî)

Seîdê Kurdî di behsa Yûnus (e.) de dibêje:

“Ew avêtine **behrê**, masiyekî mezin ew belîandiye, **behr bi firtone/‘ecac** û **şev bi daxdaxe û zulûmat** û ji her hêlê ve hêvî qut...” (Nursî, b2004: 11-12)

Mela dibêje:

*Herfê reqemê lewhê wucûda min bixwan
Da qenc bibîni ku çî îmla yîm ez.
Zahir tu perîşanîyê halê me nebîn
Mecmû’ê di zatê xwe û tuxra yîm ez.*
(*Dîwan*, r. 55, Misir)

Seîdê Kurdî dibêje:

“Ziman mor/tuxra qederê ya li ser mirovan e. Heçî sûretê mirovahiyê ye, di reng û rûyê zîman de xweşikahiya xwe dide der.” (Seîdê Kurdî, 2012: 62)

Taybetmendiyêke Mela ya din, hizra wî ya Nûra Muhammedî ye. Ê ku care ewil ev mijar bilêv kiriye Sehl bîn Ebdullah et-Tûsî (m. 283/896) ye piştî wî, mutesewufên wekî İbn Erebî û Ebdulqadirê Geylanî (m. 561/1166) piratîze kirine. (Kavak, 2015: 55)

Mela dibêje:

*Mîm metle’ê şemsa ehed ayine sifet kir
Lami’ji ‘Ereb berqê li fexxarê‘Ecem da.*
(*Dîwan*, r. 3, Misir)

*Erwahê muqeddes şebê qedran te dixwazin
Nûra te ye misbah di qindîlê Herem da.*
(*Dîwan*, r. 3, Misir)

Seîdê Kurdî berhemeke li dora 150 rûpelî bi navê *Mucizatê Ehmediye* di derbarê Hz. Muhammed de nivîsiye:

(Binêre: *Mektûbat*, “Mucizat-ı Ahmediye”, Zehra Yayincılık, r. 105-249.)

Mela dibêje:

*Tûr im û bi dil peyrewê Mûsa yîm ez
Ateşperes û nûrê tecella yîm ez.*
(*Dîwan*, r. 55, Misir)

Seîdê Kurdî di şîroveya ayeta 5an a sûreya İbrahîm de, ku di Qur’nê de muxatebê wê Hz. Mûsa ye, dibêje, ev ayet bi awayê remzî û îşarî ferman dike da ku “vilayet-ı şerkiye” [Bakûr(iy) ê Kurdistanê] bîn îqaz û îrşadkirin. (Nursî, c2004: 660-661.)

Mela dibêje:

*‘Îşqê j Xudê da tu bixwazî jê ra
Ger dê li neyarek xwe bikî nefrînê.*
(*Dîwan*, r.169, Misir)

*Ne bi qanûn ku îşaret bi şîfaê bikirit
Ez hilakê xwe di ‘îşqê bi necatê nadim.*
(*Dîwan*, r. 89)

Seîdê Kurdî dibêje: Ji dêvla ‘îşqa di meşrebên din de, di meşrebê Risaleyê Nûr de şefqete-

ke muştaqî û re'feteke muhabetî heye. (Nursî, c2004: 669)

Meseleya yekîtiya olan:

Li gorî Abdulbaki Turan Mela jî wekî İbn Ere-bî yekîtiya olan diparêze (2010: 753-765:

*Bi zunnara di dêrê da li hindava çilîpayê
Bi mîhraba me bir secde belêemma xiyal ebrû.*

(*Dîwan*, r. 764, Misir)

*Dil geşte min ji dêrê naçim kenîşteê qet
Mîhrabî wê bi min ra wer da biçîne Laleş.*

(*Dîwan*, r. 760, Misir)

Gava em guhê xwe didin Bedüzzaman û Rîsaleyên Nûr gelek mijarên yekîtiya olan îma dikin hene:

a) Seîdê Kurdî dibêje, hin kesên layîqê wergirti-na navê “Müslüman İsevîleri” ango “Muslimanên İsewî” ne ku İsewiyên misilman an İsewiyên ku misilman bûne. (Said Nursî, a2004: 503).

b) Seîdê Kurdî dibêje, Rîsaleyê Nûr “İslami-yeti içine alan ve dağlar büyüklüğünde taşları olan bir muhit kal’ayı tamir ediyor.” Rîsaleyê Nûr “keleyeke wisa mezin e ku İslamiyetê di-hundurîne û kevirên wê yên bi qasî çiyayan hene tamîr dike.” (Said Nursî, c2004: 182)

c) Seîdê Kurdî bi vî awayî behsa Rîsaleyan dike:

“Ev Peyvên hatine nivîsîn ne tesewwur, tes-dîq in. Ne teslîm, îman in. Ne me’rifet, şehadet û şuhûd in. Ne teqlîd, tehqîq in. Ne îltîzam, îz’an in. Ne tesewuf, heqîqet in. Ne da’wa, burhanên di nav da’wayê de ne.” (Said Nursî, a2004: 528)

Bi qenaeta me Seîdê Kurdî ne di dereceya fikra Melayê Cizîrî de be jî di nuqta îmanê de bi musamehe li dînen semawî dinihêre. Helbet

sedemên vê yekê hene, yek jê, li gorî Kurdî de “İsayê Mesîh” were û dîne xwe tesafî bike û de mesîhî bîyî ku misilman bibin li dîne xwe yê eslî vegezin; tewhîdê, pîrozweriya Qur’anê û pêxemberiya Hz. Muhemmed qebûl bikin. Ya didoyê li gorî Kurdî “Dîne Muhemmedî” (ne İslamiyet) ketiye halek ji halên “fetret”ê lewma. Ji ber ku ev ne mijara gotara me ya bîngêhîn e em dirêj nakin, lê di nava kulliyata Rîsaleyên Nûr de îzaha vê meseleyê heye.✽

Çavkani

- Bolay, Söleyman Hayri, “Said-ı Nursî'nin Wehdetü'l-Wücûda Bakışı” Jê girtin: 30.01.2019: 09: 30 <http://www.bediuzzamansaid-nursi.org/icerik/said-i-nursi-c3%AEEnin-vaahdet-i-v-c3%BCcu-da-bak-c4%81-c5%9F-c4%B1>
- Cizîrî, Mela Ehmed, (2005), *Dîwan*, (Berhevkar: T. İbrahim Doskî)
- Cizîrî, Mela Ehmed, *Dîwan eş-Şeyx el-Cizîrî*, (Amadekar: Muhemmed Nûrî), Misir: Daru'l-Kitabu'l-Erebî.
- Demirli, Ekrem, (2007) “Varlık Olmak Bakımından Varlık İfadesinin Söylerce Yeniden Yorumlanması ve Bu Yorumun Metafizik Sonuçları”, *İslam Araştırmaları Dergisi*, 18: 27-47.
- Ertekin, M. Zahir, (2017), “Ağıré İqqê di Perspektîfa Mela de”, *Mukad-dime* 8 (hejmarê taybet), rr. 77-92.
- İmam-ı Rebbani, Ahmed Fârûkî Serhendî, (1977), *Mektubat-ı Reb-banî*, (Çev. Abdulkadir Akççek), Cild 1., İstanbul, Erhan Ya-yın-Dağıtım.
- Kara, Mustafa, (1992), *Tasavvuf ve Tarikatlar*, İstanbul, İletişim Ya-yınları.
- Kavak, Abdulcebar, (2015), “Melayê Cizîrî ve Tasavvufî Kürt Edebi-yatının Gelişim Dönemi”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* 2, rr. 48-66.
- Said-ı Kurdî, Bedüzzaman, (1909). “Hakikat”. *Volkan* 70, r. 3-4.
- Said Nursî, Bedüzzaman, (a2004), *Mektubat*, İstanbul, Zehra Yayın-cılık.
- Said Nursî, Bedüzzaman, (b2004), *Lemalar*, İstanbul, Zehra Yayın-cılık.
- Said Nursî, Bedüzzaman, (c2004), *Şualar*, İstanbul, Zehra Yayıncılık.
- Seldê Nursî, Bedüzzaman, (2012), *Dîwana Herba Urî*, (Wer: Aydın Üneşî), İstanbul, Hizmet Vakfı Yayınları.
- Turan, Abdulbaki, (2010), *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, İstanbul, Nû-bihar Yayınları.
- Muhemmed, Xalid Cemil, (2006), *el-Cezerî Şairu'l-hub we'l-cemal, Di-meşq, Daru'z-zaman İltiba'e we'n-neşir we't-tewzîf*.
- Zivîngî, Ehmed Bin el-Mela Muhemmed el-Botî, (2013), *el-İqdu'l-Cewherî fi Şerhi Dîwanî eş-Şeyx el-Cezerî*, İstanbul, Weşanên Nûbihar.

Tirbêto

BERKEN BEREH

loo gîdî hubano,

mihacîrê qicqîca dîlê wî ye bi hesreta wî kavilî
bo van tirbên hati rûmandin bo xêran

şopa destên te naxuye, tahma şeraba te ji bir bû
bew tê ristîn çabaga te ya bo dîlê li seralbetan
rûr û razi ne em bê sal û çapak

margîrê gulê di bihara xwe de çimîst
rawna min a bêserûgûn
birîna nabewê ya vê axê

welatê bejn û bal nexşa li desmalê
dest û stû baran û şems-bû

ka erbane, bîlûr, ribab û def
metran û keçe û dêr?

ev çandin sal e tirbêto
nema xêr û bîr
her li kêrê dide
rast nebû gîrîna jiyane

çabê-batman 2019

Alî Bate: Neviyê Elîkê Betê

ABDURRAHMAN BENEK

“...Ez Elîkê Betê, navê kalîkê min yê bi navû-deng li min kirine. Eşîra me Eşîra Hevêrkan e û ez li gundekî Qamişlo Gundê Girîkê Şamo li Sûriyê hatime dinê. Em Mala Osmên in. Bi efûya Menderes malbata me vegeriya Tirkîyê. Dîsa bi fermana Menderes di sala 1958an de em jî hemwelatîtiya Tirkîyê derxistin. Sed sal berê Mîdyat, Nisêbîn, Gercûş û Kerboran û Hezex di bin desthilatdariya kalîkê min Elîkê Betê de bû. Dewlet hate ser kalîkê min û piştî şerekî dijwar, kalîkê min Elîkê Betê hate kuştin. Neviyekî min heye navê wî jî Elîkê Betê ye...”

Eşîra Hevêrkan li Mîdyad, Nisêbîn, Gercûş, Kerboran û Hezexê belav bûye û eşîreke mezin e. Hin dîrokzan Eşîra Hevêrkan wek konfederasyonêkê bilêv dikin û bi vî eşîretê ve girêdayî navê 24 eşîra dijmêrin ku di nav van eşîran de eşîrên Êzdî û Xaçparêz jî hene.

Elîkê Betê piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi hestên neteweyî tevdiqere, gelek eşîrên derdora xwe li ser fikra azadiyê kom dike. Nisêbînê digire û deriyê girtîgeha Nisêbînê jî girtiyan re vedike. Bi taybetî li Mîdyadê û dîsa li Hezex, Nisêbîn, Kerboran û Gercûşê dixê bin desthilatdariya xwe. Di sala 1919an de hêzên dewletê bi hejmareke mezin tînin ser Elîkê Betê. Şerekî dijwar diqewime. Di dawiyê de bi alîkariya gelek eşîrên Kurdan serhildana Hevêrkan ya di serokatiya Elîkê Betê de tîk diçe û Elîkê Betê jî di 18ê Tebaxa 1919an de canê xwe dide.

Li ser Elîkê Betê pirtûk hatine nivîsandin û stran hatine gotin. Li jêr ev stranek e ku li ser Hevêrkan û Eliyê Betê hatiye gotin:

“Hey lê dayê hey lê dayê hey lê dayê.

Dilê min de wayê.

Ehmed Axa xwe berda bajarê Nisêbînê.

Cem Qaîmmeqamê Nisêbînê.

Gotê Qaîmmeqamê Nisêbînê dilê min de wayê sed cara min wayê.

Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco sultanê Hevêrka qaçax bû kete dunyayê.

Li piştî qaçaxbûna Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco debara min di cihê te da nayê.

Qaîmmeqamê Nisêbînê go Ehmed Axa tu rabe lez bike, bilezîne

Axawat û Muxtaran bîne mezbeta çêke îmza lê bixîne emê vê mezbetê deyne walî Begê bajarê Midyatê.

Belê waliyê bajarê Midyatê tîlefônê bidite bajarê Estembolê.

Belkî emê fermana Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco ji dergê Estembolê hilînin

Ehmed Axa lezê dikê dilezîne

Axa û Muxtara dicemînê û mezbeta çêdikê mora lê dixîne.

Dane walî Begê bajarê Midyatê, waliyê bajarê Midyatê tîlefôn dabû bajarê Estembolê fermana Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco ji dergê Estembolê li ba Sultanê Estembolê deranî.

Elîko lawo min digo memanî xweş memanî tiştê rebê alem li banê batî qelem li erdî Xwedê kes lê nezanî.

Li wê roja fermana Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco ji bajarê Estembolê deranî.

Hezar esker lawê dewletê bi topan û xîvet û çadira ve li dewra qesra Tînatê.

Li dora Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco girtine û derê topa dane qesra Tînatê.

Elîkê Betê digo gelî xulama lez bikin bilezînin hewara Şim'ûnê Henê Heydê kakê Melkê bavê kurê ji min ra bînin

Hewara Şemdînê Çolî ji min ra bînin

Îsayê Şeref ji min ra bînin.

Lo lo lo Elîko lo lawo qesra Tînatê wa bi hejîr e.

Bejn û bala Eliyê Betê bavê Ûsif û Nezîr fexê mala Haco

Sultanê Hevêrka Xelefê mala Osman Paşa, bejna şala û şapika ye

Rextan û zincîra Axa fermana hukmetê li malê li eşîrê giran e.

Jî xêra Xwedê ra ne fermana Hukmetê ba

Bila fermana sîhûsê (33) eşîrê Kurda ba,

Fermana eşîrê Kurda bê ra û bê tekbî ye.

Bi telaqê jinberdanê li piştî kozîk û çepera dê kêwa min lê digote

Gurmêna dihol û zirna daweta herdu Axayê min Ûsif û Nezîr e.

Eliyê Betê go lawo Şim'ûn û qesra Tînatê bi dar û bî ye.

Fîleho çavê te keta eskerê dewletê zirav te qetî ye.

Kerrbê li Şim'ûnê Henê Heydê da, go lo lawo Elîko qesra Tînatê bi simaq e.

Heçî kesê ji min û te ji talî ya şevê pêda destê xwe ne dê qevda xencerê hicrîmta bernede zabitê ser topê, jina xwe berdit bi sê telq e.

Û qesra Tînatê û dilê min bi xeber e.

Şadan û navmîşûdê Şim'ûnê Henê Heydê kakê Melkê gelek hene.

Dest da qevda xencerê hicrîm berda bû eskerê dewletê ji taliya şevê pêda zabitê ser topê kuşt û da ber xenceran e.

Dilê min li xeber e û şadan û navmîşûdê Mihemedê Êlo gelek hene.

Dest da qevda xencerê hicrîm berda bû eskerê dewletê ji taliya şevê pêda zabitê ser topê kuşt û da ber xencerane.

Şim'ûnê Henê Heydê bandikî lo lo Elîko lo lawo qesra Tînatê bilînd e wa li herem e.

Dengê top û topxana dewleta Turka li ser serê Eliyê Betê bavê Êsîf û Nezîr lêda leme lem e.

Axa roja koçka û dîwana tu li serê jorê rûniştî tu ji mala Osman Paşay tu Axayî û ez xulamê te me.

Belê roj qesra Tînatê ew gava xulîna topan û teyaran li şwînê bomba hîngê roja mirinê

Axa bi xwedê tu celebî û wê rojê ez ribadê te me."

Bi navê xwe yê fermî Alî Bate, ku Kurd di nav xwe de wî wek Elîkê Betê bilêv dikin, neviyê rehmetî Elîkê Betê ye. Li Sûriyê li gundekî Qamişlo hatiye dinê. Îro li Mîdyadê dijî û di derheqê eşîr û kalîkê xwe de xwedan gotin e:

"Eşîra me Hevêrka ye. Malbata me ji me re dibêjin Mala Osmên. Mala Osmên çar bav in: Haco, Betê, Çelebî û Serhed. Em zaroyên Osmên in. Ez li Sûriyê hatime dinyayê. Li Gundê Girîkê Şamo. Gundekî Fileha bû. Wexta ku dewleta Fransa erazî dane apê min Haco em çûne Gundê Dirêjkê, gundekî Tirbespiyê ye. Min li wira dest bi îbtîdayî dibêjin yanê îlkoqilê (dibistana sere-tayî) kir. Me zarokatiya xwe li wê derê derbas kir. Dûra em hatin gundê Durûja ku li hemberî wir, li Sûriyê erdên bi tapû yên kalîkê min mabûn, em hatine wira me pergala xwe ava kir. Dewleta Sûrî bela xwe li me xist. Digot we çima ev dera- na ava kirin, me got, ev e tapûyên me. Tapûyên me mêze kirin gotin tapûyên we Osmanî ne. Wê çaxê Dêrazorê wilayeta me bû, zemanê siltanan da. Gotin çênabe, wira bûne xezîne lazim e hûn bikin. Em rabûn me heta zêrên dê û xaltîka xwe firotin me ew gunda ji dewleta Sûriyê kirî. Piştra li Qamişlo em çûne mektebê. Heta orta- oqilê (dibistana navîn) me xwend..."

Elîkê Betê yê 85 salî, berî ku hûn nehatiye dinê, fermana eşîra wan Hevêrkan radibe û ji ber vê malbata wan diçine Binxetê. Li Tirkîyê rejim ji yek partîtiyê derbasî pir partîtiyê dibe û bilî CHP an Xelk Partî, Partiya Demokrat jî heye û dikeve hîlbijartinan û dibe desthilatdar. Di he- yama Demokrat Partiyê de ji bo gelek eşîr û mal- batên ku xwe spartibûn Sûriyê efû derket.


Elîkê Betê jî şahidê wan rojan e:

"Di wan salan de li Tirkîyê Demokrat Partî iqtidar bû û Serokwezîr Adnan Menderes efû derxist. Di 1950yî de me jî ji wê efüyê îstifade

kir û em hatin Tirkîyê. Bavê min em li mektebê derxistin û got, 'emê herine welatê xwe.' Ez û bavê xwe em li Nisêbînê man û birayê min hate Mîdyadê Doxaşehîrê. Doxaşehîr cihê ku koka me jê derketiye Mala Osmên. Mala Osmên kî ne? Em li Zaxuran hatine. Zaxuran 14 gundê wê ne. Pêşiyên me ji wir derketine. Piştî ku hatine vê- dera bûne mezinê eşîra xwe Hevêrka."

Malbata Elîkê Betê ji Sûriyê tê Tirkîyê û di sera heft sal derbas dibin. Ew êdî xortek e û hemwelatiyê Tirkîyê ye. Salên wî yên leşkeriyê tije dibin û wî dişînine leşkeriyê. Her çiqas bi efûya Partiya Demokrat hatibin jî, wana dengê xwe didin Partiya Xelk yanê CHPyê.

"Ez di sala 1956an de dergîstî bûm, bi xani- ma min Nerîman xanimê ra. Piştî em çar meha dergîstî man daweta me çêbû û ez zewicîm. Sala 1957an da jî ez çûme eskeriyê Manîsayê. Ecemî- tiya xwe min li wê derê derbas kir. Ez dewreqey- bî bûm. Hevalên min sê meha ecemîti dikir min şeş mehan kir. Min baş tehlîm dikir. Subayên min rabûn komek eskerên Kurd dane min. Wan Tirkî nizanibû û min ew bi Kurdî tehlîm dikirin. Subayan gotin 'sen ne biçim askersin, hangi dil- de öğretiyorsun?' (Tu leşkerekî çawa yî, tu bi çi zimanî wana perwerde dikî?) Min got, qomita- nim vana Tirkî nizanin ez jî bi Kurdî vana die- limînim. Subay got, bulîkê (bölük-liq) kom bike. Em kom bûn, got: 'Yên Kurd destê xwe rakin'. Li Bilîs û Wan û Diyarbekir û Mêrdînê Kurdên esker destê xwe rakirin. Subay got, bila Alî Bate îro şûnda egîtima (perwerde) we bike. Welhasil me eskerî dewam kir em birine atîşê (avêtin-he-



Ali Bate: Neviyê Elikê Batê

def girtin). Ez nişancıyekî (nişangir) baş bûm. Ku min çî diavêt min lê dixist. Onbaşiyekî got, 'ez bîm xweş nişanê megire'. Min got, çîma? Go, 'wê silehê giran bidine te'. Min got, bila. Min li hedefa giştika xist. Yuzbaşî (serpel) li paş min bû. Got, 'rabe kunya xwe bixwîne'. Ez rabûm min jêra kunya xwe xwend. Got, 'Mardînlî sen Arap mısın Kürd müsün?' (Tu Erebi an Kurdî?). Min got, ez Kurd im. Got, 'brawo tu nişancıyekî baş î, rind lê dixî'. Welhasil bona ku ez beş nişancı bûm ez dame Genel Kurmayê (Sererkanî). Li wira ez bûme muhafizê Reîsêcumhûr (Sero-komar). Resîêcumhûr jî Cevdet Sunay bû."

Di wan heft salên dawiyê de (1950-57) Adnan Menderes û Partiya wî Partiya Demokrat tena serê xwe û du cara li ser hev dibe desthilatdar. Menderes her diçe xurt dibe û êdî di wan salên dawiyê de ne Menderesê berê ye. Semsûrê (Adiyaman) jî Meletiyê vediqetîne, ji ber ku ji Înonu re zêde deng derketibûn. Bajarê Kirşehirê çîma ku deng neda Partiya Demokrat, tê cezakerin û Kirşehirê jî bajariyê dadixînin dikine navçe. Bi vî rengî gelek tişt dihatin kirin.

Ji Hemwelatîyê Dêrdixînin

Li Mîdyadê Eşîra Hevêrkan jî dengê xwe didin CHPyê. Li ser vê Demokrat Partî wana jî hemwelatîyê derdixîne. Dema jî hemwelatîyê tèn derxistin, Elikê Betê (Alî Bate) li Sererkana Tirkiyê leşkeriya xwe dike.

"1957an de ez çûme eskeriyê. Sal bû 1958 min nêrî rojekê gotin li nîzamiyê vaye zilamek



Elikê Batê

bangî te dike. Ez çûm min nihêrî ku bavê min e. Min got, xêre tu hatiye vê derê? Rahişte resmî xezetê (Rojnameya fermî) û da destê min. Got, 'ez hatime em li watandaxiyê (hemwelatîyê) îsqat kirine (derxistine). Ez çûme cem yuzbaşiyê xwe, min got, wele yuzbaşim em ji watandaxiyê derxistine. Got, 'olur mu boyle? (ma wiha dibe?)' û em birine cem qîşla albayî. Wî jî da pêş me em birine cem Genel Qurmay Başqani (Sererkan). Em çûne cem wî got, 'ew çî rewş e, mesele çî ye?' Me xezete da destê wî jî. Got, 'ez qebûl nakim'. Wê wextê wezîrê navxweyî Namik Gedik bû. Telefon jêra vekir. Ji emir subayê xwe ra got, 'vana bibe cem Namik Gedik ku derdê van çî ye bila hel bike.' Em çûn. Pêşiyê bînbaşî (serdar) kete hundir û dûra ez xwestim. Ez ketime hundir got, 'otur' (rûne). Min got, na ez li cem we rûnanim. Got, 'ez te re dibêjim rûne.' Ez rûnandim. Em rûniştin. Min got, mesele vaye, em ji watandaxiyê derxistine, îmza te bi xwe jî di vê qerarê de heye. Çimkî bakanlar kurulu (lijneya wezîran) qerar daye. Got, 'rast e, bi biryara lijneya wezîran hûn jî hemwelatîyê derxistine.' Min got, sebep çî ye? Got, 'ez te re eşkere bibêjim. Hûn li Mêrdînê eşîra we bi nufûs in, Eşîreke mezin e. 20 hezar reyên bi tesbît we dane Xelk Partî (CHP). Ji boyî wê hawî. Min jî got, wele hûn bi zorê me bişînine Sûriyê jî em bi zorê reyê (deng) xwe nadine

we. Em li Sûriyê, li ber zilmê me bazdaye. Em hatine huzûrê, demokrasîyê, rehetîyê. Ku hûn jî wisa bikin emê çi bikin. Ez zilamekî esker im. Ger ku heqê me hebe emê dewa xwe vekin.

Ez zivîrîm şûna xwe. Sererkan got, 'bavê te li vir e?' min got, belê. Wexta bavê min bigirin wê min bişînine Sûriyê. Got, odekê bidine vî û bavê vî. Ji min re got, 'tu jî kincê xwe yê sivil li xwe ke. Razên, bixwun, vexwun. Heta we îşê xwe hal kiriye' Xwarina me jî bi tabîldotê dihat. Welhasil êdî sibehê em çûn cem wekîlên (parlementer) xwe. Mihemed Alî Arîkan, Vahap Dizdaroğlu, Şevket Dursun ku ji Cizîrê bû, Kemal Aysan ji Mêrdînê bû, gelek bûn. Em rûniştin ku xeber bidin li salonê meclîsê me nihêrî carekê rehme li wî be Melîk Firat kete hundir, Demokrat Partî Erzîrûm mîlletwekîlî bû. Mihemed Alî Arîkan got, 'şêxim şêxim ez te bi yekî bidim naskirin. Bavê te jî dardakirin kalîkê wî jî kuştin. Hûn her du xizmê hev in.' Got, 'kî ye?' Got, 'Elîkê Betê.' Got, 'rast e, kalîkê wî jî kuştin.' Got, 'em wekîlê îqtidarê ne, em ne wekîlê muxalefetê ne. Mesele çi ye?' Me got, wele em ji hemwelatîtiya Tirkiyê derxistine. Got, 'Demokrat Partî li me, Xelk Partî jî we, herine cem Îsmet Paşa (Înönü).' Em rê kirin em çûne cem Îsmet Paşa. Wekîl jî me ra hatin. Gotin 'paşam ev Elî Betê ye û ev jî bavê wî ye. Ji bo ku reyê xwe dane Xelk Partî jî hemwelatîyê derxistine.' Got, 'mêraq neke, roja wan were ez ê wana hemûyan dardakim.' Got, 'bang li Urfa senatorû Atalay Akan û Erol Bîrek bikin.' Erol Bîrek huqûqnas û wekîlê Enqerê bû. Wana hatin got, 'dewa van tuyê bigirî, teqîp bikî.' Got, 'li Daniştayê dewê veke, mesrefê van jî ayda min.' Em rabûn derketin û çûne cihê xwe. Em man li wê derê. Em benda qerara wan man. Em li benda qerara başbaqan (serokwezîr) man. Başbaqan Menderes jî teyara wî ketiye. Baqan maqan gelek wekîl pêra hebûn ew tenê sax filîtî. Em benda wî man. Rehmetî Melîk Firat got, 'Ev qerara lijneya wezîran daye. Veger nabe. Ku Daniştayê qebûl bike, qerarê betal bike em li ser nasekinin,' Me li Daniştayê dewa (doz) vekir. Şerîf Atalay xelkê Mîdyadê hemşehriyê me bû, ew jî di Daniştayê da bû. Got, 'Em ê rêberîyê jî we ra bikin.'

Welhasil 17ê Gulanê me qerar stand, îptal bû qerara lijneya wezîran ya em ji hemwelatîyê derxistibûn. Deh rojan şûnda 27ê Gulanê (1960) jî derbe çêbû. Îsmet Paşa vêca bi tîlefônê li min geryiya. Wekîlê dewa me Mehmet Aslan tîlefona me dabûyê da. Got, 'hûn êdî serbest in. Were Enqerê.' Ez çûme Enqerê. Mihemed Alî Arîkan awûqat bû. Got, 'gilî bikin.' Yên em ji hemwelatîtiya Tirkiyê îşqad kirin yek jê Bahattîn Erdem bû, wekîlê Mêrdînê bû. Seyfî Guneştan Beledîya Başqaniyê (Şaredar) Mîdyadê bû. Me dîlekçe (daxwazname) da, ew girtin birin, ez jî şandime mal. Ez hatim rojekê qaymeqam bangî min kir got, 'emrê Wezîrê Karên Navxweyî ye lazim e tu bibî muxtar.' Muxtarê Doxaşehîrê. Ez kirime muxtar. Neh heyva ez mam, piştî neh heyva min got, karê min pir e ez nikarim muxtariyê bikim. Got, 'Yekî tayîn bike.' Min yek tayîn kir ku ez li muxtariyê filîtîm."

Biraziyê Haco û neviyê Elîkê Betê ku navê wî jî Elîkê Betê ye, di arşîwa wî de gelek wêne an fotoqraf hene. Yek bi yek û dûr û dirêj û bi hestên kûr li wêneyan dinêre. Di nav wêneyan de yê apê wî Haco jî heye. Yek jî wêneyê kalîka xwe. Dibêje "li cem me fotoqrafê kalîkê min yê Eliyê Betê tunebû. Ji arşîwa Îngilîzan derxistin û me ra şandin."

Wexta Îngilîz tînen Nîsêbinê û bona pira ku trêna dîke ji ser re derbas be çêdîkin, wê wextê wêneya Elîkê Betê dîkişînin. Dişa di nav wêneyan de wêneyên; Şibonê Henê, Haco, Mihemed Şerîfê Nehroz, Şemseddîn Ekingen, Hecî Seleheddîn Dogru, Mîthad Yenîgun, Fîkret Yenîgun, Şerîf Yenîgun jî hene.

Elîkê Betê bi keça Miradê Xelef re zewicî ye. Xanima wî Nerîman Bate ji mala Nehroz e. Ji Eşîra Şemîkî ne ku di nav eşîrên girêdayê Eşîrê Hevêrkan de ye. Ji Elîkê Betê û Nerîman xanimê şeş zarok çêdibin; sê kur û sê keç. Îro hinekên wan li derveyî welêt dijîn.

Neviyê Elîkê Betê qala kalîkê xwe Elîkê Betê dîke

"Kalîkê min ji xwe min nedît. Wexta ku kalîkê min hatiye kuştin ez hîn nehatime dinyayê."

Bavê min jî hîn nezewicîbû. Wexta ku apê min Haco ji vir reviya çû Sûriyê bavê min û du apê min hebûn. Ew jî bi apê xwe re çûn. Li wê derê ew man. Îjar kalikê min Elikê Betê min nedît lê hema tiştê ku ez zanim, şerê wî ji bo xatirê Haco apê xwe, bavê Haco, ew Haco ku li Sûriyê wefat kir, kurê ew Haco ku dewletê li çiyayê me girt û serî jêkiribû. Ew Haco şeş meheyî bû di zikê diya xwe da, ew Haco wilo bi navûdeng. Ew Haco mezin bû. Bavê kalikê min, sebaba mehkûmiyeta wî, sebaba ku deng pê ket, qesasê apê xweyê Haco kuşt. Cimo bû navê wî, ew kuşt. Wê wextê jî Haco gotibû Cimo min mekuje. Ku dewlet min bikuje em nikarin heyfa xwe rakin. Lê tu me bikujî wê întiqam ji te were standin. Gotiye, 'wele qomitan emir kiriye.' Ê dibê wele tu zanî. Elikê Betê vêga hingî meşhûr bû. Piştî ku qesasê apê xwe kuşt meşhûr bû. Mehkûm bû. Teslim nebû û lêxist çû hepsa Nisêbinê vekir. Çû nav Omeriya, bela xwe li Ehmedê Suleyman jî da. Li ser vê, hukumatê fermana wî rakir. Çû Xana Dorika. Çû li wira sekinî ji bo eşirtiyê. Kom birine ser apê me Ûsivê Haco. Ew jî çû hawara wî bona ku wî xelas bike. Li wira hate kuştin. Kalikê min, bapirê min pir umir nekir. 1882an da ji dayikê bûye. 1919 jî wefata wî ye. 37 sala umir kiriye. Hema di wê mudetê kin da deng pê ket. Ku çî dewê (doz) xwe yê bi xelkê ra hebûn bi destê xwe hel kirin. Ê malûme kes nikare bi dewletê."

Eşîra Hevêrkan sed sal berê li Mîdyad, Nisêbin, Kerboran, Hezex, Cizîr û Gercûşê, bi piranî li vê herêmê bûn. Îro Eşîra Hevêrkan û Mala Haco li gelek dewletan û bajaran belav bûne. Di nav sed salî de kesayetên malbatê dûrî hev ketin. Ew rihê eşiretiyê êdî ne wek berê ye.

"Ser wê qasê da em li Sûriyê bûn, jiyana me hebû, erdên me hebûn, em xwedan qedr û qiyamet bûn, bavê min got, 'ebeden ez li vê axê nasekinim, Erebi li me zilmê dikin emê biçin Tirkiya.' Em hatine Tirkiya û em li vê derê man. Bavê min jî 15 sal berê wefat kir. Apên min li Sûriyê wefat kirin. Mala apê min Haco temamê wan vêga li Swêdê û Almanya ne. Heta hinek zarokên wan xwendin çûne Emerîka, li wir jî hene. Xeynî eşîrê îro ku malbata me were cem hev, çar, pênc he-

zar însanên me hene. Yê Betê û Haco. Ku tu yê Osmên jî bihesibîni em bîst hezar hene. Çimkî Osman ev e: Bavê axelarê vê mintiqê yê Hevêrkan, pêşî yê ku umrê xwe yê mezin ew Haco ku kuştin, piştî wî Betê ye, piştî wî apê meyi Çelebî ye. Apê me yê Çelebî dewletê surgûn kir, li Entabê wefat kir. Vêga em tirba wî nas nakin. Ev mintiqa berpîrsyarê vira Mala Osmên bûn, bi eşirtî, Eşîra Hevêrkan. Îro eşîr bi xwe belkî bûye du sed hezar. Mala Osmên bûne belkî bîst hezar. Çimkî binêre Eşîra Hevêrkan kîjan in: Ji Îdilê (Hezex) dest pê dikin ev yek, Kerboran, Mîdyad, Gercûş, Nisêbin. Ev pênc navçe yê Hevêrkan in. Mezinê vê mintiqê Mala Osmên bûn. Yan Çelebî bû, yan Haco bû yan Elikê Betê bû, yan Serhan bû. Em tenê ne axa bûn. Mesela axayê Şemka hene, Nûriyê Ezîz. Nûrî Mîdyad bavê Zîver. Mihemed Şerîf Nehroz. Vana jî mezinê vê mintiqê bûn. Ê Suryanî ya, Brahîmê Şabo jêra digotin. Ew jî mezinê Suryaniyan bû. Mala Girîxo, wana jî mezinê Suryaniyan bûn. Dîsa ji mezinên Suryaniyan Gebroyê Îsayê Zetê, îro zarokên wan li Almanya dijîn. Şemhunê Heno, mala Hemê Heydo. Hevêrkan gelek in; Elika, Dêlmemîka, Torîka, Saliha, Domana, Dêra, Mûsayê Fatimê Hemayê Êlo, ev hemû bavên biçûk yê Eşîra Hevêrkan in. Li serê van Mala Osmên, ku te got, Mala Osmên Eşîra Hevêrkan tev ew in."

*"Ax delal wax delal lolo delalo
Elikê Betê ser me rakirî
Komekî komekî grano
Ser bejna mahkûmo lo maqûlo
Xwedî ka Sultan Elî Kalo,
Sofî İbrahîmê Gizarî gotî
Lolo cindiko, derdik û şevgerê şevê me
Qaçaxê dûra dinê me
Ez bavê Cîrê me
Xortekî Elika zinarekî hatime
Meran û mîrxasa me gişt aliya dikujin..."*

"Rejîma Esad digot çêrî Barzanî bikin"

Elikê Betê di nav bîranîn û zanebûna xwe de behsa rejîma Sûriyê jî dike. Tîne ziman ku, dema Esad bû îqtidar li Sûriyê, ji wezîran bigire heta wekîlên wan, bi xwe hildibijartin. Dengê

xelkê subayên Esad li ser navê wan diavêtine sindoqê. Sivîl, eskerî her tiştek ev bû, rejîma yekmirovî bû.

“Rejîma Sûriyê apên min Cemîl, Mecîd û Şeşan girtin birine Şamê. Neh meha hiştin, digotin, ‘xeberan (çêrî) Barzanî ra bidin.’ Gotin, ‘ma çima em xebera Barzanî ra bidin, em watandaşê te ne. Em eskeriya xwe dikin, wergiya (bace) xwe didin, çi eleqa me bi wan heye ku em qiseyên xirab ji wan ra bibêjin.’ Digotin, ‘na, wexta hûn çêrî wan nedîn hûn xayîn in.’ Çi bû? Ji ber vê mala apê min Haco hemû çûne Ewropa. Rabûn ji Girê Golan ev cihê ku Îsraîl dixwaze, ji Golan Ereb rakirin hanîn 245 hezar donim erdê me dane wan. Ew erdên ku Fransa malê xezîne bû ku li me belav kiribûn. Em Eşîra Hevêrkan nivî li vir man nivî çûne Sûriyê. Yên ku apê min Haco ra çûne Sûriyê li wir man, yê din jî man li Tirkîyê. Wê wextê apê min Haco erd li xelkê leva (parve) kir. Got, dewletê daye me. Wexta tapûyê bangî Haco kirin gotin were em li ser te tapû bikin. Eşîrê got, Haco tu wek bavê me yî, mezinê me yî ne hewceye em herin li ser xwe tapû bikin, hema tu tapûyê bigire ser xwe. Belkî em vegerine Tirkîyê lê tu nikarî vegeerî çimkî fermana te rabûye. Apê min Haco ser navê xwe çêkir. Dûra Haco wefat kir. Wexta wefat kir em û zarokên wî bi hev ketin. Tapû li ser wan bû ne li ser me bû. Qîma xwe neanîn. Gotên rabin. Bavê min got, emê hevdu biêşînin, emê hevdu bikujin, em naxwazin kuştin çêbibe, rabûn em hatine ew gundê li aliyê Sûriyê maye. Di sala 1950î da jî efû derket em hatine Tirkîyê.”

Cegerxwîn li ser Qebra Haco Axa

Li binxetê helbestvanê Kurd Cegerxwîn şahidê gelek bûyerên ku di serê Mala Haco de hatiye. Wexta apê Elîkê Betê Haco li Sûriyê wefat dike Cegerxwîn diçe ser gora wî. Li ser qebra wî telqîna wî tê xwendin. Piştî telqînê Cegerxwîn ku Elîkê Betê wek Mela Şêxmûsê Hesarî bilêv dike, dibêje “ey gelî millet, we telqîna Haco xwend bi Erebi, Ez ê jî bi Kurdî bixwînim.” Û Cegerxwîn wiha hestên xwe yê derheqê Haco de parve dike:

*“Ey Haco Axa xweş mêrê zana
Ne çaxê te bû tu çûyî gorê*

*Te em tev hiştin li ber zilm û zorê
Te darek danî ber gundê şîna
Em kurê te ne tev lê xwedî ne.”*

Elîkê Betê ji vê helbestê zêde dîke û dibêje: “Em kurê te ne bi wê darê xwedî ne. Me fehm kir ev dar kîjan e, Kurdistan e. Wiha got, Cegerxwîn: ‘Bela xwe ji hevdu vekin, Kurd bibine îtifaq, ji hevdu hez bikin, xirabiya hevdu nekin, dewlet jî wê we hez bike. Hûn bi xwe û xwe dijminê hev in. Hevdu dikujin, xerabiya hevdu dikin. Hûn nabine tiştek.’ Cegerxwîn got. Got:

*‘Hingî geriyam ez li dinê qet min nedît
Kes mislê me bê yar û bira, dost û xwedî
Xetek min nivîsî nema eyb û fedî
Ya Reb tu bo milletê Kurdên medenî
Ew Kurdên li ber şax û çiya deşt û newala
Çawa dikujin yar û bira dost û hevala
Her wext ez dikêşim derd û keder û mutela’*

Wiha got, Cegerxwîn. Kî wan dikujin, bi xwe û xwe dikujin.”

Ciwan Haco

Hunermendê, stranbêjê Kurd yê navdar Ciwan Haco ji Eşîra Hevêrkan û ji malbata Mala Haco ye. Di çar bavan de Ciwan Haco û Elîkê Betê xwe digihînine hevdu. Wana pisêpisan in. Nêzikatiya xwe ya bi Ciwan Haco re Elîkê Betê wiha vedibêje:

“Haco û Betê birayê hev in. Ez torinê Betê me, Betê bavê Elîkê Betê ye. Elî Betê bavê Ûsiv e. Ez kurê Ûsiv im. Ciwan Haco vêca kurê Brahîm e. Brahîm kurê Haco ye. Haco kurê Haco ye.”

Elîkê Betê yê 85 salî, di heyameke temenê xwe de diçe Swêdê û ligel Ciwan Haco rûdinin. Di derheqê wî de bîranîneke Elîkê Betê:

“Ciwan Haco demoqrat e, însanhez e, ji xelkê hez dîke, xelk jê hez dîke. Jê re gotine, tu torinê Haco yî. Tu neviyê zilamekî meşhûr î. Ev saz û stran ne karê te ye, karê mitriba ye. Ciwan Haco gotiye; Ez ne mitribê bavê kesî me, ez mitribê gelê xwe me.”

Nevî Elîkê Betê îro 85 salî ye û li Mîdyadê dijî. ❦

Dil û Xwez

TALAT İNANÇ

Telpek ewrê sîmîn spî
 ji qêleqija roja havînê
 sîbera xwe ya peltenik
 bi ser min û benderê de berdaye,
 -pa bender e, qewş û qesel, ga û gêre,
 bîn li min çikîbû-
 ewr û sí, bi mecala min gihî,
 xwêdan ji enya min ferikî çû,
 sîwana asîmanî
 perr û perwazê ji hevrazê dilê min.

Qevdek pîvazterk,
 zîla ji ax û avê,
 birqa şev û tavê,
 pel pel gil û giya,
 avî lê xunivî,
 kivar û kereng û karî,
 ribêsa çiya,
 ekl û elesa biharê
 li canê min bişivî
 gurz û gewlazê dilê min.

Cehniya berzîn,
 çelenga şipl û şepal,
 enîbeş, sê kapikên wê çal,
 lezgîn, kumeyta seklawî,
 kihêla xar û tiradan,
 tola reqş û dîlanê,
 rewana kaw û kubar,
 bisk û bijî li gerdenê xeml û xal,
 li çerx û çiv û bez û ferqazê
 mihr û mirazê dilê min.

Gundewarî, nexçera rengîn,
 av û kanî, darên benav û biyan,
 rez û baxçe, nexşên subhanî,
 beyabanên kulilkîn,
 zad û zevî, ebrên geniman,
 rast û mesîl û mexer
 ber û bergen yekker geş xemilîn,
 dêliyên engûrîn, dehlên hilûtirşkan tarî xumirîn,
 bîna şimamokan, hinar û biyokan,
 pel û pûş û pûng, mêrg û çêre,
 keriyên berx û miyan, beng û jiyar
 xurmexurm herikîn,
 qaz û quling, kew û kund, çûkên wîtwitan
 qîreqîr û qeweqew û wîçewîça wan
 tar û tembûr û sazê dilê min.
 Ez, xortê bedew ê tital ê stêle:
 ew, keçika rindik a gulang û kezî xingalekî:
 me dilek divê, dilekî ji du felqên kakilekî
 da ku cotikê me di xwe de rapêçe
 o maleke bi derçik û derî, du sê ode w du sê pace,
 çendek jî fel û fol, pot û pertal,
 deng û bengeke bi sê çarek sêwlek û mindal,
 berûberê dan û demên di babezka çerxa dinê de
 heytehol û hêwirze, xilbexilba ji hewma neviyan,
 me xêr û bêr û mal û hal hemî ev rewac e,
 bereketa Xwedê jî li serê
 temenekî bextewer ê du kokimên hilêle,
 nig li hafa kûregoncala vê dinyaderewîna betal,
 de îca tu here ji xwe re lê razê, dilê min.

Lo li min û li vî dilî,
 nizam çima her tiştî welê bi kel û pel
 mikemel dixwaze?...

Pîvaz

SHAHÎN BEKÎR SOREKLÎ

Etarê bi navê Apê Xemo dihat nasîn kêfxweş bû. Pîvazên wî îroj ji yên berê çêtir bûn, wî ew li ser hesîreyê kom kiribûn û bang dikir:

Werin pîvazan, werin;

Pîvazên min yekser in;

Xweşik in wek cewher in.

Daniştvanên taxê hemiyar Apê Xemo dinasîn. Ne tenê dinasîn, lê her weha derbarê pîvazên wî de dipeyvîn. Her roj gotinên corbîcor derbarê wî û pîvazên wî de dihatin kirin, wek:

"Pîvazên apê Xemo îro biçûk bûn/ Apê Xemo îro pîvazên xweş dif'rotin/ Pîvazên apê Xemo duhinî ne çî pîvaz bûn/ Lawo, her pîvazêke apê Xemo îro wek zebeşekî bû/ Pîvazên apê Xemo êdî buha dibîne/ Bi xwedê ji pîvazên apê Xemo çêtir tunen/ Pîvazên apê Xemo zû sasi nabin/ apê Xemo pîvazan bi deyn naf'roşe/ Lo, zû here ji apê Xemo çend pîvazan bikire,..."

Di êvara rojêke bi baran de etêr çend pîvazên spî yên mezin xistin nav tûrekî naylon û çû serilêdana dostekî ku wî ji mêj ve nedîtibû; navê wî Yaro bû.

Mazûvan bi hatina dostê xwe gellekî dilşad bû, jê re ji bo hanîna wan pîvazên xweşik spas kir û ji jîna xwe xwazt ku ji wan re misînek çayê bide ser.

Her du dostan li halên hev pirsîn û axaftina wan weha domand:

-Navbera te û pîvazan çawa ye, kekê Xemo?

-Bi xwedê, gellekî baş e. Pîvazên îsal ji yên sala par mezintir, xweştir û arzantir in. Muşteriyên min gellekî ji min û pîvazên min razî ne. Berê piçek serêşî bi hinekan re hebû ji ber ku min pîvaz bi deyn dif'rotin wan, lê ez nema bi deyn dif'roşim û her kes êdî vê yekê dizane. Eger pereyên kesekî hindik bin ew li şûna du kilo pîvaz tenê 2-3 pîvazan dikire ta ku pereyên wî tere kirîna du kiloyan yan zêdetir dîkin.

-Tu tenê pîvazên spî dif'roşî?

-Na, na, ez nuha wek pîvazfiroş li seranserê taxa xwe dihêmin nasîn. Ya rast, hinek muşteriyên min ji taxên din jî hene. Ez nuha êdî pîvazên spî, yên sor, yên şîn, yên biçûk, yên mezin û yên di navberê de dif'roşim. Projeyêke mine din heye; eger Xwedê bibêje erê, ez ê zivistanê pîvazên brajtî jî bif'roşim.

-Wah! Pîvazên birajtî? Tu dê wan çawa bib'rêjî?

-Ez ê wan li ser komirê yan di nav agirê êzingan de bib'rêjim. Xelk ji pîvazan hej dike. Hem xweş in, hem ji bo saxlemiyê baş in û hem jî arzan in.

-Tu pîvazên xwe bêguman dikirî, ne?

-Erê bi Xwedê, ez dikirim û dif'roşim.

-Kekê Xemo, tevdêreke min jî heye, ez ê bi te bişêwirim.

-Fermo, ser seran.

-Ji erdên bavê min ji min re jî hêktarek li gund maye. Tu çi dibêji, heke ez pîvazan biçînim û tu jî bif'roşî. Em dikarin vî karî bi hev re bi rê xî û bibin hevpar. Tu çi dibêji?

-Kekê Yaro, ma ez qemîşe te dibim ku te têxim ber çandiniya pîvazan?

-Wah! Çi re? Ma ez ji te çêtir im?

-Na, mesele ne ew e. Tu nivîskar î, şanogir î.

-Kuro, dest jê berde. Çi nivîskar û çi şanogir! Li vî warî yên serkeftî pîvazfiroş in. Ma malek heye ku bi kêmasî rojê carê derbarê pîvazê de neaxife? Tu dostê min î û ez bawer nakim tu navê pirtûkeke min bizanibî. Min bibexşin, ez vê gotinê wek serhevde bi kar nahînim; tenê bo nimûne dibêjime. Pirraniya danîştvanên vî warî pîvazekê bi pirtûkekê nadin. Wek nivîskar, hunermend û şanogir nikarime zaroyên xwe têr nan û pîvaz bikim, kekê hêja.

-Kekê Yaro, va çend sal in tu wek rolgir di Mala Şano de di kar de yî. Tu dê çawa dest ji wî karî berdî?

-Min dest jê berdaye, wey! Min sond xwar ku ez ê nema lê vegerim.

-Wî! Çima? Çi bû?

-Keko, Ma ne wa ye ji te re dibêjime! Va bûn heft sal ez wek rolgir û nivîskar ji bo xwediyê Mala Şano, Mamoste Seyda, kar dikime, ez û çend hevalên din. Rojekê ji me yekî re jî negotiye "Xwedê ji te razî be." Ger yek ji me bimire jî ne ew, ne jî yên dihên Mala Şano, dê xemê bikişînin. Dizanî nuha çi dike?

-Mamoste Seyda?

-Erê.

-Çi dike?

-Navên çend kesên tên Mala Şano hem li ser textikekî dinivîsîne û hem jî roja din ji wan re yeko yeko karteke spasdariyê dişîne.

-Êh, ma ne baş e! Xelkê me ji tiştên weha hej dike. Welleh Mamoste Seyda zîrek e. Heye ku bi encama vê yekê muşteriyên Mala Şano zêde bibin.

-Lê rojekê ji rojan navê yekî ji nivîskaran, hunermendan û rolgiran, ne li ser textikê xwe nivîsandiye, ne jî haniye ser zimanê xwe.

-Neheqî ye.

-Ne tenê neheqî ye; nerxnedan e, xwedilêderneketin e, îhanetkirina berhemê ye ...

-Kekê Yaro. Xwe meêşîne. Bawer nakim kesek li vê derê ji şano-manoyan tiştêkî fêhm bike. Tiştên weha bo me nû ne. Tu guh bide brayê xwe Xemo; ez ê ji te re Lûlo bi kirê bigirim, hema du-sê rojan...

-Lûlo kî ye? Bo çi?

-Lûlo delalekî jêhatî ye. Emê wî du-sê rojan berdin nav kolanên bajêr û bila hunera xwe bi kar bihîne, bi dengê xwe yê zenglîn pesna te bide û navê te bike al û rake.

-Ne te ez şaş fêhm kirim, kekê hêja. Heft na'le li wî navî! Ez li navê derketî poşman im. Di warekî ku tê de ne berhem, lê gewende û delal navan dikin al de, derketina navê min ji derneketina wî xirabtir e. Ez li derketina nav nagerime; tenê li dayîna nerxê ji bo berhem û rola bedew digerrime, ew jî ne nerxekî aborî, lê bêtir nerxekî wek liberçavgirtinê, xwepêvemijûlkinê.

-Tu brayê xwe bibexşin, lê bi Xwedê têgihîştina van gotinên te bo min ne hêsan e. Kekê hêje, çanda vî warî çanda pîvazan e, çanda gewende û delalan e. Tu jî ji min re gotina "xwepêvemijûlkinê" û nizanîm çi dikiye. Wek dibîni, tu hosteyê lihevsiwarkirina peyvan î. De tu'ê çawa pîvazan biçîni?

-Bi Xwedê, dosto, ez ê ji heq derkevim. Tenê fersendê bide min, hema salekê. Baş e, ger naxwazî em bi hev re bibin xwediyê projeyê, ez ê bi serê xwe pîvazan biçînim. Tenê soz bide ku tu'ê wan ji min bikirî.

-Xwedê kerîm e. Hele berê biçîne û bila pîvazên te bigihên, emê wê demê bi hev re biaxifin.

Dema her du dostan xatir ji hev xwaztin Yaro pirtûkek da mazûvanê xwe. Xemo wêneya dostê xwe ya li ser qaba dawîn di şevreşiyê de nedît, jê pirsî: *Ev çi ye?*

Yaro destekî xwe li piştê dostê xwe xist û hema di cih de ev bersîva da: *Dunya hatiye guhertin brayê Xemo. Dema kesekî tenê 2-3 pîvaz ji te kirin, wan hema weha tazî mede dest wan. Rûpelekê ji vê pirtûkê biçirrine û pîvazan têxe nav wê.* ✨

Parçeyekî dî ji Dîwana Windayî: Şi'rek nû ji Melayê Bateyî

M. XALID SADÎNÎ

Xweşbextane ye ku her roj ez dibihim, dixwînim yan jî ez bixwe dibînim ku parçeyekî din ji helbest û Dîwanên talanbûyî ya Kurdî peyda dibe. Ev helbesta hanê jî ya Seydayê Mela Huseynê Bateyî ye. Ku ev helbesta me ji destxetê kevin ku li Kutubxaneya Meclisa Millî ya Îranê bû, peyda kir.

Di wê destxetê de, Danberheva Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî, Şêx Sen'an, Ey av û ava Feqiyê Teyran, helbesteke Mustefa Xan Begê (Pertew Begê Hekkarî) jî hebûn. Destxet hemî 144 rûpel e...

Ez ji dil û can bo dostên me yên hêja Cuma Me'rûfî û Seyyid Îslamê Duago spas dikim ku eve destxeta pîr hêja û binirx gehandine me. Hem ev helbesta gelek delal hebû hem jî ji bo danberhevan, hinek helbestên din jî hene.

Helbet em dê vê helbesta Bateyî jî tehlîl û şirove bikin. Lewra hin îşaretên girîng tê de hene. Wekî dibêje; "Hat û tîr havête min teşbîhê tîra Xan Şeref" Vêca ev Xan Şerefa Mîrê Hekkaryan Şerefxan e yan jî Xan Şerefê Mîrê Cizîrê ye, ez nizanim ka qesda Bateyî kîjan e. Di her halekê de, aşkera dibe ku, Melayê Bateyî piştî salên 1600î yên zayînî jiyaye. Lewra Şerefxan jî Xan Şeref jî piştî vê sedsalê jiyayî ne. Lê ez dê vê dabaşê bihêlim bo lêzêdekirina kitêba Melayê Bateyî.

Û ez bi dilxweşî vê helbestê pêşkêşî xwendevanên Nûbihara rengîn dikim ku ez dizanim piraniya wan jî wekî min cergsotiyên peydakirina parçeyên weha ne ji edebiyata berzebûyî...

Hûn li min hişyar bin

Hûn li min hişyar(i) bin îro gelî yarê di min
Sergiran hatine cenga şah(i) xundkarê di min
Car xwiya û car veşarî subh û êvarê di min
Merheba hatî xwudana her du şehmarê di min
Bêy li ser çavê di min tuy bar û serbarê di min

Perdeya dêmê hilanî nazika gerdensedef
Beyreq û ala û senceq bûne seywan sef bi sef
Zahirî qatil ew e le'î û lebeş dermanê xef
Hat û tîr havête min teşbîhê tîra Xan Şeref
Xwud dewabexş(i) 'ezîzem tu wî keskarê di min





Nergîs û reyhan û çiçek cumle pêşkêşê di min
Ta ebed ew zulf û xal in hakimêd rûha me bin
Muhebbet û derdê evîn'ya te li min her zêde bin
Şerh û tomarê'd xemem sêsed muderris ger hebin
Kes neşetîn întiha ket şerhê tomarê di min

Xwez'ya vê koçk û serayê 'eyş û noşa bade lê
Ta seher coş û seda jê çûne burca Hemelê
Min diya ez pê bizanim lezzeta vê menzilê
Cotekî Bazî û Bestî şah û seyyadan welê
Seyd û kebkê dil xiyal e baz û bazdarê di min

Tîrbaranê fuxanem semtê her heft asiman
'Aqîbet qet rû neda min bext(i)zalim el-eman
Namiradê da me qismet çerx her murwet bizan
Min di i'şqê da sefer kir pêlekî lew nagehan
Çûn bi çaha hîretê da koc û kocbarê di min

Sal û mah û heftiyan ba zulfekê dilbend im ez
Gulşena gul tê ez im îro 'eceb gulxend im ez
Ba xiyalê rûyê dilber qanî'ê xwursend im ez
Gerçî zahir ez kesad im şahê dewletmend im ez
Vê di qesra ba xiyalê durr û mirwarê di min

Ba segê dergahê yarim dê bikim ez ulfetê
Ta ebed 'umrê me bitin dê bikem her xizmetê
Çaverê dîdarê yar im hîvîdarê rehmê
Batewo, jar û feqîro, sot bi narê firqetê
Çav tijî rohnîk jî bo min yar û xemxwarê di min.



Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî

-Ji aliyê Tema, Ziman, Teşe
û Hunerên Edebî ve-

AHMET SEYARI

Kurte
Mersiye ji wan helbestên ku li ser mirina kesekî hatine nivîsîn re tê gotin. Di mersiyeyan de helbestvan êş û xemgîniya xwe ya ji bo mirovê mirî vedibêje û taybetiyên wî yên baş ên wekî lehengî, wêrekî, zanîn û şarezaiyê tîne ziman.

Di edebiyata Kurdî de gelek kesan mersiye nivîsîne. Yek ji van kesên ku di nav helbestên xwe de cih daye mersiyeyan Mela Eliyê Baqustanî ye. Mijara vê xebatê jî nîrxandina mersiyeyên Baqustanî ye. Xebat li ser heft mersiyeyên Baqustanî yên ku di dîwançeya wî de derbas dibin hatiye kirin. Di vê xebatê de mersiyeyên Baqustanî ji aliyê naverok, bikaranîna hunerên edebî, ziman û teşeyê ve hatine nîrxandin. Mijarên ku di naveroka dîwançeya wî de derketine pêş hatine destnîşankirin û navên kesayetên ku mersiye li ser mirina wan hatine nivîsîn hatine dayîn. Hunerên edebî ku di mersiyeyên de derbas dibin bi mînakên hatine nivîsîn.

Herwiha taybetiya zimanê mersiyeyan bandora zimanên din ya li ser wan hatiye vegotin. Ji aliyê teşeyê ve jî derbarê kêş û serwaya mersiyeyan û cûreya wan de agahî hatine dayîn.

Peyvên Sereke: Mela Eliyê Baqustanî, mersiye, tema, ziman, ruxsar, hunerên edebî

1. Destpêk:

1.1. Jiyana Mela Eliyê Baqustanî

Mela Eliyê Baqustanî, di sala 1917an de li gundê Tizyan ku li ser Stewra Mêrdîn ye hatiye dinê. Navê bavê wî Mihemed û navê diya wî Edlê ye. Bavê wî Mela Mihemed melê gund bû. Mela Mihemed, ji xeynî Tizyan li Baqustan û li Ewîna jî melatî kiriye. Bi eslê xwe ji Zivinga Hecî Elya ye, ku niha ev gund li ser navçeya Sêrtê, Dihê/Erûhê ye. Bavê wî Mela Mihemed dema ku diçe hecê li wir wefat dîke. Li texma Wadî Fatma medfûn e. Piştî wefata bavê wî, malbat ji gundê Ewîna dûsa vedigere Tizyan.



Ciwaniya Mela Eliyê Baqustani

Mela 'Elî, xwendina xwe ya sereke li ba bavê xwe dixwîne. Paşê diçe Ewîna û xwendina xwe li ba Mela Evdilezîz didomîne. Paşê diçe gundê Qerepêçê li ba Mela Evdilwehabê Xirbê Hecî xwendina xwe didomîne. Piştî ku Mela Evdilwehab ji vî gundî bar dike, ew di şûna wî de melatiya vî gundî dike. Paşê tê Baqustan û li vir dest bi melatiyê dike. Di salên nodî de, gund tê şewitandin û Seyda ji Baqustanê bar dike û li Amedê bi cî dibe. Nêzîkî wefata xwe, dîsa diçe gundê xwe û di sala 2002an de li gundê xwe wefat dike.¹ Tirba wî jî li Baqustanê ye. Dema ku li Baqustanê melatî dikir, sê salan bi çûn û hatinê, li ba Mela Ebdullahê Sergelya, li Ewîna xwendina xwe temam dike û ji Mela Ebdullahê Sergelya îcazetê distîne. Mela Elî, li gundê xwe, bi dehan feqî û mela perwerde kirine.²

1.2. Berhemên Wî

Berhemên wî yên Kurdî:

-**Siltan Şêxmûs** (Ji du beşan pêk tê beşa yekem Erebi û beşa duyem Kurdî ye.)

-**Mewlûda Nebî** (Behsa jidayikbûna Pêxember dike.)

-Dîwançe

Dîwançeya Mela Elî ji 27 helbestan pêk tê. Ji van helbestên wî 3 bi Erebi û 24 jî bi Kurdî ne.

Helbestên Mela Elî bi kêşeya erûzê û li gor rê û rêbazên edebiyata klasîk hatine nivîsîn. Hinek ji van helbestên Baqustanî di keşkuleke destxet a ku di navbera salên 1950-1994an de hatiye nivîsîn de gihaye roja me û helbestên din jî ji aliyê M. Ertekin ve hatine berhevkirin û çapkirin.³ Helbestên Baqustanî bi teşeyên, qesîde, mesnewî, murebbe û muxemmes hatine nivîsîn û di van helbestan de mijarên wekî eşqa Xwedayî, bîr û baweriyên tesewifê, şîn, şîret, pesin û hîcw derdikevin pêş.

Berhemên wî yên Erebi:

-**Jiyana Pêxember** (Bi tevahî ji 18 rûpelan pêk tê. Behsa jiyana, sifet û exlaq û wîladeta Pêxember dike.)

-**Tefsîr:** (120 rûpel e. Teman nebûye.)

-**Tesewif** (95 rûpel e. Di sala 1971ê de hatiye nivîsandin.)

-**El-Fesîha** (Derbarê tesewifê de ye. Nezm û nesr tevlihev e.)


-**Fetewa** (214 rûpel e. Fetwayên ji mijarên cuda yên dînî tê de hene.)

-**Kitêba Duayê** (80 rûpel e. Tê de dua hene.)


-**Şerha Terkîb-i Bend û terciî Bend a Ziya Paşa** (33 rûpel e. Şerha helbestên Ziya Paşa ye.)⁴

2. Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî ji Hêla Naverokê ve

Di dîwançeya Mela Eliyê Baqustanî de heft mersiyê hene. Navên mersiyeyên wî wiha ne: *Gelo Çawa, Ji Firqa Murşidê Kamil, Ey Felek, Ah û Efxan, Vê Firqetê, Ser Hilîne Qutbê Kamil, Îro ji Seydayê Helîm.*



Mela Eliyê Baqustani



Mela Elî yek ji van mersiyeyan li ser kurê xwe yê bi navê Wehîd, yek li ser mirina Şêx Seydayê Cizîrî û her çarên din li ser mirina Şêxê xwe yê bi navê Şêx Seyfuddîn nivîsîne. Di van mersiyeyan de Mela Elî pesnê kesê ku mersiye li serê hatiye nivîsîn daye, kerb û keserên xwe yên ji bo mirina wan aniye ziman û carinan jî ji bo wan dia kirine û ji bo wan ji kesên din dia xwestine. Di hinek mersiyeyan de derbarê tarîxa mirina kesê ku mersiye li serê nivîsiye de agahî dane.

Di van malikên mersiyeya xwe ya bi navê *Ji Firqa Murşîdê Kamil* de pesnê şêxê xwe wiha dide:

*Tu şeyxan ez qet nabînim bi mislê te Seyfuddîn
Çiqas geryam li dunyayê weger hê ez bi geryan im.⁵*

Mela Elî di mersiyeya xwe ya bi navê *Gelo Cawa* de tarîxa mirina kurê xwe Wehîd daye:

*Ew di neh sed û not û hem di pêncê mîladê da
Hem jî sêşenbê ji roja diduwê gulanê da
Ew di nava 'aile û di qezae mala xwe da
Kirye teslîm wî emanet rûhê şîrîn bo Xweda
Rûhê wî jî çû semawata meqamê aminîn.⁶*

Baqustanî di mersiyeya xwe ya bi navê *Ey Felek* de jî tarîxa wefata şêxê xwe bi hesabê ebcedê wiha daye:

*Tarîxa dîlber tê xef bû sanî teşrîn yewm ebed bû
Xey û şîn û hê 'eyn bû ev yeqîn agahê me.⁷*

Di van malikan de çar tîpên Erebi ku dane tarîxa wefata Şêx Seyfuddîn nîşan didin. "Li gorî hesabê ebcedê tîpa xeyn: 1000, tîpa şîn: 300, hê: 8 û 'eyn: 70 ye. Dema ku meriv wan bi hev re dihesibîne dîroka wefata wî, derdikeve pêşberî me."⁸

Di dawiya mersiyeya Baqustanî ya bi navê *Ji Firqa Murşîdê Kamil* de navê wî derbas dibe:

*'Elî derdê xwe bes bêje xem û tehlî xelas nabin
Tu hemd bike li vî halî di wecdê bila qal im.⁹*

3. Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî ji Hêla Hunerên Edebî ve

Di Mersiyeyên Mela Elî de hin hunerên edebî hatine bikaranîn. Hunerên wekî nîda, şibandin, mubalexe, teşxîs, îltîfat û telmîhê di mersiyeyên wî de dedikevin pêşberî me.

Mela Elî di beyteke mersiyeya xwe ya bi navê *Ah û Fîxan* de tîne ziman ku piştî mirina Şêxê xwe wisa ketiye dehşetekê ku xwe şibandiye kesên ku mey vexwarine:

*Mame -medhûş û muheyyer her wekî meyxwarîyan
Qelbê mehzûn û mecrûh ku tê da kederek.¹⁰*

Di mersiyeyeke xwe ya din de jî ji ber êş û kendera ku ji bo mirina şêxê xwe kişandiye cegera xwe şibandiye xiyarekî ku bi kêrê bê qetkîrin:

*Eywan dîwan û dîyar, kir ker cîger mislî xiyar
Lew tîn ji min firyad û zar, mecrûh dibe me'lûl
bi dil.¹¹*

Di sa di beyteke xwe ya din de ku di mersiyeya wî ya bi navê *Ey Felek* de derbas dibe, firqeta ji Şêxê xwe şibandiye ketina nava behreke kûr û bi vî awayî di vir de hunera mibalexeyê bi kar aniye:

*Firqeta dîlber çî zor e behrekî agir û kûr e
Qe'rekî gelekî dûr e lew diçe pêti ji min.¹²*

Wekî din jî Mela Elî di mersiyeyên xwe de gelek caran mibalexe bi kar aniye:

*Ji firqa murşîdê kamil gelek serxoş û sukran im
Ji hicra serwerê ekber dused cerhan birîndar im.*

Di van malikan de Mela Elî dibêje ku ez bi du sed birînan birîndar im û bi vî awayî hunera mi-balexeyê bi kar tîne.

Di mersiyeyên Mela Elî de hunera nîdayê ji gelek caran derdikeve pêş:

*Ey felek dîsa xef kir dilbera çav reş ji min
Ah û hesret hîsab kir kerb û efxanê di min.*¹³

Mela Elî di mersiyeyên xwe de hunera teşxîsê jî bi kar anîye. Di beyteke xwe de hesretkêşan ku karekî aîdê mirovan e ji bo qelb û dil bi kar anîye:

*Eywan dîwana Hezan, heyfa min tê daîm li wan
Sorgul ji wan bûye rewan, hesret dikêşit qelb
û dil.*¹⁴

4. Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî ji Hêla Zîman ve

Zîmanê ku Mela Elî di mersiyeyên xwe de bi kar anîye li gor gelek berhemên klasîk sade ye û baş tê fêmkirin. Digel vê Mela di mersiyeyên xwe de hin peyvên biyanî yên Erebi, Farisî û Tirkî bi kar anîne.

Gelek peyvên Tirkî ên wekî qarşî, duacî, qapat, qurmiş di mersiyeyên wî de derbas dibin. Lê di mersiyeya wî ya bi navê *Îro Ji Seydayê Helîm* de beyteke wî bi temamî bi Tirkî hatiye nivîsîn:

*Ne yaziqtir seyda gîbî, yaşamamış bir ademi
Huzunda kalmış her alemî qena'at verir mî
şanlı dîl.*¹⁵

Ji xeynî peyvên Erebi ku di mersiyeyên Mela Elî de gelek derbas dibin, di mersiyeyeke wî ya bi navê *Ser Hilîne Qutbê Kamil* de ku bi cûreya muxemmesê hatiye nivîsîn de benda pêşî hemû bi zîmanê Erebi ye.¹⁶

5. Mersiyeyên Mela Eliyê Baqustanî ji Hêla Teşeyê ve

Di dîwançeya Baqustanî de heft mersiye hene. Mersiyeyên Mela Elî bi gelemperî bi cûreya nezma qesîdeyê hatine nivîsîn û qesîdeyên wî di navbera 15-25 bendan de ne. Lê ji xeynî qesîdeyan du mersiyeyên wî muxemmes in û yek ji 11, a din ji 9 bendan pêk tê.

Mela Elî helbestên xwe bi terz û kêşeya klasîk nivîsîne û kêşeya helbestên wî bi erûzê ye. Di mersiyeyên xwe de kêşeyên cuda bi kar anîne. Herwiha Mela Elî di mersiyeyên xwe de gelek cûreyên serwa û paşserwayê bi kar anîne. Teşeya mersiyeyên wî bi vî awayî ye:

-Gelo Çawa

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê muxemmes¹⁷ e, ji 9 bendan pêk hatiye û kêşeya wê “fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun” e.

-Ji Firqa Mursîdê Kamil

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê qesîde ye, ji 15 malikan pêk tê û kêşeya wê “mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun mefa’îlun” e.

-Ey Felek

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê qesîde ye, ji 25 malikan pêk tê û kêşeya wê “fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun” e.

-Ah û Efxan

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê qesîde ye, ji 15 malikan pêk tê û kêşeya wê “fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun” e.

-Vê Firqetê Xem Pur Kirin

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê qesîde ye, ji 19 malikan pêk tê û kêşeya wê “fe’ûlun mustef’îlun fe’ûlun” e.

-Ser Hilîne Qutbê Kamil

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê muxemmes e, ji 11 bendan pêk tê û kêşeya wê “fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun” e.

-Îro ji Seydayê Helîm

Teşeya vê mersiyeyê ya nezmê qesîde ye, ji 16 malikan pêk tê û kêşeya wê “mustef’îlun mustef’îlun mustef’îlun mustef’îlun” e.¹⁸

Di van malikên mersiyeya Mela Elî de wekî em dibînin, serwa bi qertafa “-an”ê û paşserwa jî bi “im”ê pêk hatiye:

*Li banê birc û eywanê ku dîlber ma di puşt perdê
Hîcab û perde û setra dibînim hêj bi heyran im.*

*Di wextê tême dîwanê te nebînim eya murşîd
Dikêşim cureya hicrê ji huznê lew bi giryar im*¹⁹

ENCAM

Di dîwançeya Mela Elî de bi tevahî 27 helbest hene; 24 çar ji wan Kurdî 3 jî Erebi ne. Ji van 7 ji van helbestan mersiye ne. Mersiyyên Mela Elîyê Baqustanî li ser mirina sê kesan hatine nivîsîn. Yek jê şêxê wî yê bi navê Şêx Seyfuddîn, yê din Şêx Seydayê Cizîrî û yê din jî kurê wî yê bi navê Wehîd e. Mirina Şêx Seyfuddîn tesîreke mezin li Baqustanî kiriye û ev tesîr di mersiyyên wî de xwe dide der. Wekî din di mersiyyên Mela Elî de mijarên wekî xemgînî, pesn û dia derdikevin pêş. Mela Elî di mersiyyên xwe de hem wekî tarîx û hem jî bi hesabê ebcedê derbarê mirina kesê ku mersiye li ser wan nivîsiye de agahiyê dide.


Herwiha em dibînin ku di mersiyyên Mela Elî de hunerên edebî yên wekî şibandin, mibalexe, nîda û teşxîsê derdikevin pêş. Baqustanî di mersiyyên xwe de peyvên Farisî, Erebi û Tirkî bi kar anîne. Heta di hin mersiyyên wî de hinek beyt û bend bi temamî bi Tirkî yan jî Erebi hatine nivîsîn. Mersiyyên Baqustanî bi kêşeya erûzê û bi serwa û paşerwayê û li gor rê û rêbazên din ên edebiyata klasîk hatine nivîsîn. Ji her heft mersiyyên wî 2 bi teşeya nezmê ya muxemmesê û 5 jî bi teşeya qesîdeyê hatine nivîsîn.

Çavkani

1. Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Stenbol 2014.
2. Çağlayan, Mehmet, *Şark Uleması*, Çağlayan Yayınları, r. 298-300, Stenbol 1996.
3. Ertekin, M. Zahir, "Di Edebiyata Klasîk a Kurdî de Texmîs û Texmîsên Mela 'Elîyê Baqustanî'", *Mukaddime*, h. 6, 2012, r.71-85.
4. Mela Elîyê Baqustanî, *Dîwana Baqustanî* (Amd. M. Zahir Ertekin), Zankoya Soran, Hewlêr 2017.

Jêrenot

- 1 M. Zahir Ertekin, "Mela 'Elîyê Baqustanî û Mewlûda Wî" *Kovara Mukaddime*, 2015, 6 (1), r.104.
- 2 M. Zahir Ertekin, "Di Edebiyata Klasîk a Kurdî de Texmîs û Texmîsên Mela 'Elîyê Baqustanî'", *Mukaddime*, h. 6, 2012, r. 76.
- 3 Mela Elîyê Baqustanî, *Dîwana Baqustanî* (Amd. M. Zahir Ertekin), Zankoya Soran, Hewlêr 2017.
- 4 Baqustanî, h.b., r.12-16.
- 5 Baqustanî, h.b., r.79.
- 6 Baqustanî, h.b., r.62.
- 7 Baqustanî, h.b., r.84.
- 8 M. Zahir Ertekin, *Jêrenot*, Baqustanî, h.b., r.84.
- 9 Baqustanî, h.b., r.79.
- 10 Baqustanî, h.b., r.90.
- 11 Baqustanî, h.b., r.102.
- 12 Baqustanî, h.b., r.81.
- 13 Baqustanî, h.b., r.80.
- 14 Baqustanî, h.b., r.102.
- 15 Baqustanî, h.b., r.101.
- 16 Baqustanî, h.b., r.98.
- 17 Ji wan menzûmeyên ku her bendeke wan ji pênc misrayan pêk tê re "muxemmes" tê gotin. (Bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Stenbol 2014, r.426.
- 18 Ertekin, *Dîwana Baqustanî*, r.22-28.
- 19 Baqustanî, h.b., r.78.



UMREK Ü MIRAZEK BEDİÜZZEMAN Ü MEDRESETUZZEHRA

Delal

ARAM DÊRAN

Qotika bayê, senfoniye bê nota li dar xistiye Îşev
 Dar, çîrokên berxwedanê ji pelê xwe re tîne ziman
 Xweza helbesta xwe distrê
 Wizewiz bi rûyê erdê ketiye
 Îşev xew revok e bi çargavîn
 Kulîlkekê, xwe xeniqandiye di tariya şevê de
 Bêsewal dikeve rûyê min
 Bi cezayê sermedî tême darizandin
 Dexilê bextê te me Delal...

Îşev ji hesreta te em bi tîfika re rûniştin
 Ez rûyê xwe reş dikim wekî wan
 Giliyên te bi wan dikim Delal
 Giliyên terikandina te...
 Çîrokên veqetîne li me rabûne temaşayê
 Li koma wan zêdeyî çêbûye
 Tifaq helal e ji bêkesan re
 Vê dûrbûnê dev xistiye kezeba min
 Temenê min diheje
 Dike rihê min biqetîne ji bedena min
 Û pêşkêşî wawîkên şevê bike
 Ditirsim bê te!
 Ditirsim Delal!!!
 Ber devê argûneke xemgîn
 Ji xeman xwe dadinizilînim
 Lê ji min tiştêk kêma nabe
 Heta hucra min a herî piçûk
 Ji êşan dinale
 Gulmek nû dikişînim ji mirinfiroşa cixarê
 Serê cixara min xweş bûye
 Ez dikişînim, cixara min serxweş dibe
 Argûnan xwe tefandiye ji êvar da
 Xwelî li serê min û wan e Delal
 Xwelî li serê min e...

Îşev tofan, dîlana li dar dixin
 Li min û pepûkên baskîkeşti hatine xezebê
 Bêdengiya min bi kûrekûra giriyên pepûkan tê birrîn Delal.
 Ne cîranek ne jî stranek li min tê gaziyê

Ev çûyîna te çiqas xedar e
 Nikarim du peyvên aram bi ser hev dim
 Te peyvên helbestên min ji min diziyê
 Te hemû demsal barî tûrê xwe kiriye
 Sosin û şîlan bi taqala kenê te ketin
 Te hemû şînayî, hemû şênayî bi xwe re bir Delal.
 Xwezî di gewriya min
 Hêstir di çavê min de asê ma
 Bê te, ez bi xwe re dujminatîyê dajom Delal...

Vê janê ez dorpêç kirim
 Di kefa destê xwe de min diguvêşe
 Kevir li ser kevir, serê min li ser laşê min naedile.
 Çivîk xwe dipûrtikînin ji nalenala min
 Pinpinîk bi min re şîna te girêdidin
 Roj, di çiyekî xerab de li min çûye ava
 Tariya şevê hêstirên min dialêse
 Çûyîna te hestên min dimêje,
 Çûyîna te hestiyên min dimêje Delal.

Dilê te bila li min were rehmê
 Were ji kerê şeytên dakeve
 Tu li min vegere Delal
 Demsala bi xwe re bîne
 Newrozan bîne
 Xweza, wê bi hatina te kesk û sor li xwe bike
 Hehecîk û legleg wê pêrgî te bèn
 Pezên min wê cot cot bizên.
 Vegere Delal
 Bila êdî ji kêfan serê min û cixara min xweş bibe.
 Bila helbestên min bi navê te rêz bibe
 Bila bihar tofanan ji rûyê erdê biqewitîne.
 Li bayê bezê suwar be û were
 Li hespên boz, teyrên baz suwar be û were.
 Zû were Delal...
 Zû were min hay li jiyane bike
 An neyê, bila meytê min li erdê birize!

Siyaset û Muxtariya Ravînya

M. XALID SADÎNÎ

Siyaset û rêzanî tiştêkî xirab nîne. Siyasetvaniya milletêkî xizmetkariya wî milletî ye. Kesê xwestiye bibite rêzanê milletê xwe, xulamîni û xizmetkariya milletê xwe jêgirtiye. Ji ber hinde jî, kesê di nava me de bi awayê siyasetvanî û rêzaniyê rabûyî, di nav millet de bi qedr û qîmet e. Lê caran siyasetvanên gel, xwe wekî axayên gel dibînin û ji rêzanî, rêberî û xizmeta millet zêdetir, axatiyê li gel dikin. Gel û millet ji bo xwe wekî mirêba û kerrax dihesibînin. Sed car heyf û mixabin ku, vê gavê ev rewş tevgeriyana li vî welatî zêde ye. Çi Tirk be, çi Kurd be, siyasetvanên me xwe ne wekî xizmetkar, piraniya wan xwe wekî mîr, beg û axa dihesibînin.

Hin jî hene ku, ji siyasetê têr nabin, qet nabêjin “bes” e. Peyva bes, qene’et û têrbûnê li ba wan

nîne. Heke endamekî kêmtirînê rêxistinekê be, dixwaze zûtirîn roj, wekî bayê bezê bi pêpelankên pêstirkê ve bifirin û bibine serok. Vêca serokê çî be ferq nake, hezke bila serokê gavanan be, dîsa jî keyfa wî xweş e. Lewra xelk jê re dibêje, “serok/başqan”. Ev peyve keyfa wî tîne û keyfa wî wisa xweş dîke ku, ji bextewariyê diferihe...

Herwekî tê zanîn, van rojan li ba me jî hilbijartin hene; Hilbijartinên Şaredariyê. Hilbijartina şaredariyê, bi wateyeke din, hilbijartinên xulamîti û xizmetkariyê ne. Lewra, şaredarî cihê xizmeta gel e; cihê xizmeta avê, gilêş berhevkirinê, qanalizasyon temîzkirin û kirina karûbarên din yên bajarî ye. Serokbûna şaredariyê jî, serokatiya wan xizmeta ne. Yanî serok şaredar, serokê xizmetkarên bajarî ye. Lê hin kes wisa di ber vî hilbijartinê re çûyîne ku, heç ku dibêji; eve nabi-

ne xizmetkar, dê bibine serokomarê dewleteke bihêztirîn di dinyayê de. Hinek, wezîriya xwe dihêlin, hinek serokatiya xwe dihêlin, hinek kar û barên xwe yên ticarî dihêlin, hinek endametiya parlemanî dihêlin û dikevîne nav berîbezankanê ji bo serokatiya “gilêş berhevkirinê”. Hey hewar bêlom e, eve çî eşq û muhbeta gilêş berhevkirin û qanalizasyon çêkirinê ye, li van “siyasetvanan” dayî? Vêca ez dizanim, eve kirm/kurmê siyasetê ye. Lewra dema hirs û azweriya siyasetê kete nav dilê yekî, êdî atilahi li feqîro nabe, hetta nebe serokê tişteki. Evê eşq û muhbeta zêde, çirokeke balkêş anî bîra min. Çîroka Muxtarê Ravînya. Çîrokeke gelek xweş e û tijî pend û nesîhet e. Kerem bikin, ez bo hewe vê çîrokê vebêjim:

Hebû nebû çu kes ji Xwedê û pêxemberan meztir nebû... Dibêjin... di dewrê berê de, li deverêkê gundekî bi navê Ravînya hebûye. Mirovek li wî gundî hebûye ku daxwaza wî ew bûye ku bibe muxtarê gundê xwe. Hindî kiriye û nekiriye, neşiyaye bibe muxtar. Jinka wî, jineke fama û biaqil bûye, wê jî dil maye pêve, piştî gelek hîlbijartinên faşîlbûyî carekê xêzana wî gotiye:

-Evdê Xwedê... Eve weha nabe. Hindî tu dixwazî ev gundiyan te nakene muxtar. Diyar e ku talihê te hatiye girêdan... Êdî dest ji vê şolê berde. Bo xwe li karekî din bigere.

Gotina xêzana wî bala wî kêşa... Wî jî gotê:

-Erê wellah ‘evda Xwedê tu rast dibêji. Talihe min hatiye girêdan. Lê ka ma çare çî ye? Tu çî rê ledibîni?

-Wellah ez çu rê lénabînim. Ez dixwazim, tu vê kirmê muxtariyê ji dilê xwe bavêji û li mal û ‘eyalê xwe bizivirî...

Mêrikî got:

-Rast e ‘evda Xwedê... Lê hema ez dixwazim, bizanim ka sebebê vê bêtalîhiya min çî ye. Ji ber hinde ez dê rabim, biçim li Hezretî Xizir Eleyhisselam bigerim û bêjimê ka eve çî ye?

Jinikê gotê; ‘evdê Xwedê, wellah dizanim eve ne oxir e tu pê diçî. Lê ma ez çî bikem. Ez jin im, ne bi serê xwe me, dara şikestî me li ber benê te me. Kerem ke oxira te xêr be.

Camêrî rabû, çantika xwe ya rêvîngiyê amade kir û kete rêka xwe, piştî xwe da mala xwe û berê xwe da oxira xwe... Çendekê çû, rêya wî kete nav dehl û daristanekê. Wî jî bitirs û xof xwe berda nav daristanê. Qederekê paş ve, şerek hate pêşiyê. Lê ji rêveçûna şêr zanî ku, şêr wî natelêfe. Ew jî bi wêrekî nêzikî şêr bû. Şêr jî bi ezman (ziman) hat û gotê:

-Birayê benîbeşer, xêr bit, ji kî ve têt û dê kî ve biçî? Mêrikî jî qisseyaya xwe jê re got. Piştî şêrî zanî ku, ew dê biçîte cem Xizir, gotê:

-Dewletserê xwe bêje Xizir ‘Eleyhisselam, min şerekî nexweş dît, êdî neşetîn nêçîrê biketin, nikare xwe xweyî biketin. Geloka dermanê wî çî ye? Mêrikê me gote şêr:

-Ehd be, ez suala nexweşîya te bikim... Û xatira xwe xwest û kete rêka xwe.

Qederekê dirêj çû, xwest ku qonaxekê bike, dît ku nêzikî baxçeyekî xweş e. Çû nav baxçeyê, pîremêrek li wêrê dît û silav kirê. Pîremêrî jî silava wî wergirt û xêrhatin pê kir. Piştî xwoş û bêşê xweyiyê baxçe sebebê geryana camêrî jê kir. Wî jî nekire nemerdî û çîroka xwe û bêtalîhiya xwe ji pîremêrî ra vegot û dawiyê jî got:

-Vêca waye ez diçim, li Xizir ‘Eleyhisselam digirim, ka gelo sebebê vê bêtalîhiya min çî ye? Pîremêrî jî gotê:

-Birayê ‘ezîz, madem tu dê Xizir ‘Eleyhisselam bibîni, dewletserê xwe bêjê; min darek heye, hişk bûye, lê ez dil nadem bibirim. Lewra heta çend saleke berî niha jî gelek bi xeml û rewş bû. Ka gelo, ev dara min bo çî weha hişk bû?

Mêrikê me jî bêhna xwe vedabû êdî, rabû û dema xatira xwe ji pîremêrî xwestî gotê; baş e, ez dê pîrsa dara te jî ji Xizir bikem û dîsa kete rêka xwe.

Êvarî gihîşte ber dergahê bajarekî mezin. No-bedarên bajêrî, pîrs jê kirin. Piştî zanîn ku rêwî ye, xerîb e û rêwiyê Xizir ‘Eleyhisselam e, birine cam Sultanê bajêr. Piştî xwoş û bêşê, sultanê bajêr jî hinek pîrs jê kirin. Wî jî di serî da behsê xwe, daxwaziya muxtariya xwe, bêtalîhiya xwe, lêgeriyana xwe ya li dû Xizir û pîrsên şêrî û pîremêrî jî bo Sultanî vegotin. Sohbeta mêrikê saf û temîz

gelek bala Sultan kêşa û wî jî gelek xwe pê xweş kir. Piştî xwarin û vexwarinê ew û Sultan bi tenê man. Sultanî jî gotê:

-Birayê 'eziz, her wekî tu dibînî, ez Sultanê vî bajarî me. Min milletê xwe gelek divêtin, wan jî ez gelek divêm. Lê dîsa jî dilê min gelek xweş nîne, ez gelek bi şînî û tazî me... Dilê milletê min jî ji ber xemgîniya min qet xweş nîne. Vêca ji kerema xwe bêje Xizir, gelo ka derdê me çi ye? Çu kêmasiya me nîne, lê dîsa jî em bextewar nînin?

Mêrikê me xatira xwe ji Sultanî xwest û çû ser cihên xwe. Raza heta spêde lêbûyî û li bangê subê rabû û kete ser rêka xwe. Çendekê çû, roj bilind bû, bêhna xwe veda û paşê dîsa rabû û çû. Çend qonaxekan jî wî bajarî dûr ketibû, êdî êvar jî nêzik dibû. Ew jî gelek westiyabû, destên xwe bilind kir û lavahî ji Xwedê kir, got:

-Ya Rebbî, ev pêxemberê te, Xizir 'Eleyhisselam li ku ye, tu nişta min bide. Piştî van lavahiyan rûnişt û bo xwe hizir kirin. Dema ew ketiye nav hizir û birên xwe, nedît ka ji kîj alî ve hat, lê mirovekî ji nişka ve silav kirê. Mêrikê şaş bû, zanî ku ew rûyê nûranî yê Xizir e. Silav jê wergirt û destê wî ramûsa û gotê:

-Ya Xizir, dermanê min tu yî, ez li te digirim. Ka bêje dermanê min çi ye?

Xizir 'Eleyhisselam gotê:

-Here dê talihê te vebîtin. Xwedê wê harîkariya te biketin.

Keyfa wî hat... Û pirsra mesela Sultanî, ya pîremêrî û ya şêrî jî kir. Xizir pirsên wan jî bersivandin û çareseriyên wan jî bo mêrikî gotin. Ew jî ji keyfa vebûna talihê xwe da rabû ser xwe û xatira xwe ji Xizir xwest û kete rê.... Rasterast hate bajarê Sultan lê dîtî.

Dema ghiştiye bajêrê Sultanî, Sultanî xwoşhatin pê kir û dem û dest dîwan belav kir. Piştî Sultan û mêvanê xwe bi tenê mayîn, Sultanî sual jê kirin ku, ka çawa çû û çawa hat. Ka Xizir dît yan nedît û ka bo wî çi got? Mêvanî jî gotê:

-Ezbenî, Xizir 'Eleyhisselam ji bo te got ku; cenabê Sultan jin e û xwe bi tebdîlî qiyafet kiriye zelam/mêr. Ji ber ku jiyana wan li ser derewan e

û hîle û xapandin têda heye, êkatî, tifaq û bextewarî ji wan dîr ketiye. Bila Sultan xwe aşkera biket û wacibatên jinîniya xwe jî bînîte cih, hem ew dê keyfxweştir be û hem jî millete wê dê serferaztir û keyfxweştir bibe.

Li ser van gotina, Sultanê zanî ku sirra wê aşkera bû... Fam kir ku êdî hewceyî xweveşartinê nîne, her tişt aşkera bûye. Gote mêvanê xwe:

-Zelamê baş, diyar e ku talihê te vebûye. Rast e, ez jin im, dema babê min emrê Xwedê kirî, wesiyeta min kir ku, ez tebdîlî qiyafet xwe wekî kurê wî pêşwazî gel bibim û sultaniya wan bikim. Min jî wesa kir. Lê diyar e biryar û kiryara me ne rast bûye ku, ne ez û ne jî milletê min bextewar bûyîn. Lê borî borî ne û mayî gelectir in. Were em tişteki nû bikeyn. Ez xwe aşkera bikem û şû bi te bikem. Tu hem bibe mêrê min û hem jî bibe Sultanê welatê min.

Mêrikî me got:

-Ezbenî, Sultan xweş be, min gelek ji te minet e, ne ez dibime mêrê te û ne jî ez dibime Sultanê welatê te. Eve tu û eve hemî genc û ciwanên milletê te, bo xwe yekî jêbigire û bike Sultanê welatê xwe... Ez dê biçim bibime muxtarê Ravînya.

Sultanê gotê:

-Weha neke, ji te pêve çu kes sirra min nizanê, madem te berî herkesî zanî, diyar e ku ez bi welatê xwe ve qismetê te me. Were xwe li min bêbext neke. Min bike helala canê xwe û welatê min jî bo te. Artêş û leşkerên min, xizîne û dîwana min bo te...

Hindî Sultanê kir û got, mêrikî me qebûl nekir û xatira xwe ji Sultanê xwest û berê xwe da Ravînya. Hetta ghiştê cem pîremêrê cotyar nesekîni. Dema ghişte nav baxçê pîremêrî, silav kirê û wekî mirovekî bilez û bez gotê:

-Birayê cotyar, min suwala te ji Xizir kir û wî jî got; bêje wî cotyarî di binê wê darê de xizîne/gencineyeke mezin heye. Bila wê xizîne derbêxe û paşê dara xwe av bidet, hema dara wî dîsa dê şîn bibite ve.

Pîremêrê cotyar, dem û dest hin tevr û bîr anîn û li bin darê xebîtî. Hêj gelek ne kolayî ghişte

ser kişl û gêça xizîne. Çendeke din vekola xizîne derêxist. Keyfa wî gelek hat. Mêrikê muxtar rabû da xatira xwe bixwazît, cotyarî gotê:

-Birayê 'ezîz, ev xizîne te bo min derxist. Bila nivenîv bo min û te be. Wellahî heta tu bahra xwe nebeyî, tu bi çû erdan ve naçî. Muxtarî gotê:

-Ne apê cotyar, bo te pîroz û sed car mubarek be. Ez tişteki jî nabem. Ji xwe ez dê bibime Muxtarê Ravînya û ew jî bo min bes e.

Hindî pîremêrê cotyar kir û nekir, muxtarî bo sondê zêrek jî nebir û bi eşq û şewq kete rêka xwe. Gihîşte nav daristana şêr di nav de. Berê xwe daye şêr li ser rêya wî ye û li benda xebereke xêrê ye. Piştî silav û xwoşbêşê, gote şêr:

-Ya heywanê Xwedê, Xizir got, dermanê nexaxiya wî cerg û mêlakên xişimekê ne. Dema mirovekî xişîm û bêaqil dît, bila bixwetin, dîsa dê sax bibe ve. Piştî van gotina, da xwe ku rabe, şêrî gotê:

-Ka raweste, ka tu çawa çûyî û çawa hatî... Bo min qisa rêwîtiya xwe bêje.

Camêrî jî nekir nemerdî, çîroka xwe ya ji wî wê ve hemî bo wî vegot. Ka çawa pîremêr dîtiye, ka çawa Sultan dîtiye û ji serî heta binî bo şêrî got. Şêrî jî li ser vegotina wî, gav bi gav xwe nêzîktir dikir û gotê:

-Yanî te got, Sultana wî welatî, hez kir bibe jina te û te bikete sultanê welatê xwe, te qebûl nekir? Muxtarî bi keyf gotê:

-Belê.

Dîsa şêrî gotê:

-Pîremêrê cotyar, gote te, were nîveka vê xizîne bo xwe bibe û te jî qebûl nekir?

Muxtarê Ravînya gotê:

-Belê...

Şêrî got:

-Baş e, ma ji te xişîmtir û bêaqiltir kî heye ku ez cerg û mêlakên wî bixwim?

Û li gel vê gotinê xwe li stûyê wî da û Muxtarê Ravînya xwar.

Qelem Zêriya

HINARA TAJDÎN

Şev û ro qelem destê mind zêriya,
Ber rêzê dilşewate dilkovan giriya,
Min qelemê ra kurê daxwezî bese,
Boy jan û êşê binvîsî.

Tilî, pêçiyê min, ser qelemê ricifin,
Ber agrê wan derd, birîna şewitîn,
Dil û ceger xweda kewgirîn
Dilhejarî kirin nalîn û qîrîn.

Qelem xênjî te, kes min fehm nake,
Hêrs û kîna xwe radike,
Sura dinê ber min vedike,
Ser kaxezê şirove dike.

Tu şev û ro destê min da
Dikewgirî halê min da,
Werimye dilê min xûnê da,
Xeniqiye behra lorîka da...

Alimekî Navdar û
Berhemdar li
Serheda Mûşê:
**Mela Zekiyê
Amêdiyê**

NEVZAT EMİNOĞLU

Kurte

Mela Zekî alimekî navdar û berhemdar e li bajarê Mûşê li herêma Serhedê. Seyda bi emrê xwe yê ku gihîştîye nod û duduyan wek dareke çinarê ya sedsale ya bi ber û berhem e. Mela Zekiyê Amêdiyê di sala 1928an de li gundê bi navê Ûrumanê ku li ser navçeya Tîllê (Korkut) ye, hatiye dunyayê. Tîl, li ser wilayeta Mûşê ye. Lewma seyda li piraniya bajarên herêma Serhedê û li çaraliyên welat wek Mela Zekiyê Ûruman jî tê nasîn. Wî bi salan muderistî kiriye û dersa telebeyan daye. Her wisa jî şîrên Kurdî nivîsîne. Armanca vê xebata me ew e ku em di derheq kesayetiya ilmî û edebî ya Mela Zekiyê Amêdiyê de agahiyê bidin û berhemên wî bidine nasîn û binirxînin.

Paşxaneyê Tarîxî ya Malbata Mela Zekî

Malbata Mela Zekî bi eslê xwe ji bajarê Amêdiyê ne. Amêdiye bajarekî başûrê Kurdistanê ye, di serdema navîn de wek paytexta mîrektiya Behdînan bû. Mîr û hukûmdarên vê mîrektiya Kurd girîngî dane ilm û alim û edebiyatnasan. Lewma ev bajarê qedîm û dîrokî bi medrese û alimên xwe meşhûr bûye û bûye cih û meskenê şair û edîban. Her wisa bûye herêm û navendeke peydabûn û geşedana edebiyata Kurdî di serdema klasîk de.

Wek bav û kalên Mela Zekî, bav û kalên xanedana Berzaniyên Başûr jî ji Amêdiyê ne. Xanedana Berzaniyan jî di serdema klasîk de hukûmdariya Amêdiyê kirine. Her wisa eqrebatî û lêzimtiya eşîra Amadî û eşîra Berzanî jî heye.² Jixwe meriv di qisedan û hal û hereketên seydayê Mela Zekî û malbata wî de ewê zerafet û esaleta aristokrat a Kurdewarî dibîne. Bav û kalên seyda teqrîben di salên 1430î de ji Amêdiyê derketine hatine Bakurê Kurdistanê. Di vê tarîxê de êrîş û zulûmkariya Akkoyûnûyên Şîî, bûye sedemê belavbûna ehlê vê mîrektiyê.³ Li gor hesab û gotinên kurê seyda yê mezin Mamoste Nûrî Yasul ku demeke dirêj mamostetî û mudurtiya Mekteba Lîseya Îmam Xetîba Mûşê kiriye, malbata wan teqrîben heft bav berê ji Amêdiyê hatine qeza Sêrtê ya bi navê Qozluxê li gundê Melefan bi cih bûne. Ev gund nêzîkî nehya Ziyaretê ya bi navê Weysel Qeranî ye. Paşê ji Qozluxê hatine qeza Motkan a Bidlîsê û li gundê bi navê Taxê ku nêzîkî Oxînê ye, diêwirin. Kalikê Seyda yê çaran ê bi navê Şah Huseyn li vî gundî medfûn e. Demekê şûnda ji wir jî derbasî mintîqa Kosorê bûne ku di nav tixûbê qeza Tîllê ya li ser wilayeta Mûşê de ye. Maneya “Kosor”ê jî “Kohê Sor”, yanî “Çiyayê Sor” tê. Bi rastî jî xweliya vî çiyayî, yanî axa vî çiyayî sor e. Ev mintîqeyeke bi çiya ye û bi qasî 20 gund li wê derê hene û 6-7 gundên vê mintîqê ji eşîra Amedî ne.

Navê bavê Mela Zekî, Selîm e. Di sala 1864an de li Ûrumanê hatiye dinyayê, tehsîla xwe li Medreseyên Abrî-Kop, Tîllê û Merkeza Mûşê yên bi navê Arapzade ku di bin îdare û muderistiya alimê meşhûr ê bi navê Arabzade de bûn, tamam kiriye. Ew jî mela bû. Alimekî navdar bû li Serhedê. Mela Selîm jî ber ku ji Xinûsê zewicîbû, têkilî û hevka-

Mela Zekiyê Amêdiyê



Yê aliyê rastê
(li gor me) yê extiyar
Seydayê Seyda, Mela
Îbrahîmê Gulçîmanê ye
û yê çepê yê ciwantir jî
Seyda Mela Zekî.



riya wî her tim bi Şêx Seîd Efendî û malbata wî re hebû. Di navbera salên 1896-1900î de li Medîneya Munewwere ilmê xwe kemilandiye. Di sala 1936an de li gundê Piyongê ku lê melatî dikir, wefat dike. Navê kalikê Mela Zekî, Qereman bû. Qereman, rûsipî û pêştatirê eşîra Amêdiyan bû li herêma Mûş û Bidlîsê. Wî qesta alim û muderisên navdar dikir û ew dianîn nav eşîra xwe û ew dikirin melayê gundên xwe. Qereman lawê Êsiv e. Êsiv lawê Heyder e. Heyder lawê Şah Huseyn e. Şah Huseyn jî lawê Remo ye. Remo lawê Emo ye. Kalikê wan ê bi navê Emo jî Amêdiyê hatiye Melefana Sêrtê.⁴

Tehsîla (Perwerdehiya) Mela Zekî

Mela Zekiyê Amêdiyê di zaroktiya xwe de dest bi tehsîla ilmê dike. Pêşî li gundê Piyongê ku li ser qeza Kopê ye, li cem bavê xwe, Mela Selîm darsa xwendina *Quranê* û *Mewlûda Kurmancî* digre. Li gundê Xoşgeldiyê ku li ser Kopê ye, li ba Seydayê navdar Mela Zahirê Tendûrekê kitêbên destpêka tehsîla medreseyê yên wek *Nehcul Enam*, *Serfa Kurmancî*, *Ewamil*, *Zurûf*, *Terkîb* û hwd. ders digre. Her wiha li gundê Melekendê ku li ser qeza Kopê ye û bi medrese û camî û çilexane û qebriştana xwe ya tarîxî, wek navendeke ilmî û çandî navdar e, li ba Mela Îbrahîmê Melekendî dixwîne. Piştê qismek kitêbên xwe li Sêrtê li cem Şex Muhemed Kazim li gundê Helenzeyê Tîlloyê dixwîne.

Mela Zekî paşê diçe gundê Qolhîsarê ku li ser Xînûsa Erziromê ye, li ba Şêx Elî Rîza kurê Şêx Seîd Efendiyê Paloyî perwerdehiya xwe dewam dike. Şêx Elî Rîza Efendî û tevî malbat û bira û pismamên xwe di salên 1940î de piştî ku efûya umûmî derdikeve, ji sirgunê dizivirin tîr ser warên xwe û dîsa wek berê dezgehên perwerdehiyê ava dikin û dersdariyê dikin û dersê didin telebeyan. Mela Zekî li wir him dersê digre û him jî dersê dide ferdên malbata Şêx Seîd Efendî û telebeyên din. Seyda tehsîla xwe ya Qolhîsarê diqedîne û tê gundê Gulçîmana Kopê. Ders û kitêbên xwe yên dawî li ba Seyda û muderisê meşhûr, Mela Îbrahîmê Gulçîmanê digre û îcazeta xwe, yanî diplomeya xwe ya mezûniyetê ji destê wî distîne.

Xizmet û Kesayetiya Wî ya Îlmî û Edebî

Mela Zekî piştî ku îcazeta xwe distîne, kurê Şêx Seîd Efendî, Şêx Xiyaseddîn, ji ber ku tekrîra wî (dersdayîna wî) pir begem dike (dicibîne), wî dawet dike gundê xwe yê bi navê Burhan li Xînûsê ji bo dersdariya lawê xwe. Piştî du salan tê Gebola. Piştî ku şeş sal li wir dimîne, tê mintîqa Kosorê, warê bav û kalan, li gundê bi navê Xiçîtan/Taşlica, li gundê Pizongan/Çinaradiyê melatîyê dike. Paşê diçe qeza Kopê û li gundê bi navê Odunçorê/Arakonakê û paşê jî li gundê Piyongê, gundê ku bavê wî lê medfûn e, melatî û muderisîyê dike. Seyda piştî ku teqawud dibe, li merkeza

Mûşê bi cih dibe. Aniha ew li vî bajarê qedîm bi kutûbxaneya xwe ya zengîn û bi şexsiyeta xwe ya rengîn, menbea ilm û îrfanê, feyz û bereketê ye.

Mela Zekî ji du aliyan ve berhem dane. Yek, telebe perwerde kirine û wuhareng berhemên zindî li dû xwe hiştine. Ya duduyan, berhemên nivîskî, yanî şîrên Kurdî nivîsîne ku ev ji bo edebiyata Kurdî jî mîras û xezîneyeke girîng e.

Seyda digel ilmê xwe yê kûr, bi bêperwariya xwe ya di anîna ziman a heq û heqîqetê de jî navdar bû. Gava em wan serdemên herî dijwar û despotîk ên Cumhûriyetê yên 50-60 sal berê û her wisa wê qedexe û înkara li ser bawerî û jiyana dînî û li ser Kurdan û Kurdî bifikirin, dê ew çax qîmet û hêjayiya “gotina rastiyê” derkeve holê. Bi qenaeta me sebebekî vê bêminnetî û bêperwariya seyda ew bû ku ew di xizmetê xwe yên dînî û ilmî de nediket bin minneta xelqê û derdorên din. Lewra wî digel wezîfeya muderistî û melatiyê, pez-dewar jî xwedî dikir ji bo aborî û maîşeta xwe. Ew vê rênçbertiyê di hemû muddetê feqîti û melatiya xwe de dewam dike. Sebebekî din jî ew bû ku hevalbendiya wî û malbata wî, bi xanedan û malmezînen Kurd ên wek Şêx Seîd Efendî re hebû. Vê têkiliyê wê hafize û hişmendîya dîrokî, dînî û millî ya Kurdî zînde dikir. Wuhareng ders û tehsîla ilmê heqîqî yê dînî, bûbû sedemê şexsiyeteke xwebawer û heqperest.

Di wê serdemê de alim û mela û muderîsen Kurd bi gelemperî bûbûne du bir, du deste. Qismekî ji wan, şêx û mezinên terîqetan çî digotin, ew teqîb dikirin û bi gotina Seyda “ke meyyîti fi yedî xessal/wek miriyê di destê xessal (mirîşo) de” bûn. Qismek jî wan jî, şêx û mezinên terîqetan çî bigotana û bikirana (ha qenc, ha xirab), hucûmî wan dikirin. Lê Seydayê Mela Zekî awha nedikir, bi awayekî din, bi rêyeke mutedîl nêzîkî van herdu seriyan dibû. Qedrê xizmet û ilm û îrfana şêx û terîqetan digirt. Lê kêmasî û xeta û xeletiyê wan jî bi zimanekî munasib û bi awayekî maqûl digot. Lewma Mela Zekî hem ji hêla xelqê ve û hem jî ji hêla alim û şêx û melan ve dihate hezkirin û teqdîrkirin. Lewma jî munaqêşe û şer û dawên di nav xelqê de diqewimîn, pîrî caran dianîn ba wî; wî sulha gelek meseleyên awha kiriye û ew bi vî wesf û xizmeta xwe jî li hemû Serhedê tê nasîn.



Nevzat Emînoğlu û Mela Zekiyê Amêdiyê


Qelema Mela Zekî ya bi Tirkî jî xurt bû. Wî di kovara bi navê “Barîş Dûnyası” de di quncikê wê yê bi navê “Doğunun Dertleri” de nivîs jî nivîsîne. Ev kovar di salên 1960î de derdiket û cih dida nivîsên li ser pirsgrêka Kurdî jî. Mumkûn e ku ev nivîsên seyda bi xebateke din ya li ser arşîva vê kovarê ya di kutûpxaneyan de, bêne peydakirin.

Mela Zekî digel ilmê xwe yê kûr, bi xeberdana xwe ya xweş û bi fesaheta xwe jî tê nasîn. Her wisa bi qise û fiqrayên xwe yên edebî û bi nuktedaniya xwe jî navdar e. Nukte û xatiratên wî yên bi vî rengî, hêja ye ku bibe mijara xebateke din.

Mela Zekî, Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî yê Kurdî pir hez dike. Her tim xwezilaya/xibteya xwe ya ji bo jiyana wî û heyraniya xwe ya ji bo wî, tîne ziman û eserên wî tewsiyeyî ciwanan dike. Telebeyê Rîsaleyê Nûr û sazkarê Weqfa Zehrayê û mîmarê manewî yê kovar û weşanxaneya Nûbiharê û şehîdê dîn û millet, Seydayê Mela İzzeddîn Yıldırım jî her ku dihate Mûşê, bêyî ziyaret û pirsîna Mela Zekî, derbas nedibû.⁵

Helbestên Mela Zekî

Helbestên Seyda gelek in. Lêbelê piraniya wan ji ber qedexe û bêqeydkirin û koçberiyê, wînda bûne. Em hêvîdar in ku rojekê ew helbestên wînda bêne dîtinê û bibine malê edebiyata Kurdî. Digel vê yekê hinek helbestên seyda ji berzebûn û ji mirinê xilas bûne û ji hêla kurê wî Mamoste Nûrî Yasul ve hatine parastin û gihîştin ber destê me. Ev helbestên wî cara ewil in ku tîne weşandin.



Ji destxeta Seydayê Mela Zekî nimûneyek

Ev helbest ji hêla şeklî ve qismen bi weznê erûzê hatine hunandin. Xasma di kurtbûn û dirêjbûna hêceyan de gelek caran ahenga erûzê nişan didin. Di hin risteyan de tefîleyên behrên erûzê yên wek “mustefîlûn” (Helbest No: 3) û “failatun” (Helbest No: 1) tên xuyanê; lê Seyda pîrî caran xwe mecbûrê girêdana bi van qaliban nedîtiye. Zimanê helbestan bi Kurdiyeke herikbar û rewan e. Ji hêla naverokê ve jî piraniya van helbestên Mela Zekî temaya mersiyeyê nişan didin. Wî ev helbestên han li ser wefata Seydayê xwe ye meşhûr Mela Îbrahîmê Gulçîmanê ku wek Mela Îbrahîmê Exdadî jî tê nasîn, nivîsîne. Exdad jî gundekî Tilla Mûşê ye û dikeve mintiqeya Kosorê. Mela Îbrahîm ji eşîra Botan bû. Gelek gundên eşîra Botan hene li Serheda Mûşê. Di hin çavkaniyên tarîxî de tê nivîsîn ku di dewrana dewleta Kurdên Eyyûbî de Sultan Selaheddîn gelek eşîrên Kurd ên herêma Cizîr û Hekariyê di bin rêberiya alim û şêxên Kurd ên Şafiî de şandine Serhedê. Mela Îbrahîm ji Exdadê bû, lê li Gulçîmanê muderistî dikir. Bi ilmê xwe, bi muderistiya xwe û bi xîret û hamiyetperiya xwe meşhûr bû. Çend nimûne ji helbestên Mela Zekî:

1

Alema berzex muzeyyen bû bi şewqa rûhê pak
Şahiya kefte semayê lê hezîn ma erd û xak
Medresa Zehra xirab bû naxwiyê tê da sîmak
Te meqamek hîşte vala tijî nakit wî sîwak
Ehlê ilmê man muheyyer his kirin bo xwe hilak

Cezl û ferh û reqs û şahî bû li etbaqê sema
Alema erdê bû cayê me’rezê derd û xema
Alim tevda bûn muşewweş lew di wan da kes nema
Ev ferîqa nabe xalî qet ji şîn û matema
*Leytenî kuntû bî rûhî leke ustadi fidak*⁶

Ezm û qesta wî bû daîm nef’a dîn û milletê
Qet nebû rojek jê xalî tim di se’y û xizmetê
Bû cefa û mihneta wî mûcîbê wê illetê
Wî nekir qet îxtiyariya xina ser qilletê
Îltîfata wî nebû qet serwet û mal û melak

Rutba wî e’la nivîsîbû li ser lewhê qelem
Ev bi teqdîr û qezaya ezeli bû di qedem
Hem zewatê ku pir alim bûn ji bo wî bûn xedem
Ez nikam medh û senayê wî bi heqqê wî bidem
Tebîxa emr û nehî kir hesbeten bê xewf û bak

Tel’eta wî şemsê peyda bû di nav burcê welat
Lami’a nûra wî dabû mawera Dicle w Ferat
Remz û tesrîhê wî îhya kir gelek qelbê memat
Bal û qelbê ku mirî bûn bexşî wan kir wî heyat
Firqet û hîcra wî cergê min gerand tar û şebak

Îlmê wî ilmekî nafi bû ji bo xas û ewam
Rewneqa wî da biladan mustefîd bûn jê mudam
Menbe’a wî Gulçîmen bû mewcê wî da qutrê Şam
Kes nema mehrûm ji feyza wî xenî û hem xulam
Behrekî cewher tijî bû mali’ê durr û derak

2

Ey warisê ilmê Resûlê Qereşî
Tebîx û neşir kir te wê ilmê bi xweşî
Çil salî li ser wê silk û rahê tu meşî
Hemrah û heval bî gel Bîlalê Hebeşî
Tu cîranê Mustefa bî di wê qesra cennetê

Ez wesfê ji îlmê te bidim ya medhê sîma
 Ey meş'ela îlmê waqîfê sîrrê Ha Mîm a
 Ellameyê dehrî yû ustadê hekîma
 Em cumle minnettar in ji te (b) terzê xerîma
 Lew te hişyar kir gelek însan ji xaba xefletê

Ey keşşaf û derrakê esrarê Quranê
 Ey mudrik û mufhimê ji e'cazê Furqanê
 Ey sebbah û xewwas û di wê behra me'anê
 Ey arîfê billahî û ferdê zemanê
 Rutba te bilind e ey xezîna xeyretê

Behsê ji ulûmê te nizanîm ez çî bêjim
 Wesfê ji kemala te da ez sukran û gêj im
 Cerhê bi çî derkem ez bê mîl û bê dirêş im
 Layîq î ku ez j' bo te j' her du çeşman xûn birêjim
 Di cihê te da ez bibûma me'rezê wê îlletê


Ey musemmayê bi "zal" û "kaf" û "ya" daîm bibêjî
 Tu heta sax bî welew tu nûra çeşmê xwe birêjî
 Ji exlaqê wî hemîde ji sedan yek tu nabêjî
 Her dua ke ey Zekî daîm di piştî her nimêjî
 Bêje ya Reb ji cemala xwe bidey wî ru'yetê

3
 Salek çî xerîb bû Gulçîmen da bû qiyamet
 Payîzek hezîn bû hesret û derd û nedamet
 Şerqê da nema ferdek ji wî derdê selamet
 Lew am bû musîbet cumle alem pê elaqet
 Feryad û fixan in ew ji destê firqetê

Însanekî kamil bû d' vê Şerqê da ew yek bû
 Ustadekî fazîl bû di vê esrê da tek bû
 Xulqen ew beşer bû lê teb'en ew melek bû
 Nef'a wî ji bo millet û dînê ra gelek bû
 Ya Reb nekî mehrûm me ji feyz û himmetê

Seydakî mahîr bû xasma der îlmê beyanê
 Muşkil hel dikir zû wî di nava çend sewanê
 Ew behrek emîq bû wekî Se'dê Teftezanê
 Hem zatek edîb bû wekî Şêx Ehmedê Xanê
 Ferdek bû di Şerqê da bi ilm û şuhretê

Ew huzûra wî ji bo min eynî Firdewsî Xweda bû
 Mislê wî nazîk û şîrîn Rebbê alem pir nedabû
 Rohniya çeşm û çîraya min bû sed heyfê cuda bû
 Rûh û canê min bîlaşubhe ji bo wî ra fîda bû
 Ger bi fezla xwe qebûl kir ba wî Rebbê izzetê



Ji destxeta Seydayê Mela Zekî nîmûneyek

4
 Xewxakî mezin çêbû li Mûşê l' xestexanê
 Bû zelzele û feryad di nava Gulçîmanê
 Lew hêsir û xûn tevda dibarîn mislê kanê
 Zarîn û fixan e hem fîzar e Seyda kanê
 Wek rojê çû ava tariya wî da cîhanê

Ew sala ku tarîx tê hezar çarsed û şeş bû
 Ew salekê bêyumn tali'ê me tê da reş bû
 Hem salek bi huzn û keder û derd qet nexweş bû
 Xweziya min b' wê sala d' beriyê çiqas xweş bû
 Sed xweziya b' wê çaxê bi wê dewr û zemanê

Wê illet û daxê pir di alem da eser kir
 Wê ewlad û ehbaban jî bê çav û beser kir
 Zêde kir enînan der dilan dax û keser kir
 Cergan da birîn çêkir û gel wê xoy li ser kir
 Qet nabe şîfa dil ji wî tîra xestexanê

Em daîm huzûra wî da bûn ekserê salê
 Wek cenneta ela bû wê lehza em li balê
 Dunya bû cehennem ku me wînda kir cemalê
 Ez mame ku qelbê xwe dewa kem bi xeyalê
 Razî bim bi esrar û qedaya Semedanê

Ev qelbê birîndarê wê tîrê şîfa nabe
Ger cumle tebîbê di dinê da l' ser civabe
Tev tedawî kin wî qelbî b' tedawîkî sewabe
Îlla bi wê wesla ku ew îhsana Xweda be
Ya Reb tu wusûl çêkî di uqba der cînanê.

ev bajarê hanê awha bi Ihtîşam û li ser deşta lûtkeya/zîrweya vî çiyayê bilind û wek hêlîna qertelan, bajarê kîjan welatê Ewropayê Îskandinav e? Paşê min dît ku bajarekî me Kurdan e li perçeyê başûrê welat. Îcar min di dilê xwe de got: "Hermd û sena û şukranî / ji bo wî Xalîqê Rehmanî!"

- 2 Mesut Barzanî, *Barzanî ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi*, Wergera ji Erebî: Vahdettin İnce, Weşanên Doz, Stenbol 2005, r. 23.
- 3 Şerefxanê Bidlîstî, *Şerefname Kürt Tarihi*, Wergera ji Erebî: M. Emin Bozaslan, Weşanên Deng, Stenbol 2002, r. 89.
- 4 Roportaja bi Mela Zekiye Amêdiyê re, dîrok: 06.05.2019
- 5 Osman Tekin, *Semînera li ser Bîranîna Salvegera Wefata Mela İzzeddin Yıldırım*, Muş, Dîrok: 10.03. 2019
- 6 Ev rîste bi Erebî ye û maneya wê ev e: "Ey seydayê min, xweztî ez bi ruhê xwe fedayê te bûma."

Jêrenot

- 1 Min di salên nodî de gava cara ewil fotoxrafên vî bajarî li ser İnternetê dîtî, min di dilê xwe de got: Subhan bi şahê qudrêtê! Gelo

Xedra

BAMED SERDAR

Xedra...! dema ku tu hatî
tê min li van deran nebîne
wê keskesorên Adarê xwe berda ronahiya çavên te
û tê di rêya xwe de pêgî pişpîkê Nisanê bibe
wê mîzginxerên dilê min, li dor te xîz bibûn
wê çavên te mina kevokên paskokî xwe di bariya Mêrdîne de
parxûn bikin...

Xedra...! dema ku tu hatî
wê qesr û qonaxên bajêr wêke dilê min, xwe li te bîhantî
û pêlîkên bajêr xwe li lingê te bipêçin û
bi qasî keskayîya çavên min wê xwe li ber te rasîn
wê bédengiya vî bajarî di nava te de bigire

Xedra...! dema ku tu hatî
bêhma erxewanên keza û kakûlên te
wê xwe li ber baranên çîçarî şî bikin
di dilê te yê bêxwedî de ezê bêxwedî bîmin
û rondikeke mîvco bîmin li rûyê te
di hewşa çavên min de wê ti kolanek zûha nemîne


Xedra...! dema ku tu hatî
hinek evîn bi xwe re bîne
û li dî min de li vî bajarî bîreşîne.

Du Haîkû

haîkû: sîdîq gorican
xêz: zozan orak



sala dehan e
b'firmêsk diborin çile
Hrantê biradill...



nêrebeytikî
dev j'zilikê berda û çû
hevsera wî l'peyl...

Delalê Delalê

RAHMETULLAH KARAKAYA

Min, Delalê, di sala 1963an de, li Şaxika Wanê nas kir.

Cîrana me bû...

Em, her sibê bi hev re diçûne mektebê.

Li erdê nêzîkî mêtroyekê berf hebû. Ez diketime pêşiya wan; neh-deh zarokan ji didane pey min. Nêzîkê sê kilomêtran, em peyatî diçûn dihatin...

Delalê, her carî tam li pey min cî digirt.

Hebûna wê, nefesa wê, nihêrandina wê, dengê wê, mêzekirina wê, heyat dida min...

Dilê min, bi wê şa dibû, bi wê dikete helecane, bi wê geş dibû, bi wî tam hildida.

Li mektebê jî, em di sirakê de rûdiniştin.

Mamostê me ders dida, lê ez li alemeke din bûm.

Di hişê min de Delalê, di nava agirekî bê emsal de dişewitîm.

Şewata ku can dida min, rih dida min...

Ew çî bayekî xweş bû ya Rebbî...

Min nedixwest ro xelas be.

Min nedixwest deqîqe derbas be.

Çunkî, ro Delala min bû...

Ro, hezkirina min bû.

Ro, hezkirina wê bû.

Ro, dîtina wê, ro mêzekirina wê, ro nêzîkîtiya wê bû.

Loma min qet ji şevê hez nedikir.

Hê jî hez nakim.

Şev, windabûna Delala min bû...
 Şev, mirina min bû.
 Şev, mirina dilê min bû.
 Şevê saniye dibûn saet, dibûn roj, di ser min de digirt.
 Bê meşûk, bê evîn, bê dîtîn, bê heval, bê Delal dimam...
 Minê çawa ji şevê hez bikira...
 Şeva tarî û zulûmat, mîna cinawirekî ez dixis-time nava lepên xwe...
 Nefesa min hildiçikî.
 Qelbê min disekinî, xew nediket çavê min...
 Heya ku dibû sibe, nava alavekî giran de digeviziyam.
 Çavê min nedidît, destê min nedigirt.
 Nikaribûm rabim piya...
 Quwet di canê min de nedima...
 Heya ku derdiketim derve, min Delala xwe didît, dilê min ronî dibû...
 Ewê destê xwe dihejand, dilê min li ciyê xwe de dipirpiti...
 Çavê min ji wê nediqetiya, heya ku dihate cem min,
 Min destê wê digirt, ew helbest ji zimanê min dirijiya:
*Min gava te dît,
 Evîn niqutî dilê min
 Loma pîr kêfxweş im.
 Axîna ji min tê,
 Hewar e ji bo te,
 Agir ketiye canê min
 Tu yî dermanê êşa min...*

Bi hev re, ji can û dil, dikeniyam... Bi deqîqan li çavê hev dinhêri.
 Em di nava çavên hev de dibûn yek can, yek dil, yek nefes...
 Zarokên din ku tev dihatin, em diketine rêya dibistanê...
 Her roja me weha derbas bû, sala 1963-64an de...
 Me herdukan ew sal, mekteba pêşîn xelas kir...
 Her roj, heya êvara dereng em bi hev re bûn...

Me bi hev re dileyist, me bi hev re dixwar û vedixwar...

Yan li mala me, yan ji li mala wan...
 Delalê û ez, ez û Delalê, êdî bibûne yek can...
 Ew nebûya ez, ez nebûma ew, bê hev nedihatîn bîra tu kesî...
 Çiyayên Şaxikê, şahidê hezkirina me ne...
 Çiyayê Sarnusê, Çiyayê Sozvanisê, Rezê Mîr, zevî û mêrgên Şaxikê, bax û baxçên Şaxikê hevalsirrên me bûn...
 Darên gûzan, darên sêvan, darên hirmiyam, darên behîvan şahidên hezkirina me bûn.
 Çemê Sortkîné, ji Kanîsîpiyê heya ku digihiştê Çemê Botan, ji bo me dikire leme lem, strana evîné digot.
 Baqê benevşan, bi bîna xwe û rengê xwe, nîşana hezkirina me bûn.
 Ev herdu sal, dikarim bibêjim, jiyana min a cennetî ye...
 Ev hezkirina pak, ji dil û can, bala herkesî dişikand.
 Em herdu dil, bi xeyalekî engîn de serxweş ketibûn...
 Du sal çawa derbas bûn, dev û dorê me çi dibû, xema me nebû...
 Alema em têda bûn, ji me re bes bû...
 Ku em hatin havîna 1964an, wextê cudabûnê hat..
 Me herdukan jî mekteba pêşîn xelas kiribû.
 Li Şaxikê mekteba navîn tunebû.
 Ji bo wê, gerek tayîna bavê me herdukan jî derketa ciyekî mekteba navîn heyf...
 Pêşiyê tayîna bavê Delala min derkete Kirikhana Hatayê.
 Serê teboxê bû.
 Roja ku wana mala xwe bar kir, çiyayên Şaxikê di ser min de hilşiyam. Di ser min de agir barî...
 Şewata dilê min, jiyana li ber min reş kir.
 Ji xewê, ji xwarinê, ji vexwarinê hatim birînê...
 Roj, ji min re bû şev...
 Min xwe li zeviyan xist, li bax û baxçan xist, li mêrgan xist, li newalan xist, li çiya xist...

Di hişê min de ew, li ser zimanê min ew...
 Çi stranên li ser evîne dizanim, yek û yek dibêjim...

Hêstir bi çavên min dikevin... Dibe êvar, ez nizamim li kiderê me...

Ji mal dûrketin, êvar, tarî xema min nîne...
 Di nava agirê evîne de digevizim, dişewitim, dinalim, digrîm...

Tu tişt nikare êşa dilê min sar bike...
 Deqîqe bûne saet, saet bûne roj, roj bûne meh, meh bûne sal...

Heya payizê, min jiyaneke pir bi hesret derbas kir.

Meha cotmehê tayina bavê min derkete Hewaga Rihayê...

Hişê min hinekî hate serê min.
 Li Rihayê, ezê nêzîktirê Delala xwe bûma.
 Riha, Entab û Hatay, di rêzekê de cînar in.
 Ku firset biketa destê min, dikaribûm bigihêjime wê...

Dilê min kele kelê de, me xwe avête Rihayê...
 Li wira min, name şand ji Delala xwe re.
 Hesreta xwe anî ziman û jê re got:

Urfa ye welatê me
Lêxe bila def û zurne
Usûla malbata me
Çêkin dîlana du dîlan...

Ewê bersiv da:
 "Gerek em sebir bikin. Heya xwendina me xelas nebe, em nikarin tu gavê bavêjin...Di dawiyê de emê bi dilekî sar, rêya xwe bicibînin."

Gotina wê rast bû... Hê rêyeke pir dûr hebû li ber me...

Sê salên min li Hewagê derbas bûn. Min mekteba navîn li wir xelas kir.

Bavê min, tayina xwe seba ciyekî lîse heye xwest.

Havîna 1968an mizgîna mezin hat...
 Me yê jî barî Samandaga Hatayê bikira...
 Ez ji kêfa difiriyam...
 Rebbê mezin, xwestina min, agirê dilê min, duayên min anîbû cî...

Sê sal paşê, dîsa ezê bigihaştima Delala xwe.
 Me mala xwe bar kir, ketine rêya Samandagê.
 Nava Riha, Eligor û Surûçê de derbas bûn, gîhiştine Bîrecikê.

Ferat û pira li ser, li ber çavan dirêj dibûn. Ji wê dîtine ez pir kêfxweş bûm.

Nizîp, Entap, Îslahiye û Kirikhana delal...
 Welatê Delala min Kirikhan...

Gurpe gurpa dilê min bû. Nava firtoneke bêhempa de dev û dorê xwe dînihêrî...

Min nedixwest rêya nava Kirikhanê xelas be...
 Çavê xwe mîna birûskê li dev û dorê xwe digerand.

Ez û Delala xwe, sê sal paşê dîsa li eynî deverê, me bi hev re bîn hildida û berdida.

Ew jî rewşeke pir bextewar bû ji min re...
 Min qeyda mektebê li Lîsa Antakyayê çêkir.
 Roja duşemê, ji Samandagê diçûme Antakyayê, roja şemiyê piştê nîvro ji vedigeriyam malê.

Di sinifa me de, zarên ji Kirikhanê jî hebûn.
 Pîrsa Delala xwe kir, nas dikirin...

Mehekê şûnda çûme Kirikhanê. Li mala wan bûme mêvan.

Hevdîtina me, ji du aliyan ve, pir xweş derbas bû.

Salekê em li Hatayê man. Cotmeha 1968an de, tayina bavê min derkete Beykoza Stenbolê...
 Êdî ez, gihiştim welatê xeyala xwe... Ketim nava coşiyê bédawî...

Çavên min, ji Stenbolê bêtir tu tişt nedidît.

Roj hat, min Delala xwe jî nepirsî qet... Roj hat, min rê û şopa wê jî wînda kir.

Heya sala 1987an de, li ser rathatinekê, em dîsa gihiştine hev.

Ez li Galatasarayaya Beyoglyê, ji ber galeriya resman re derbas dibûm. Armanca min ew bû ku li galeriyê bigerim.

Min gava ku navê senetkaran ku xwend, di cî de qerisîm...

Yek ji wana mamosteya min ya mekteba pêşîn bû. Yanî dayika Delala min...

Di sala 1963-64an de, li Şaxika Wanê, di sinifa pêncan de, ez dabûm xwendinê...

Ez dîsa çûme bîst pênc salên berê. Bi helecane ketim hundir. Jinek hebû li pişt masê. Min mamosta xwe pirsî...

Ecêbmayî ma û bersiva min da:

“Duh çû Îzmîrê. Du roj şûnda jî sergiya me xelas dibe. Êdî wê nezivire. Çi gotina te heye, bi-bêje, ezê bi dilxweşî bigihînim wê...”

Wê çaxê ez, di rojnama *Tercumanê* de dixebitîm. Min telefonên *Tercumanê* danê...

Nav de pênc-şêş roj derbas nebûn... Mamosta min, telefon vekir... Hal û hewalê min pirsî...

Selamên Delala min ji min re got...

Ez bûme teyr, bi per û baskên xwe firiyam ser alemeke din...

Xwestineke Delala min hebû ji min...

Berhemeke li ser tenduristiyê dixwest ji min... Rojnâmeya *Milliyetê* weşandibû ew berhema.

Min nava du rojan de, berhem bi dest xist. Li ser masa min disekinî. Minê ji Delala xwe re tîlefona bikira... Tîlefona min lîxist. Min çawa vekir, ewê xwe da naskirin:

“Ez Delal...”

Di carekê de şaş mam. Ji serê min heya binê piyên min, bayekî germ derbas bû. Di ciyê xwe de dicirifim. Çavên min tarî bûn... Na na min xeyal nedidît. Delala min raste rast li aliyê dinê li ber min bû.

Min, bîst sal paşê dîsa dengê Delala xwe bihîst... Bi hezar carî ji Xwedê re şikir kir...

Bi helecane jê re got:

“Ew çî rasthatineke mezin e... Minê mizgînî bida te... Tu ji min jêhatî derketî. Ka kerem ke, adresa xwe bêje, ez xwestina te binim cî...”

Bersiva wê, mîna gullekê li dilê min ket:

“Berhem bahane ye, ez te dixwazim...”

Wey mala minê...

Delal min bîra min kiriye. Gazî min dike... Tu hê çî disekinî. Zû haziriya rêya xwe bike...

Wext, ji bo te mîna zêr e, rojekê pêşiyê de xwe bavêje Îzmîrê...

Wê şevê ji karê xwe derketim, min berê xwe da Îzmîrê...

Roja dinê saet heyşt û nîvan de, li Karşiyakayê, li ber mala wan bûm.

Ez li jêrê, Delala min li balqonê, bê hemd di ciyê xwe de qerisîn.

Çavên me, di nav hev de wenda bûn... Ez nîzanim çend deqîqeyên me weha derbas bûn. Min qasî pênc-şêş deqîqeyên dinê, encax di xwe de mecal dît, gavek avêt ber derî. Derê apartmanê vekir, qatekî derketim jor.

Bi hesreteke şewitî, me xwe avête hembêza hev.

Du roj û sê şev, çawa derbas bûn, nayên zîman.

Encax qamera hebûya, dikarîbû pesn û bala wê hevdîtîne qeyd bikira.

Min û Delala xwe, wan rojan de peymanek nû çêkir nav hev de...

Ewê çî çax bigota, “min bîra te kiriye”, ezê biketima rêyan...

Ji wê rojê paş de, em bi caran gihîştine hev.

Îzmîr, Kuşadasî, Soke, Mîlas, Bodrum, Kaş, Kale, Kalkan, hevalsirrên me ne.

Behra Sipî, qeraxên wî, masiyên wê, kosiyên wê, daristanên wê, mezelen qralên Lîdyayê, Behra Egeyê, Haliqarnasos, bi dilxwazî şahidên eşqa me ne.

Wê dilgeşiya me, nêzikî panzdeh salan kişand.

Roj hat, felekê ji eşqa me kete hesûdiyê...

Delala min nexweş ket... Nava derdekî bêderman de, nêzikî pênc salan, pir ezab kişand.

Ji nexweşiyê evqas jar ketibû, mabû hestî û term.

Dernediket tîlefona min... Diya wê, mamosta min, di ber dilê min de dihat...

Roja ku min koça wê ya jiyana bêdawî bihîst, dinya li ser serê min de hilweşiya...

Bi mehan di şîne de mam. Hesreta wê, tunebûna wê, dilê min ji kûr ve qeland.

Mamosta min, pênc sal paşê wesiyata Delalê ji min re got:

“Bila li qisûra min nenihêre. Min nexwest di hafiza wî de, halê minê nexweşiyê bimîne. Ez li axiretê li benda wî me...”



Cemil Turan Bazidî:

35 sal in

**ez dûrî welatê xwe me,
lê qet jê neqetiyame!**

HEVPEYVÎN: NİHAD GÜLTEKÎN

Nihat Gültekin: Kek Cemil, civaka me, we bi piranî ji nivîskariya we, ji gelek pirtûk û nivîsên we nas dike. Hûn dikarin xwe hinekî bi me bidin nasîn, behsa malbata xwe, zaroktiya xwe bikin?

Cemil Turan Bazîdî: Li navçeya Bazîda bajarê Agirî yê Bakûrê Kurdistanê ji dayik bûme. Malbata min, malbateke malmezîna, dêmokrat, welatparêz û xwedan kultur bû. Ez ji pênc xuşk û birayan yê sêyem bûm. Zarokatiya min, ciwantirîn salên min bûn. Bajarê Bazîdê, bi her awayî bajarekî nimûneyî ye li Kurdistanê. Karîgeriya Ehmedê Xanî li ser me gelekî mezin e. Kesayetiya wî li gel me kesayetêke pîroz e, em dema sond dixwin jî “bi serê Xanî Baba” sond dixwin. Werzên havînê jî gelek cuda bûn. Zozanên wê gelekî xweş in, zivistanên wê jî gelekî sext û dijwar in. Xişokiya ser berfê jî tişteki gelekî xweş bû. Ew kesê ku ne aşîqê Çiyayê Agiriyê be, ew ne ji Bazîdê ye. Bi wê bilindiya xwe û berfa xwe ya duwazde mehan, şanaziyekê dide me. Em jî wek wî serbilind û xwedan kesayetiya xwe ragirin.

N.G: Mamoste, Bazîdê aliyekî berhemên Ehmedê Xanî, tu edebiyatê nas dibî, aliyekî jî tu çîrokên Geliyê Zîlan, Şerê Agiriyê mezin bûyî. Tu dikarî behsa wan taybetmendiyên jiyana Bazîdê bikî?

C. T. B: Ez bi hestên welatparêziyê mezin bûm, ji ber ku malbata min di serhildana Agiriyê de, xwedan roleke girîng bû. Hem jî ji ber hebûna Ehmedê Xanî, ez bi hestên welatparêziyê mezin bûm. Hêjta di zarokatiya xwe de, min ew sistema dewlata Tirk ya ser me, pesend nedikir. Hemû rojan bi derengî diçûme xwendinê da beşdarî wê sonda Tirkî nebim. Cara yekê di wan salan de ez li gel dadgehên dewletê bûme nasyar. Li ber derê xwendgehê peykerê Ataturkî hebû, (bi serê mezin, difna mezin, guhên mezin) peykerê

Ez bi hestên welatparêziyê mezin bûm, ji ber ku malbata min di serhildana Agiriyê de, xwedan roleke girîng bû. Hem jî ji ber hebûna Ehmedê Xanî, ez bi hestên welatparêziyê mezin bûm. Hêjta di zarokatiya xwe de, min ew sistema dewlata Tirk ya ser me, pesend nedikir. Hemû rojan bi derengî diçûme xwendinê da beşdarî wê sonda Tirkî nebim.


kirêt bû, min guhê wî rakêşa û di destê min de şikest, (ya rast, hindekan berî min ew şikandibû û bi benîştê pê venabûn). Dema mamosteyî ew di nav destê min dît, dîn û har bû, yekser ez birime nik berpirsê xwendîgehê. Piştî demeke kurt polês hatin. Hêjta min nedizaniya ka çî qewimiye, min dît ez beramberî dadwerî me. Bêyî ku pîrsekê ji min bike, şeş meh cezayê zindanê da min û ez ketime zindanê. Ez hêjta 15 salî bûm. Ji ber ku di zindanê de cihê zarokan nebû, gardiyaniya ewaran ez dihanîm malê û sibehan jî careke din dibirime

zindanê. Ew guhên Ataturkî di hemû jiyana min de, li dadgehên hate beramberî min.

Binyata endambûna bizava welatperweriya Kurdî di wê zindanê de hate danan. Wek zarokê Bazîdê, Serhedê, Ehmedê Xanî ji bo me, bi gotina me ew “Xanî Babayê” me ye. Ez bi vê hizrê mezin bûm. Berhemên Xanî ji bo me wek tişteki pîroz bû mîrasek. Mem û Zîn, Nûbara Biçûkan bû egera wê çendê ku ez bibim edîbek. Her wesa çîrokên serhildana Agirî û komkujiya Zîlanê, ji bo me bûn lorî.

N.G: We li kî derê xwend, hinekî jî em qala wan salan bikin?

C. T. B: Piştî xwendina seretayî û navîn, ez ji bo zankoyê pêşiyê çûme Enqerê paşê çûme Stenbolê. Mixabin sala 1971ê derbeya leşkerî qewimî, dawîya sala 1973ê jî ber du çekan ez heta sê salan hatime zindanikirin. Ez gelek bi şens bûm, ez bi efuya sala 1974ê hatime berdan. Li Stenbolê, li gel hevalên Agirî, me Komala Kulturî ya Agirî damezrand. (Ez di desteya damezrêner û rêveberiyê de bûm.) Sala 1975ê jî, me DHKD (komela Kulturî ya Xelkê Şoreşger) damezrand. Ez di desteya wê ya damezrêner û reveberiya wê de bûm jî.



Recep Dildar, Cemil Turan Bazîdî, Nihad Gûltekîn û Selahattin Bulut

N.G: Yekî Bazîdî beşdarê şerê Koreyê dibe û li vir birîndar dibe. Wextê vedigere Bazîdê lawja dibêje. Te ew di kasetekê de tomar kiriye. Te piştî çend salan, wê derheqê de romanek nivîsî. Gelo tu dikarî behsa wan xebatên xwe bikî?

C. T. B: Rojên îneyan, mirovek dihate mala kalkê min. Bejin bilind, rûyê wî dirêj, yekî qelew bû. Ji ber qelewiye, hemû caran şalwarek û sako-yekî dirêj li xwe dikir; herdu çavên wî jî kor bûn. Jineke genc, jina wî her li gel wî bû. Di destê wî de tembur hebû (zikirxane) û her beyt digotin. Me Bazîdiyan digote wî, Dîwane. Navê wî “Dîwane Sadullah” bû. Mehek dimîne ku leşkeriya wî xilas bibe, şerê Koreyê dest pê dike. Ji ber ku bejin bilind û girs bû, fermandarê leşkerên Koreyê Tug-general Tehsîn Yazıcı wî dike şoforê xwe. Dîwane diçe Koreyê, nizane ka Kore li kê derê ye, nizane ka ji bo çi şer dike, cara yekê li keştiyê sîwar dibe, deryayê dibîne.

Piştî rêvîngiyeke çend mehan, beşdarî şer dibe, dîl dikeve destê Koreyiyan û di kampa dîlgirtiyên de dimîne. Dema wî dibine devera Çînê, firokeyên Amerîkayê wan bombebaran dike û bi birîndarî li kampa dîlgirtiyên dimîne, li wê derê

ji çavekî kor dibe. Piştî şer veguhestina dîlgirtiyên çêdibe û vedigere Bazîdê. Dewleta Tirk guh nadê û lê nabe xwedan, ji ber hindê jî çavê din jî kor dibe. Paşê bi bendirê beyitan dibêje û jiyana xwe bi rê ve dibe. Di beytên xwe de her behsa Koreyê dike, ji ber hindê jî ji layê leşkeriyê ve gefan dixwe. Dihête qedexekirin ku di derbarê Koreyê de beyitan bibêje. Bi rizamendiya Dîwaneyî, min eve tiştana hemû di kasetê de tomar kirine.

Piştî çend salan min ew kir romanek. Bi navê “Xwedê li wê derê dinivist”. Xala balkêş ya romanê ew e ku Dîwane li gel NATO, leşkeriya Tirk diçe şere Koreyê û li wê derê rastî Kurdekî dihêt. Germo Xudayan, ew jî Kurdekî ji Ermenistanê ye, bi rizamendiya xwe diçe şer da li dijî Amerîkiyan şer bike. Ew li wê derê hev nas dikin.

N.G: Gava kesên wek Mehmet Gûltekîn behsa bîranîna we ya beriya 40 salan dikin, we hîn salên 1976-77an de alfaba Kurdî hînî xorta, xwendevana kiriye. Û ji bo Kurdî bixwînîn û binivîsin gelek hewldanên we hebûne. Dikarî behsa wan salan bikî?

C. T. B: Programa asîmîlas-yonê ya dewleta Tirk li ser Kur-dan bi awayekî bi bezeyî her ber-dewam kir. Propaganda wan ya girîng jî ew bû, digotin zimanê Kurdî bê elifba ye. Bi tenê zimanê axaftinê ye. Salên 70ê yan xebata me ya herî girîng jî ev bû da em vê hizrê bişkênin.

Ew pirtûkên Kurdî yê ku min li Stenbolê û Enqerê peyda dikirin, li gel xwe dibire Bazîdê, min dida gencên welatparêz û hindekên din. Min digote wan zimanê Kurdî hebûna me ye, zi-manê zikmakî girîng e, dewleta Tirk ji vê yekê ditirse lewma dijî wê kar dike. Salên gelek dijwar bûn, em hem li dijî sîstema asîmîleker û faşîzan, hem jî li dijî bi-zavên çepgirên kemalistên şovenîst, tédikoşan. Me gengeşeyên gelekî girîng dikirin, gelo ka zi-man û edeba Kurdî heye yan ne, her wesa gelê Kurd, neteweyek e yan kêmenetewe, Kurdistan kolonî ye yan ne? Armanca me ya sereke ew bû ku em gencên Kurdan hişyar bikin û nehêlin berê xwe bidine rêkek şaş.

N.G: Cara pêşin kingê daxwaza niviskariyê û lêkolinan li bal we peyda bû? Hinekî ji me re qala pêvajoya niviskariya xwe bikin? We cara pêşin kingê bi Kurdî nivîsî?

C. T. B: Min gelek helbestên baş dinivîsîn, hemû dewrûbera min gelek ji helbestên min hez dikirin û di kombûnên me de daxwaz ji min dikirin da ez bixwînim. Nêzikî pencî helbestên min hebûn, hevalên min digotine min şairê Bazîdî. Rojekê polêsan li ser mala me de girt, li gel hemû pirtûkên min, ew deftera min ya helbestan jî birin. Paşê li pêş çavên min weku tiranê xwe bi min bikin, ew deftera min avêtine sobeyê û şewitandin. Wê gavê wesa li min hat weku parçeyek canê min di sobeyê de dişewite. Min careke din jî helbest nenivîsîn.

Kekê min, bajariyê min, Îhsan Aksoyî ez han dam da ji bo vê yekê pendên pêşiyar û îdyomên

Nêzikî pencî helbestên min hebûn, hevalên min digotine min şairê Bazîdî. Rojekê polêsan li ser mala me de girt, li gel hemû pirtûkên min, ew deftera min ya helbestan jî birin. Paşê li pêş çavên min weku tiranê xwe bi min bikin, ew deftera min avêtine sobeyê û şewitandin. Wê gavê wesa li min hat weku parçeyek canê min di sobeyê de dişewite.

Kurdî tomar bikim. Ez dikarim bibêjim, ez bi vê yekê ketime nav qada nivîsînê. Ji ber ku me çî binyateke xwendinê nîne, ez bi xwe fêr bûm, gelek kê m û kuriyên min hebûn, pêde pêde min ew jî durist kirin. Di zarokatiyê de fêrbûna zimanê zikmakî, gelekî girîng e.

N.G: Dema derbeya sala 1980ê de hûn hatine girtin û hûn paşê derketine dervayî welat, hûn çûn Yunanistanê? Dikarî behsa wê pêvajoyê bikî?

C. T. B: Dema ez piştî derbe-ya sala 1980ê hatime girtin, min

êşkencên gelekî giran xwarin. Tuşî her cure êşkencan bûm. Heta 52 rojan dibêjinê "Hilawistina Filistinî", ez di wê hilawistinê de mam. Hemû dosyayên min berê û yê nû kirin yek û rewşa min gelekî giran bû. Cara yekê di wê êşkencê de taya dilî ez girtim. Dadgeha leşkerî ya Stenbolê heta heyştê salan ji bo min cizayek diyar kir, paşê Diyarbekirê eve kir 10 sal. Bextê min hebû ez ji zindanê derketim û yekser min Tîrkiye bi cih hêla û çûme Yunanistanê.

N.G: Bi salan e tu Yunanistanê dijî, dikarî ji me re behsa jiyana xwe ya li vir bikî? Te li vir kîjan xebat pêş xistin, kîjan pirtûkên te der çûn?

C. T. B: Min ji Yunanistanê mafê penaberiyê wergirt, piştî çend salên din jî ez bûme welatiye wan. Berî ku ez behsa jiyana xwe ya li wê derê bikim, ez dikarim bibêjim, penaberî, ya rast biyanîbûn (xerîbî zehmet e) tiştê gelekî giran e. Nivê temenê min ji Kurdistanê dût çû. Lê bi giyan û hest çirkeyek jî ji Kurdistanê dût neçûm. Bi rastî gelek zehmet e ku ez behsa xema welat, xelk û endamên malbata xwe bikim. Ez niha gelek dilgiran im ku bikarim vê yekê bi rêka peyvan şîrove bikim. Çend pendeke ciwan e dibêjin "heçiyê dîtî, dizane."

Dema ez li Selîmiyê girtibûm, ji rêkxistina efû yê Navdewletî, ji bo girtiyên siyasî nameyên pişt-giriyê dihatin. Hemû sibehan em dibirine hewşê,



tiranê xwe bi me dikirin û didane ber dijûnan. Ji ber nameyekê gelek ture bûbûn, kaxez girtin avêtin, ew kaxeza hat li pêş min kete erdê, min girt û lê nihêrî. “minister of Greece” navek jî li ser hebû. Leşkerî kaxez ji destê min kêşa û kaxez diriya, beşa navî ma di nav destê min de, min ew nav di bîra xwe de girt. Piştî çend salan dema ez çûme Yunanistanê, ez li wî navî geriyam. (Wezîrê Avadaniyê Antonis Tritsis bû, heta mirina xwe ya sala 1992ê wek birayê min yê mezin bû). Ewî ez rêkirime Kopenhaga Danîmarkê, heta deh mehan li nexweşxanê mam, ji ber êşkencê ser laşê min, ez hatime sarêjkirin.

Bi alîkariya Tritsis, min serokwezîrê Yunanî û serokê partiya sosyalîst PASOK Andreas Papandreou û gelek wezîrên din nas kirin û li gel wan kar kir. Cara yekê sala 1989ê min di rojnameyeka Yunanî de dest bi kar kir. Sala 1993ê min li wezareta ragehandinê, dest bi karê rojnamegeriyê kir. Salên 1993-2004an, min rawêjkariya siyasî ya hemû wezîran kir. Hêjta di heman wezarete de rojnamegeriyê dikim.

N.G: Mamoste tu wan salên dawî li Kurdistanê jî ma yî. Dewleta Yunanistanê li Hewlêrê balyozxane vekir. Te li vir kar kir. Te li vir kîjan xebat pêş xistin? Yek jî tekiliyên Hewlêr û Atînayê jiyana te de çi guhartin çêkir?

C. T. B: Cara yekê sala 2003ê ez çûme Hewlêrê. Li ser Amman-Bexdayê, bi firokeyeke biçûk di nav rewşeke gelekî aloz de em çûn. Salên 2005-2007an ez li wê derê mam û ji bo çêbûna nûneratiya aboriya Yunanistanê, min alîkariya wan kir. Sala 2012an wek balyozê kulturî yê Yunanistanê ez çûme wê derê. Mixabin sala 2014an şer çêbû gazî min kirin û ez vegeyriyam. Havîna sala 2018an konsolxana Yunanî li Hewlêrê hate vekirin. Piştî demeke kurt, navê min wek balyozê ragehandinê hate pêş.

N.G: Dema mirov li berhemên we dinihêre, bi giranî ser herema we ye. Hûn di nivisandina xwe de jî welatê xwe qut nebûne. Dikarî me re çi bêjî?

C. T. B: Ji roja yekê karê min li Yunanistanê ew bû, ez bikarim lobiyekê çêbikim da rewşa gelê Kurd rabigehînim. Min hemû caran têkoşana neteweyî ji bo xwe kir erkekî serekî ku ez di her biwarê de piştgiriyê peyda bikim. Min rûdanên rastî, bi rêka romanê ragehand da dostên Yunanî da ku gelê Kurd baş nas bikin. 35 sal in ez dûrî welatê xwe me, lê qet jê neqetiyame, wek polîtîk û malbatî, min hemû caran peywendiyên xwe bi hêz kirin.

N.G: Em werin ser xelata Unesco a akademîk. Bi romana “Navê Min Azad e” xelat girtina te jî

bo hemû milletê Kurd bû serfiraziye û bextewariyek. Tu dikarî behsa wê pêvajoya xelatê bikî?

C. T. B: Romana min ya bi navê *Navê Min Azad* e tê de drama malbatekê heye ku vê malbatê piştî komkujiya Helebçeyê koç kiriye. Ji aliyê UNESCO ve hêjayî xelata Akademîk ya Taybet hate helsen-gandin. Xelat li ser navê hemû milletê Kurd hatiye wergirtin, romana min jî bi awayekî serkeftî çand, huner, dab û nerî û rewîştê gelê Kurd diyar dike. Di lista berbijêrên wê xelatê de cih girtiye. UNESCO vê xelata akademîk hem dide wergera romanê û hem jî nivîskarê wê. Min ev xelata li ser navê milletê Kurd wergirt. Ev xelat ya gelê Kurd e. Berî wê jî min xelat wergirtibûn.

Min lehengê romanê *Azad*, li Parîsê nas kir. Roman li ser drama malbatekê ye ku piştî jenosîda Helebçeyê ya sala 1988ê neçar dibin ku ji Kurdistanê derkevin. Ew dayik, bav, keç û kur ewilî diçine Îranê û paşî diçine Tirkîyê. Ew malbat hewl dide bi rêya çemê Merîçê derbazî Yunanistanê bibe û jî wir biçê welatên din yê Ewropa. Lê tenê zarokê bi navê *Azad* dikare derbazî Yunanistanê bibe; dayik, bav û xuşka wî jî aliyê Tirkîyê dihêne girtin û wan vedigerînine Iraqê. Ji malbatê re jî dihête gotin ku zarokê wan *Azad* di çemê Merîçê de xeniqiye.

Hevalekî min yê xelkê Yunanistanê li Parîsê jî min re got zarokêkî Kurd heye li vir tu dixwazî pê re biaxivî. Ez jî bi *Azad* re axivîm û çûme Parîsê û wî jî çirok û drama xwe ji bo min got. Min ew romana di sala 2005an de xilas kir, lê jî ber ku derhênerêkî Fransî dixwast wê çirokê weke rêzefilm bide weşandin min roman belav nekir. Lê pişt re jî ber hindêk arîşeyan, rêzefilm nehate çêkirin û min di 2015ê de roman bi zimanê Yunanî belav kir. Roman jî 400 rûpelan pêk tê û pişt re jî bo zimanên Îngilîzî û Spanyolî jî hate wergerandin. Dema ku bo Spanyolî hate wergerandin di gelek xelatan û listeyan de, hate nişandan.

Ez wek Kurdekî, yekem kes im ku bi zimanê Yunanî dinivîsim û ez hewl didim da di romanên xwe de edeba Kurdî bidime naskirin. Ez bûme yekem kes di nivîsinên xwe de pêkole dikim da bi her awayî rewşa gelê Kurd, ji bo Yunanan vegêrim. Ez li Yunanistanê wek yekem kes dihême zanîn ku nûneratiya êkola edeba Kurdî dikim.

N.G: Çiroka jiyana te nivîskarê Yunanî *Nikos Kaşdaxlîs* wek roman nivîsiye. Tu dikarî behsa wê romanê bikî?

C. T. B: Nivîskarê navdarê Yunanî *Nikos Kaşdaxlî* jiyana min, bi nava "Ararat Volkanan Dipijiqîne-Yadigariyên Kurdekî" wek roman nivîsî. Ev pirtûk sala 1995an wek baştirin roman hate hîlbijartin. Wek *Nikos* di hevpeyvîna xwe de dibêje, nezikî 50 demjimêran ez ji bo tomara kasê axivîm û *Nikos* jî eve kir romanek. Her çend di Romanê de navê min nebe jî, dewleta Tirk dizanî eve jiyana min e, fişarek zêde birine ser malbata min. Orişînalê pirtûkê sala 2008an û 2016an bi navê "Zarokên Araratê" hate çapkirin.

N.G: Di dewleta Yunanistanê de ji te re dengêkî bilind dibêjin avakarekî êkola edebiyata Kurdî. Gelo tu ser wê mijarê dikarî çî bêjî ji me re?

C. T. B: Ez wek Kurdekî, yekem kes im ku bi zimanê Yunanî dinivîsim û ez hewl didim da di romanên xwe de edeba Kurdî bidime naskirin. Ez bûme yekem kes di nivîsinên xwe de pêkole dikim da bi her awayî rewşa gelê Kurd, ji bo Yunanan vegêrim. Ez li Yunanistanê wek yekem kes dihême zanîn ku nûneratiya êkola edeba Kurdî dikim. Di ragehandina Yunanî de, ez jî ber kar û xebatên xwe bi vî awayî dihême diyarkirin. Dema ragehandina Yunanî behsa min dike, dibêje; "welatiyê Kurd, Yunan û cîhanî."

N.G: Heta niha çend kitêbên te derketine? Tu dikarî me re behsa wan kitêban bikî?

C. T. B: Bi giştî heta niha ew pirtûkên min bi zimanê Yunanî hatine çapkirin. Berfin *Di Nav Xwinê De Ye* (2001, Atîna), *Çavên Gurgî* (2003, Atîna), *Şeva ku Li Rojê Dinêre* (2006, Atîna), *Zarokên Çiyayê Agirî* (2008-2016, Atîna), *Xwedê Li Wir Nivîstî Bû* (2013, Atîna), *Navê Min Azad e* (2015, Atîna). **Vekolîn:** *Zanayên Dêrînî yê Kurdên Êzdî* (2013,

Atîna), Antolojiya Helbesta Kurdî (2017, Atîna), Reng, Ramanê Didine Jiyana Me - album (2017, Atîna).

Romana min ya nû li ber çapê ye, her wekî din, ji wan nivîsên ku min di rojnameyan de nivîsîne, hîlbijartinek çêkir bi alîkariya kome-la nivîskarên Yunanistanê, ez wê jî di demek nêzîk de dikime pirtûkek.

N.G: Mamoste Cemil, di axaftina te yî îro de hûn behsa Mahmûd Efendî dikin. Tu dikarî mesela Mahmûd Efendî dorfireh ji me re qal bikî?

C. T. B: Mehmûd Beg Bazîdî (Musa Axazade Îsmailoxlu Mehmûd Efendî 1918-1924 Şaredarê Bazîdê) kekê hevjiîna Biroyê Hesikê Têlî Rabia Xanimê, endamê damezrênerê rêkxistina Xoybûnê, nûnerê rêkxistinê li Bazîdê. Kesayetek girîng e ku Biro Axa gelekî rêzê lê digre û jê bawer dike. Peywendiyê di navbera Xoybûn û Biro Axa de durist dike. Ew kes Biro Axayî razî dike da femandariya Îhsan Nuri Paşa pesend bike û rê bidê.

Dema fermanên Xoybûnê bi rêka mirovê xwe rê dike çiyayê Agiriyê, ew kes ji layê leşkerên Tirk ve dihête girtin. Lê ji ber ku gelek bi hêz e li Bazîdê, dewlet nikare tiştekî lê bike. Lê bi paytonê wî mişextî Trabzonê, ji wê derê jî, bi keştiyê verê dikine Stenbolê. Piştî ji bendera Trabzonê rê dikeve, malbata wî di kabîneyekê de kilîlê dikin, Mehmûd Efendî jî di keştiyê de dihête fetisandin û termê wî dikine telîsekî û diavêjine deryayê. Dibêjine malbata wî, ji keştiyê ketiye û xeniqiyê. Abdullah Ozturkê bavê Talat Ozturkî ku şahidê vê rûdanê ye, li benderê, malbata Mehmûd Efendî direvîne. Li ser Bazîde wan digehîne Xoya bajarê Îranê.

Di derbarê Mehmûd Efendî de, vekolere Fransî bi awayekî berfireh dinivîse û wesa şîro-



ve dike: “Dema ez li Beyrûtê bûm, min dûvçûna Xoybûnê fikir. Rewşa Araratê û amadekariyên Xoybûnê di nav zanyariyên me de bûn. Ji bo ez dûvçûna vê serhildanê bikim, ez hatime hinartin ji bo çiyayê Agiriyê. Navê şaredarê berê yê Bazîdê li gel min bû da ez bikarim jê zanya-

riyan wergirim. Piştî ez du rojan li Bazîdê mam, ez pê hesiyam ev kes li gundê xwe Çilkotanê ye. Ez dema çûme wê derê, mixabin ne li wê derê bû, gotine min, zomeke wî heye li Çiyayê Agiriyê bi navê Kottenberiyê. Dema ez pê hesiyam dê heta çend rojan venegere, bi rêvîngiyê zehmet ez çûme Kottenberiyê. Dema min ew nas kir, ez têgehiştim ku seraray hemû zehmetiyan eve karek berkeftî ye. Dema min Fransiya wî ya nayab bihîst ez gelekî pê xweş bûm. Li Kottenberaya Çiyayê Agiriyê, mirovekî centilmen beramberî min bû, pênc ziman dizanî Rûsî, Fransî, Erebi, Farisî. Ez heta du rojan bûme mêvanê wî. Ji axaftina me, ez têgehiştim ew beramberî zavê xwe Biro Axayî xwedan rêz û viyanê mezin e. Herdu jî beramberî hev xwedan heman hest û viyanê bûn. Ji ber ku Biro dilê buriyê xwe nehêlabû, pesend kiribû ku Îhsan Nuri Paşa bihête Agiriyê. Li ser vê yekê jî Paşa rê ketibû da xwe bigehîne Agiriyê.”

Nezîkî salekê, min ji belgîyên saluxgeriya me xwend ku Mehmûd Efendî Bazîdî ji layê Tirkan ve hatiye xeniqandin û avêtine ava deryayê. Dapîra min Fatimeyê hemû jiyana xwe bi xema kuştina birayê xwe borand. Paşê jî ew rûdana Mehmûd Efendî hemû caran hate pêş malbatê.

Kurê Bekir Efendiyê neviyê Îsmail Efendî, Nusredînê ku bi şûmî hatiye mezinkirin (mamê min) dema diçe leşkeriyê, ji ber dosya xalê xwe, lê didin û êşkencên giran lê dikin. Karên zehmet



Mehmûd Beg Bazîdî (Musa Axazade İsmailoğlu Mehmed Efendi 1918-1924 Şaredarê Bazîdê) kekê hevîna Biroyê Hesikê Têlî Rabla Xanimê, endamê damezrênerê rêkxistina Xoybûnê, nûnerê rêkxistinê II Bazîdê. Kesayetek girîng e ku Biro Axa gelekî rêzê lê digre û jê bawer dike. Peywendiyê di navbera Xoybûn û Biro Axa de durist dike. Ew kes Biro Axayî razî dike da femandariya İhsan Nuri Paşa pesend bike û rê bidê.

didine pêş wî. Dema piştî du salan vedigere malê, derûniya wî gelek têk diçe. (Êdî mirovek nivco ye, ji tariyê, deng, avê ditirse, zû bi zû ji mirovan bawer dike). Ji ber ku li bajêr xizmetên tenduristiyê nînin, nikare xwe derman ji bike.

Bavê min Fexredîn ji bo xwendina navîn ku wan deman hindî zankoyekê girîng bû, diçe bajarê Agiriya ku 100 km dûrî Bazîdê ye. Mirovekî gelek zîrek û bîrkariya wî gelek bi hêz bû. Li şaredariya ku xalê wî serokê wê yê damezrêner bû, heta 30 salan berpirsiya ji mîrkariyê dike. Fransiyekê gelekî baş dizanî. (Di 10 saliya xwe de li gel xalê xwe, Mehmûdî xwe fêrî zimanê Fransî dike). Hemû caran digot ev heza min ya beramberî Fransî, ji ber xalê min Mehmûd e.

Ji ber ku em li Bazîdê malbatek bi hêz bûn û bavê min xwedan kesayetek rêzgirtî bû, seraray hêriş û fişarên dewletê nebûn jî, sibeha derbeya leşkerî ya sala 1960ê bi dizîka ew ji malê birin û li zindana leşkeriyê de bi tena xwe girêdan. Li bajêr ew tenê hate girtin.

Bavê min bi salan, ji bo dayika xwe ya ber mirina birayê xwe ketî, xem xwar, ji layekî din ve jî, hemû rojan li pêş çavên wî, xema birayê xwe dixwar ew birayê ku ji layê kesan ve dihate xapandin û cilên wî, parê wî jê dihatine stendin.

Piştî derbeya leşkerî ya sala 1971ê (ji bo me jî ji dest xwe nede) koç kir û çû Stenbolê. Piştî derba

12 rezbera 1980ê ez hatime girtin û paşî çûme Yunanistanê, vê yekê jî xema bavê min girantir kir. Bavê min çî caran xema xwe nedigihande malbatê. Heta 25 salan me hev nedît. Sê sal berî mirina wî, (salê 15 rojan) me dikarî em hev bibînin. Hemû rojên me bi vegêrana rojên berê, borîn. Min û wî me her behsa demên berê dikir.

N.G: Di nav Kurdan de bi piranî jî Kurdên ciwan ên zanîngihan de mêyla lêkolînên Kurdî di salên dawî de zêde dibe. Hûn ji tecrûbeyên xwe çî pêşniyazan bo wan bikin?

C. T. B: Sala 2018an ji deh kesan zêdetir mirovên Kurd, li biwarên cuda cuda xelatên navdewletî wergirtin. Hemû jî bi encama kar û xebatên me yên giranbiha, hatine wergirtin. Kesekî çî tiştek nebexişandiyê. Heger zarokê gelê bêdewlet û ji layê UNê ve nehatiye naskirin, bikare xelata UNESCO yan jî NOBELê werbigire, evca heger dewleta me hebe, em ne bê xwedan bin, bila hingê bibînin ka zarokên Kurd dikarin çî tiştan bikin.

Ez pê bawer dikim ku ew rojên xweş nêzik in. Çî kes nikare tîjkên rojê tarî bike.

N.G: Mamostecan gelek gelek sipasiya te dikim ji bo bersivên te, her şad û bextewar bî, xweş bî.

C. T. B: Nihad can sipasiya te dikim. ✨

Zar, ziman û jiyay

NASIR KEMALOĞLU

Zimanê me bi axaftin, nivisandin û jiyanê ke kurdewarî li ser xwe disekine û zindî dimîne. Ji bo parastin, zindîmayîn û dewlemendkirina zimanê me hemû kes, dezgeh û sazî, divê xebat û xîretên xwe û têkarî û alîkariyên xwe îhmal nekin. Kesên ku ji zimanê xwe dûr bikevin ji çand, hebûn, kesayetî û nasnameya xwe jî dûr dikevin. Ziman mayîndeyek zêrîn e. Ji bo ku em jiyay û berdewamiyê bidin zimanê xwe pêwîst e ku em zar û zêçên xwe ji vê mayîndeya zêrîn bêpar nehêlin.

Di navbera kesan de, danûstandin û neqilkirina xeber, agahdarî, hîs û ramanan re “ragihandin” tê gotin. Gelek alav û derfetên ragihandinê hene. Lêbelê hewceyî û alava herî girîng ziman e. Hêmanên bingehîn yên ku insanan ji heyînen

dinê cuda dike aqil û axaftin e. Meriv bi taybetî ji dayika xwe û ji civaka ku tê de dijî zimanê dayikê dibihîze û hîn dibe. Her wiha ziman jî ji merivan re dibe sedema kesayeta civakî û neteweyî. Li ku derê jiyay hebe, li wê derê jî qisedan heye ango qisedan jî bi ziman çêdibe. Ziman û jiyay merivan bi hev ve girêdayî ne. Eger me zimanê xwe bi jiyay xwe ve berdewam nekir û me zar û zêçên xwe re bi zimanê xwe yê dayikê qise nekir, em dibin sedema lawazbûn û windabûna zimanê xwe. Bi vî awayî jî em asimilasyon û dûrketina ziman û kesayeta neteweyî bi destên xwe dikin! Divê em berpirsiyariya neteweyî ya bikaranîna ziman û çanda xwe binin çî!

Kurdan gelek rewşên xirab derbas kirine. Di şert û mercên giran de û di bin asimilasyoneke dijwar de jî hebûna xwe parastine. Gund, bajar

û warên me hatin şewitandin, berhemên me yên dîrokî hatin rûxandin, tiştên ku hebûna me binin ziman hatin windakirin û me koç û koçberî dît, dîsa jî em li ser xwe mane û me kesayeta xwe parastîye. Bi sed salan bê nivîsandin û xwendin mabe jî, bi alîkariya wêjeya devkî, bi taybetî bi rêzik û qeydeyên jiyaneke kurdewarî zimanê me zindî maye. Lêbelê îro jî ber ku em bi şert û mercên negatîf yên asîmîlasyonê dorpêç bûne rewşa berdewamkirina zimanê me gelekî dijwar e. Ev rewşa hanê bila nebe sedema lawaziya bikaranîna zimanê me. Divê em têkoşîna zindîtiya zimanê xwe bi derfet û alavên hemdemî bidin. Li ku derê dibe bila bibe perwerdeya bi zimanê dayikê jî bo merivan mafekî herî girîng û bingehîn e. Li ser me hemû Kurdan berxwedan û têkoşîna axaftin, bikaranîn û perwerdeya zimanê me yê dayikê ferz e.

Ziman û kesayeta netewan bi hev ve girêdayî ne û hebûn û tunebûna hevdu ne. Zimanê dayikê dibe yekemîn bingeha girîng ya kesayeta merivan û neteweyan. Kesayeta neteweyî bi hebûna zimanê dayikê çêdibe. Netewe ji ber ku hebûna xwe bidomînin divê zimanê xwe yê dayikê biparêzin û di hemû qadên jiyane de bi kar binin. Meriv çiqas zimanê xwe biparêze ewqas jî hebûna xwe diparêze. Em çiqas rûmet û qîmetê bidin zimanê xwe ewqas jî didin xwe û neteweya xwe.

Berdewamiya jiyane bi zarokên me çêdibe. Her wiha bi zar û zêçan ve qisedana zimanê Kurdî, jiyane dide zimanê me û wî zindî dihêle. Em kîjan zimanî bi zarokên xwe re qisebikin, ew zimana jî zarokên me re dibe zimanê dayikê! Ji ber vê yekê em Kurd, pêwîst e ku zarokên xwe bi Kurdî "gocî û mezin" bikin! Nexş û rengê zimanê xwe di hiş û dilên wan de mayînde bikin! Wextê me di qada ziman û çandê de berpirsiyariya dayik û bavtiyê anî cî em bextewar û serbilind dibin!

Ziman û kesayeta netewan bi hev ve girêdayî ne û hebûn û tunebûna hevdu ne. Zimanê dayikê dibe yekemîn bingeha girîng ya kesayeta merivan û neteweyan. Kesayeta neteweyî bi hebûna zimanê dayikê çêdibe. Netewe ji ber ku hebûna xwe bidomînin divê zimanê xwe yê dayikê biparêzin û di hemû qadên jiyane de bi kar binin.

Eger navên zarokên me navên Kurdî bin û em jî bi wan re di malên xwe de Kurdî qise nekin û wan jî çand û zimanê Kurdî bêpar û mehrûm bihêlin, gelo em çi navî li vê rewşê bikin?

Dema ku ziman ji jiyana rojane, ji çandê, nivîsê û qadên zanistiyê derket mehkûmê mirinê dibe. Netewe û civakên ku zimanê xwe neparêzin û rûmetê nedin zimanê xwe di binê bandora ziman, çand û hunerên din de dimînin û ji çand, huner û zimanên xwe û ji kesayeta xwe ya neteweyî dûr û biyanî dikevin. Winda-

bûna zimanan, windabûna civak, gel û neteweyan e. Ji ber wê yekê bikaranîna ziman, hebûn û tunebûna neteweyan e û xerxa yekîtiyê ye. Di nava têgehên ku pênasîya neteweyan çêdikin de ya herî girîng "ziman" e. Divê em hemû Kurd li vê têgeh û nixê herî girîng û pîroz xwedî derkevin û biparêzin! An na, em di nav kîjan şert û mercê de û di kîjan erdnîgariyê de bijîn, bi kesayeta xwe ya neteweyî nayên naskirin ango Kurd nayên he-sibandin!

Feylezofo û perwerdenasê Almanî *Wilhelm Von Humboldt*: "Welatê rastî yê neteweyan zimanê wan e, ziman jî bo diyarkirina daxwazê neteweyî, heyîniyeke xurt e. Wextê zimanê neteweyî winda bibe, di wextekî kurt de dibe ku hîsên neteweyî jî winda bin." gotiye. Her wiha bal kişandiye ser pêwendîya ziman û kesayeta neteweyan. Nivîskarê Kurd *Osman Sebrî* jî ji bo girîngiya parastin û bikaranîna ziman wiha gotiye: "Ger tu bixwazî welatparêziya kesekî nas bikî, lê binêre ka çiqasî li zimanê xwe xwedî dertê." Belê wisa ye, welatparêzî û neteweperwerî girêdayî axaftina ziman e! Ji bo parastina kesayeta neteweyî çek û sileha herî mezin axaftin û nivîsandina zimanê dayikê ye. Di qisedan û bikaranîna zimanê dayikê de her bêjeyek dibe "kevîrek" li nav çavên nijadperest û desthilatdaran dikeve! *Bikaranîn û nivîsandina*

zimanê dayikê ji merivan re xîret û rûmet e. Divê meriv bêxîretî û bêrûmetiyê neke!

Kurdî di erdnîgariya xwe de di binê tesîra înkari û asîmilasyonê de bi sed salan maye. Lê miqabil bi alîkariya berhemên wêjeya devkî û bi axaftin, lorî û lawikên dayikan winda nebûye û zindî maye. Bikaranîn û qisedana zimanê dayikê kesayeta neteweyan zindî dihêle. Ji ber vê yekê ez li ber hemû kesên ku bûne sedemên zindîmayîna zimanê me û yên ku di mal û malbatên xwe de Kurdî bi kar anîne û bi kar tinin bejna xwe ditewînim. Kurdî çiqas qedexe bûye ewqas ji bi xîret û alîkariya dayikan û gelê me bi rewşeke xwezayî zindîti û dewlemendiya xwe berdewam kiriye û xwe parastîye. Ji ber ku Kurdî zimanekî bi nîrx, bi rêzik û qeydeyên taybet û dewlemend e her wiha li ser xwe maye û winda nebûye.

Zindîmayîna zimanan bi alîkariya zar û dayikan çêdibe. Eger zar û dayikên me nebin ziman ji berdewam nabe! Dayik ziman hîn dikin, zar ji neqlî pêşerojê dikin û bi vî awayî ziman zindî dimîne û mayînde dibe. Ji bo ku zimanê me li ser xwe û zindî bimîne, em hemû Kurd, di jiyana rojane de, di mal û malbatên xwe de, di îş û karên xwe de, di sazî û dezgehan de, di danûstandin û bazarên de pêwîst e ku bi xwezayî bi hev re bi zimanê xwe qise bikin û bi kar binin.

Ziman zindî ye, bi jiyana însan û civakan ve diherike û dimeşe. Çawa me ji mezinên xwe mayînde û emanet girtiye wisa ji bi dewlemendî û rengîniya wî, îro bi navgîn û derfetên rojane divê em ji teslîmê pêşerojê û zar û zêçên xwe bikin. Ziman hebûn û nasnameya me ya neteweyî diyar dike. Hetanî bikaranîna ziman hebe û hetanî jiyana yên ku bi kar tinin hebe ziman ji zindîtiya xwe berdewam dike.

Meriv bi loriyên zimanê xwe yê dayikê çavên xwe vedike û zimanê merivan dibe qedera merivan ya herî pîroz. Wextê meriv bi zimanê xwe hîs û ramanên xwe tîne ziman, ji merivan re hêsanî çêdibe, wek meriv bi serê bendekî bigire û bikişîne bêj, hevok bê navber li pey hev diherikin. Her wiha gotineke aram û azad derdikeve holê. Ji bo girîngiya vê mijarê gotineke peşiyana de “*Hişê*

bi zimanê dereke fikirî dil e.” hatiye gotin ku bi zimanê dayikê hiş û aqilê merivan ji azad û aram e. Tehm û tewaşa vegotîneke sade û bi dil û can bi zimanê dayikê hêsan û xweş e.

Divê em zarên xwe ji gund û bajarên xwe dûr nehêlin. Ji ber ku berdewamiya ziman û çandê pêk bînin pêwendiyên wan ji kalik û pîrikên wan û ji endamên malbatê neqetînin! Eger em fersenda qisedan û bikaranîna zimanê dayikê nedin zarokên xwe, em wan ji xewn û xeyalên wan yên şîrîn û şekir û jiyanêke kurdewarî bêpar dihêlin. Her wiha em fikr û ramanên ku pê problem û tengasiyên xwe çareser dikin ji destên wan digirin!

Ji cahil û nezanan bigire hetanî rewşenbîran em îro bi her awayî ji bikaranîna zimanê xwe yê dayikê dûr dikevin. Eger em di malên xwe de û di nav malbatên xwe de zimanê xwe qise nekin, dibin sedemên bîrvekirina zimanê xwe. Ji ber vê yekê, em di kîjan rewşê de dibin bila bibin, bi zarokên xwe re Kurdî biaxivin û berdewamiya zimanê xwe pêk bînin. Divê Kurdiya ku em qise dikin “*xwezayî*” be. Çawa xwezayîya her tiştî berdewamiya wî heye, zimanê ku bi xwezayî tê qisedanê ji berdewamiya wî çêdibe û winda nabe. Zimanê dayikê, xweşî û xwezayîyê dide axaftina merivan û li ser dilê merivan tê neqîşandin û her wiha ji bîr nabe.

Qisedana herî xweş û pîroz qisedana gelêrî ye. Hinek kesên ku xwe “*rewşenbîr û nivîskar*” dihesibînin, zimanekî çêkirî li ser gelê me ferz dikin. Bêjeyên ku em pê mezin bûne bi kar nayînin û nanivîsînin. Her wiha gelek bêjeyên ji vac û ruhê Kurmancî dîr, bi zorê dikin hebanok û ferhenga zimanê me. Bi rêzik û qeydeyên çêkirî û bi zorê ziman dewlemend nabin. Yên ku ziman baş nizanin, wextê dikevin “*tengasiyê*” ji ber xwe bêjeyan derdixin her wiha bêjeyên ji ruhê Kurmancî dîr bi kar tinin û aheng û rengê zimanê me xirab dikin. Tu dibêjî qey qisedana ku bi bêjeyên “*çêkirî û sosret*” pileya wan bilind dike! Wextê zar û zêçen me bi van bêjeyan qisedikin “*tew*” li zimanê wan dikeve û bend dikeve navbera qisedan û ramanên wan û qisedaneke herikbar û fêmbar nikarin bikin! Di binê bandora vê rewşê de, di rûyê bêjeyên

çêkirî û sosret de, zar û zêçên me -ji xwe zimanê xwe kêm dizanin- tiştên ku dizanin ji bîr ve dikin, di qisedanê de matmayî dimînin û meriv dibêje qey “fêmkorî” dibin!

Eger meriv “zimannas û etîmolog” nebe, divê wêrekî û heqê guhertin û şirovekirina rêzik û qeydeyên ziman û çêkirina bêjeyan jî di xwe de nebîne! Her wiha xwezayîya ziman jî xirab neke!

Em zimanekî çêkirî bidin zarokên xwe, ji ber ku Kurdî kêmtir dizanin û qise nakin, ser hev em tîrsa “rû bi rû qisedana Kurdî” dikin dilê wan û em dibin sedemên dûrketina ziman û kesayeta wan ya neteweyî. Meriv zimanê dayikê bêrêzik û qeyde û xwezayî ji dayik, malbat, civak û ji der û dorên xwe bê perwerde û bê bandor hîn dibe. Divê em hevdu rihet berdîn, heta ji destê me tê hezkirina çand û zimanê xwe bikin dilê zar û zêçên xwe.

Gel bi gorî hewceyî, îmkan û derfetên xwe zimanê xwe dewlemend û zindî dihêle. Di qisedanê de divê meriv rihet be. Di herikandina qisedanê de kîjan bêje bi dest ket meriv bi kar bîne baştir e. Hewce nîne ku meriv li bêjeyan bigere! Di qisedanê de bêjeyên em bi kar tînin ji kîjan zimanî dibe bila bibe em bi kar bînin “dinya xirab” nabe! Di dinyayê de tu zimanek “homojen” nîne. Di hemû zimanan de bêjeyên biyanî hene û bikaranîna bêjeyên biyanî ji zimanan re kêmasî nîne. Bikaranîneke hevbeş û zelal ragihandînek rast çêdike. Bêje ji kîjan zarava û zimanan dibe bila bibe pêwîst e ku di nav me de hevkar be! Bikaranîna bêjeyan, hevkar û hevbeş nebe û kesane be, di zimanê me de her wiha di ragihandinê de tevlihevî û alozî çêdibe! Ji ber vê yekê, berê her tiştî pêwîst e ku, bi rewşeke xwezayî em qisedan, xwendin û nivîsandina zimanê xwe teşwîq bikin.

Wextê em li kilam, lorî, çîrok, xewroşk û destanên xwe mêze dikin, çiqas bêjeyên xas û xweş hatine bikaranîn, çiqas li guhê merivan xweş tînin û xem û xeyalên merivan xweş tînin ziman! Van berhemên hanê bi qelem û defteran bi dest neketine, bi awayekî xwezayî û ji dil û can û devkî derketine holê. Ji ber ku çavkaniyên xwe ji jiyana merivan û civakan girtine û bi zimanekî gelerî ha-

tine neqîşandin, nayên bîrvekirin. Çiqas sal, dem û dewran derbas bibin jî wek cewher dibiriqin û roj bi roj giranbiha dibin.

Hewceyîya me ya herî girîng hînbûn û bikaranîna zimanekî hevkar e. Zarokên me çiqasî bixwînin û perwerdehiyê bi zimanê dayikê bibînin ewqas jî wê Kurdiya me pêş dikeve. Ji bo zimanê me zindî bimîne divê em bixwînin, binivîsînin û di qadên muzîk, wêje û çandê de xebat û lêkolînan bikin! Divê em fersend, alîkarî û quwetê bidin yê ku li ser ziman û çanda me xebat û lêkolînan dikin û em qîmet û rûmetê bidin wan. Ziman ji bo mirovahiyê pêmayîyeke hevbeş e divê em vê pêmayîyê biparêzin û mayînde bikin.

Bi hêviya bikaranîn, axaftin û dîrneketina ziman û çanda Kurdî, pêwîst e ku em hemû Kurd dewlemendkinin û xwedîderketina zimanê xwe berdewam bikin. Ez dixwazim û bendewar im ku di pêşerojê de ji bo dewlemendbûn û zindîmayîna zimanê me, zanyar û pispor zêde bibin û li ser xeta “xwezayî” û bi bingeheş zanistî yê ziman hemû şaşî û çewtiyên zimanê me rast bikin.

Çavkanî

1. Ronahî, Reşo, Ziman bêyî jiyana nabe, <https://www.evrenselnet.com/haber/28204/ziman-by-jiyan-nabe>
2. Kemaloğlu, Nasir, “Alozî û Tevlihevîyên di Kurmandî de”, *Nûbihar*, hejmar 145
3. Yıldırımçakar, Adil, *Bedluzzeran û Medresetuzzehera*, Weşanxaneyê Nûbiharê, Istanbul 2018
4. Kemaloğlu, Nasir, Roja Zimanê Dayikê, <http://candname.com/roja-zimane-dayike-2/>
5. <http://candname.com/li-ser-giringiya-ziman-hin-gotin-u-helbest/>
6. https://fr.wikipedia.org/wiki/Langue_maternelle
7. <https://www.cairn.info/revue-ela-2003-2-page-137.htm>, la langue maternelle
8. <https://www.ceviriblog.com/2017/10/25/dunyada-kaybolmaya-yuz-tutmus-diller/>
9. Roja Zimanê Zikmakî ya Navneteweyî, <http://www.rupelanu.com/roja-zimane-zikmakî-ya-navneteweyî-3153n.htm>
10. <https://www.makaleler.com/dilin-tanimi-ve-dil-kavraminin-bo-yutlari>
11. http://turkoloji.cu.edu.tr/DIL_SORUNLARI/ayse_bascetlncelik_dil_toplumun_onurudur.pdf
12. http://egitimsen.org.tr/wp-content/uploads/2016/03/Anadilinin_Önemi-Anadilde_Egitim.pdf

Ji hêla naverokê ve analîzkirina pirtûka Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo

DILAZAD A.R.T

Destpêk
Di vê xebatê de emê li ser romana Kurdî ya yekemîn an ku romana Erebe Şemo ya bi navê *Şivanê Kurmanca* ji hêla naverokê ve bi awayekî analîtîk/danasîn birawestin. Di vê xebatê de li ser danasîna romanê, hûnandina bûyeran, tema û mijarên sereke û zimanê ku di romanê de hatiye bikaranîn birawestin.¹ Armanca vê xebatê danasîna pirtûka *Şivanê Kurmanca* ye. Ev pirtûk ji bo modernîteya edebî ya Kurdî di şaxa romanê de destpêkeke girîng e.

Bejeyên Sereke: *Şivanê Kurmanca, Erebe Şemo, Kurd, Şoreşa Bolşevîkan*

1. Danasîna Romana Şivanê Kurmanca

Pirtûka *Şivanê Kurmanca* ji aliyê Erebe Şamilov ve hatiye nivîsîn. Erebe Şamilov bi navê Erebe Şemo hatiye nasîn. Pirtûk cara yekem li Ermenîstanê ji hêla Neşra Hukûmata Rewanê di sala 1935an de hatiye çapkirin. Ev pirtûk wek destpêka romana Kurdî tê pêjirandin. Cara pêşî bi alfabeya kirilî hatiye nivîsandin. Berhema di destê me de ya ku emê li ser bixebitin ji aliyê Weşanxaneyê Lîs ve di sala 2015an de li Amedê hatiye çapkirin. Ev pirtûk ji hêla Mustefa Aydogan ve hatiye amadekirin. Erebe Şemo vê pirtûka xwe diyarî komunîstên Kurd dike:


“Pêşkeşî komsomolê kurmanca dikim. Erebe Şamilov.” (r. 9)

Pirtûk, otobiyografî ye. Di vê romanê de Şemo jiyana xwe bi awayekî kronolojîk nivîsandîye. Pirtûk bi tevahî 156 rûpel e. Pirtûk ji 21beşan pêk tê. Naveroka pirtûkê ji van beşan pêktê:

Kulfetê me. Zaroktiya min
Merkeba me. Rêncberiya nava 'melegana'
Gur nav pêz ket. Hicûma gura
Çî teranê 'vîlkê?'
Xwendina ewlîn. Mêtrika min
Hukum
Nava kurmancada. Biharê li dolgê
Li zozana
Mijûliya me
Hazirkirana hasil
Li dagerê. Rojêd ezîze paîzê-beranberdan
Pezê undabûy. Mirana birê min
Li şherda. Şerê Împêrialîsta
Dilketin û destrûgarî
Li welatê Dameda. Kîlama Stiyabendê Silêvîn û Xedcê
Xaîş dikim. Xwe nekine kifara gulla min. Ve-gerandina min li mal
Li firqêda
Li Ûrisêtê
Înglaba Oktyabrê
Şerê grajdaniye
Dîsa nava kurmanca

2. Jiyana Ereb Şemo

Ereb Şemo di sala 1897an de li bajarê Qersê li gundê Sûsîzê hatiye dinyayê. Di salên 1914-1916an wek wergervanekî di nav arteşa Rûsan de cih digre. Di sala 1920an de li Moskovayê di zanîngeha Lazaryan de xwendina xwe didomîne. Sala 1924an de wek kesekî ku Kurdan hînî şoreşa Bolşevîkan bike bi wezîfedarî tê nav Kurdan. Di sala 1928an de Ereb Şemo û Îsahak Mêrangûlav bi hev re elfabeyeke Kurdî amade dikin. Di sala 1930yî de dibe yek ji wan kesan ku rojnameya *Reya Teze* ava dikin û heman salê sê berheman diweşîne. Sala 1930yî nivîsên wî yên bi navên "Emirê Lénîn", "Terîqa rêvolûsya Oktyabrê", "Kolxoz û kara wê gundiya ra" tên weşandin. Di sala 1935an de romana yekem ya zimanê Kurdî *Şivanê Kurmanca* tê weşandin. Di sala 1937an de



Ereb Şemo

Ereb Şemo sirgûnî Sibiryayê dibe. Ev sirgûn di sala 1956an de bi dawî dibe. Ereb Şemo di sala 1978an de wefat kiriye.²

Berhemên Ereb Şemo:

Şivanê Kurmanca, 1935
Kurdên Elegozê, 1936,
Berbang, 1959
Jiyana Bextewar, 1959
Dimdim, 1969
Hopo, 1969³

3. Kurteya Şivanê Kurmanca

Şemo (Bavê Ereb Şemo) Kurdekî belengaz û xizan e. Şivantî û gavantiyê dike. Piştî ku jina wî dimirê ew û herdu zarokên xwe Biro û Dewrêş koçî gundê Azatê dikin. Li vir jî rêncbertiyê dike. Li gundê Azatê bi jineke Kurmanc re dizewice û ji vê jinê jî Ereb û du keç (Çîçek û Gogê) têne dinyayê. Ereb hê di zaroktiya xwe de alîkariya bavê xwe dike an ku şivantiyê dike. Dema şivantiyê dikin bi tunebûnê re rû bi rû dimînin. Li gundekî dema şivantiyê dikin rastî mamosteyeke jin tên û ev jinik têdigihejê ku Ereb zarokekî jîr e. Ereb dide xwendin û wek xebatkarê dibistanê jî karekî dide Ereb. Di dibistanê de Ereb bi jîrekiya xwe ferî xwendin û nivîsandine dibe. Li gor mercên jiyanê cihê malbata Şemo her dem tê guhertin. Bi vî awayî Ereb û malbata xwe ji neçarî li gelek gund û bajarên derdora Qersê gavantî û

rêncberiyê dîkin. Zivistanan di nav gund û şîkêftan de şîvantî û rêncbertiyê dîkin. Dema ku dibe bihar ji bo xwedîkirina pez derdikevin zozanan. Bi vî awayî Erebb Şemo heta digihêje temenê ciwanîyê jiyana xwe bi şîvantî û rêncberiyê didomîne.

Piştî ku Şerê Cihanê yê Yekem dest pê dîke ji ber ku Erebb çend zimanan dizane serleşkerên Rûs wî wekî wergêr dixin nav artêşe. Erebb di nav şer de wergerê dîke û rê nîşanî leşkerên Rûs dîde. Di van xebatan de Erebb bi Bolşevîkan re hevnas dibe. Heta şoreşa Bolşevîkan ya sala 1917an wek kesekî çalak dixebite. Şemo hem wek leşkerekî li meydana şer wek şoreşvanekî şer dîke hem jî li hember serdestiya çîna dînî (şêx), çîna feodal (axa) û çîna emperyal (dewlemend) şoreşeke bêhempa dîke. Li hember leşkerên qral şer dîke. Piştî serfiraziya şoreşê Erebb wek kesê ku şoreşê bi Kurmanca an ku Kurda re bide fêmkirin tê wezîfedarkirin. Di dawîya romanê de Şemo wek kesekî ku berpirs-yarê civaka Kurd e, di nav Kurdan de digere, gilî û gazincên mirovên Kurd yê ku ji destê axa, şêx û dewlemendan zilm û zordarî dîtine, guhdar dîke.

4. Vegêr û Bergeh

Ev pirtûk romanê otobiyografîk e. Ji ber vîna ye ku nivîskarê romanê jiyana xwe nivîsiye. Bûyer li gor mantiqê kesê yekem an ku ew jî Erebb Şemo ye, hatiye gotin. Roman bi vegêra kesê yekem hatiye gotin an ku nivîsandin. Nivîskarê romanê di heman demê de lêhengê romanê ye jî. Ji ber vîna ye ku di romanê de bergeha Xwedayî hatiye bikaranîn. Şemo ji ber ku jiyana xwe nivîsandiye, heta devera ku roman bi dawî bûye serdestê tevî bûyeran e. Ji ber ku Şemo jiyana xwe nivîsandiye di romanê de zimanekî dema borî hatiye bikaranîn.

5. Hûnandina Bûyeran

Di romana *Şivanê Kurmanca* de mijara sereke jiyana û serboriya Erebb Şemo ye. Lê eger em romanê li gor bûyeran bi beş bikin du beşên sereke derdikevin pêş. Ji dayikbûnê heta Şerê Cihanê yê Yekemîn jiyana Erebb Şemo ya gundî, şîvantî, rêncbertî û zor û zehmetiyên ku hatine kişandin

romanê dixemilînin. Ji destpêka şer heta sala 1924an jî jiyana Erebb Şemo ya ku di nava artêşê de cih digre û çalakiyên Bolşevîkan yê li hember artêşa Kralê Rûsyayê cih digre. Piştî şerê cihanî û şerê bi artêşa qralê Rûsyayê re di romanê de Şemo têkoşîna li hember axa, şêx û dewlemendan dîke.

6. Tema û Mijarên Sereke

Ji ber ku roman otobiyografîk e mijara sereke jiyana serlehengê romane ye an ku ew jî jiyana Erebb Şemo ye. Wek tema em dikarin du temayê sereke nîşan bidin. Jiyana rêncbertiyê û idealîzîkirina sosyalîzmê. Eger em romanê wek du beşan bi nav bikin yek dibe jiyana Erebb Şemo ya zarokîyê û her cureyên belengaziyê; ya duduyan li hember maldaran, axayan, şêxan an ku li hember kapîtalîstan şerê Bolşevîkan an ku sosyalîstan.

Eger em romanê yekser bigrin tede bilindkirina îdeolojiya Şoreşa Bolşevîkan ya 1917an tê ber çav. Di romanê de mijarên sereke;

Malbat û zarokîya Şemo

Şivan û rêncbertiya malbata Şemo

Destpêka xwendina Şemo

Li hember emperyalîstan şer (şerê cihanê yê yekem)

Dilketin û evîna Şemo

Têkoşîna û serhildana bolşevîkan (Şoreşa Oktobirê 1917)

Vegera nav Kurdan ya jî bo ku Kurdan hînî bi-destxistiyên şoreşê bike.

6.1. Mijarên Civakî, Siyasî, Kesayeti

Roman seranser bi motifên civakî hatiye xemilandin. Car caran nakokiyên di nav civatê de, car caran serdestiya dewlemendan, car caran tekîliyên mirovan yê bi hev re di nav romanê de cih digrin.

6.1.1. Daneberheva Kurdan û Melegana

Şemo, Kurdan û Melegan dîde berhev.

"Nava kurmancanda heyat qeyde û qanûne lape başqe bûn. Rêncberiya nava kurmancada jî ji rêncberiya melegana farqitir bû." (r. 52)

"Meriyê melegan, çewa min serîda got, gişke êkincî bûn. Lê kurmanc gişkê koçerin, dêwêr xwey dikin, gundê wan du pa li çiyadanin." (r. 53)

6.1.2. Tekiliyên Navbera Beg, Axa û Merivên Xizan

Têkiliyên navbera beg, axa û merivên xizan de bi awayekî eşkere hatiye nivîsîn:

"Gelle meriyêd kesîb diçûne olama bega, axa, şixulê wan dikirin, çewa rieta bea ew xebat tev bê pere dikir. Xulamêd bega nava êla ketibûn, olma derdixistin; yê ku nedîçûne olama bega, ew merî dihatne kutanê, bi qamçiya û çirm dikirin." (r. 59)

"Her maleke dewletî, sê çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, duşuşt, şedikir, kincê wan duşuştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin." (r. 59-60)

"A bi vî tiherî beg axalera, şêxa û mella xûna an belengaza dimêt, dixwar." (r. 60)

Li hember zordestiya beg, axa û şêxan bavê Şemo neçariya xwe tîne ziman:

"- Lao' Kî kare ber bega, axa yan şêxa, mella şikiyat ke? Dîwane dest wandene, erd-erdê wane, war jî yê kal bavê wane. Emê çewa herin şikiyat, li kê yikiyat kin." (r. 60)

6.1.3. Bertîl

Dema ku pezê malbata Şemo winda dibe, ji bo ku pez ji yê ku diziyê bistînin bertîlê didin begê xwe:

"Ûsib-begê bê pêşkêş qe nihiştîbû bavê min ber çvê wî keve. Bavê min wêderê berxeke rind dikire, dide ber xwe, dibe dide Ûsib-begê." (r. 71)

Dema şer berdewam dike ku xwarin li leşkeran kêmbûn, leşker diçin ji gundiyan pezên wan nivheqekî distînin:

"Gundiye deqletî ruşet didane wana, malê xwe xilaz dikiri. Lê kesîb û gundiye ortê wî şerîda ber dest-piya diçûn." (r. 85)

6.1.4. Dizi

Dema Şemo tê Qersê li wir rastî hevalekî xweyî zaroktiye tê:

"... me kartol didizîn, dikelandin, dixwarin. Navê wî Îvan bû" (r. 76)

6.1.5. Zanîna Zimanan ya Erebb Şemo

Dema şerê Cîhanê yê Yekem dest pê dike Şemo li karxaneyekê wek karkerekî dixebite. Arteşa Rûs tê li cem karxanê konê xwe vedidin. Bi vî awayî zabitê arteşê ji Şemo haydar dibe:

"Qazax û zabitê wan pê hesiyan, wekî ez pak zanîm zimanê tirkî, êrmaniya, kurmanca, huruma û ûrisa." (r. 77)

6.1.6. Di Şer de Dema ku Gel Arteşa Rûs Dixapand

Dema hêza Rus dikeve nav gelê Kurd, Kurd ji ber ku Rus reya xwe winda bikin reyên şaş nişanî wan dikin:

"Riata wêderê bi dijmainayî li eskerê ûrus dinêrî, em dixapandin, riy anerast nişanî me didan. Wî tiherî carekê tirkî û kurmanca ez xapandim rêke xirab û lape başqê nişanî min dan." (r. 78)

"Ew riy em têda biçûyana, min şaş kir, çimku kurmancêd Koçer ez xapandim, rêke dinê nişanî min dan." (r. 79-80)

6.1.7. Dilketin

Şemo dilketin û evîna xwe û ya Karê bi vî awayî tîne ziman:

"Nava wê mehêda ez qîza ta min, Karê hînî hev bûn." (r. 83)

"Em ussa hînî hev bûn, -dilê me kete hevdu." (r. 83)

6.1.8. Zilma Qezexan

Zilm û zordestiya leşkerên Qezaxan ya ku li gelê reben dikirin tîne ziman:

"Min ber çavê xwe dît, çewa qazaxa û zabitê qan zor didane riatê. Talan dikiri, jin şuhurandin, merî kuştun ciyê bala sebeb, çibe jî." (r. 89)

Li hember ve zilma Qezaxan Şemo xemgîniya xwe tîne ziman:

"Gunê min gellekî wan belengaza dihat, ez cara diçûme dûr ber kevira, digriyam." (r. 89)

6.1.9. Xwarinên Zabitan û yên Leşkeran

Zabiten di arteşê de her cure xwarin û vexwarinên xweş bi dest dixistin:

"Gelle îçke dixwarin, qumbar dilistin û şixulêd maîne netê dikirin." (r. 90)

"Min lê nihêrî-çika xwarin bona zabita tê anîne: şekir, komiyak, şerab, araqa xas, goşt û gelle xwarina dinê." (r. 90)

Li hember vê luksa zabitan leşker di nav rewşeke kambax de dijiyan:

"Lê ekser ussa ninbû, gelleka nanê tisi jî dest nedixist bixwarana." (r. 90)

6.1.10. Dî Şer de Rewşa Malbatên Leşkeran

Di dema ku şer dewam dike perîşanî û şerpirzetiya malbatên leşkerên arteşa Rûs dadixê berçavan:

"Wî çaxî esker name ji mal distandin, wan namada dinivîsîn, wekî zarâ wan birçî dibîn, bûye xelayî, çimku çîqa mêrê xebatçî hene, birne şer. Mane kal, jin û zar. Kese tunne bixebite, ekin bike." (r. 97)

6.1.11. Xebaten Siyasî û Rewşa Siyasî

Şemo, destpêka xebatên xweyî siyasî destnîşan dike:

"Roj bi roj ez ketme xembata firqê idî fikra min ser wan giliya bûn. Zivistana 1916-a idî serbet ez dixebitîm." (r. 104)

Piştî ku Şemo Bolşevîkan nas dike, ramanên wî jî tene guhertin:

"Lê bihara 1917-da, idî ew pariyên nan nebû fikra mine eseyî, min fikir dikir çewa xebatê rin bibin. Ez ketme firqê, bûme uzvê wêyî eseyî. Ez idî, çewa merikî ji tariyê derkeve bê ber ronkayê." (r. 105)

Dema ku şoreşa Bolşevîkan dest pê dike dinya dibe du alî:

"Wî çaxî diniya bibû du alîya. Alîk-proletariatê Ūrisêtê, yê ku welgerandibûn dîwana Nikoloyî xurxur, bi komekiya palê Evropayê dikire şer, alîk jî-bûrjûaziya Ūrisêtê û bûrjûaziya Evropayê." (r. 141)

Piştî ku Şemo dibistanê diqedênê guherîna di jiyana xwe de ji bo xwendevan êşkere dike:

"... lê idî torbê minda xên ji nê hebûn kitêb." (r. 48)

6.1.12. Nêrînen li ser Kurdan (Kurmancan)

Li ser xebat û ramanên Şemo yê derbarê rewşa siyasî ya dinyayê de, miroveki Ermenî wiha dibejê:

"-Kurmancê ker çî tenrane, em şer kin yan şer nekin, tu xwere çobantiye bike, bigre gopal-here zozanî, -û pêra kenîya." (r. 108)

Li ser riya Tîblîsê de kesên di trenê de ji bo Kurmanca digotin:

"Mera gotine -hûn kurmanc sal donzdemeha meriya dikujin, talan dikin..." (r. 118)

Ji bo ku Şpak li Îranê bi leşkerên Kurd re şer kiribû, Kurd baş nas dikirin:

"Hûn, kurmanc mêrxasin." (r. 123)

"-Hevalê Şamilov, ez zanim, -mêrê kurd zafe mêrxasin û wekî sozdan, tu carî xayîntiye nakin." (r. 126)

Nêrîna jinên Ermenî yê li ser Kurmancan (Kurdan) nêrîneke neyînî ye:

"Hine jinkêd heyatê êrmenî hevra digotin:

-Kurmance teve ussa dizin, qaçaxin, hila binêr -evê çûk hatiye vira, dîsa bê dizî nahewe." (r. 40)

Nêrîna zarokên Melegana ya li Kurmancan jî ne baş e:

"... lê dîsa zarê melegana nedixwast minra ser textekî rûnin. Wana digo, ezî mirdarim, golikvanim. Seydayê ez dame rûniştandinê ser textekî başqe-tenê." (r. 46)

6.1.13. Xeyalşikestina Şemo li Rûsya

Dema Şemo diçe nav Rûsan xeyalşikestî dibe;

"Yekê jî, wextê çavê min hé Ūrisêtê neketibû, min tirê, -li vira, Ūrisêtê gişk komûnîstî. Lê ez ku hatim -ew çen roj bû, ez digeriyam, min qe yek jî nedidît." (r. 123)

6.1.14. Vegera Şemo li Nav Kurdan

Di meha sibatê ya 1924an de Şemo wek berpirsyarekî partiya Bolşevîkan bi wezîfe dişînin nav Kurdan.

Dema Şemo tê Tilbîse diçe ba xwîşka xwe Gogê:

"Min xûşka xwe Gogê li wêderê dît. Goga xûşka

min, ji mira gilîkir, wekî bavê min kuştin, diyya min jî xelayêda ji birçiyana mir." (r. 145)

Duvre li Tilbisê gundiye Şemo yên ku ji Sûsîzê reviyane hatine vir derdora Şemo digrin û giliyên xwe ji Şemo re dibêjin:

"-Wextê tu ji cem me çûy, diwan kete destê daşnaka. Daşnaka dest pê kir kurmanc pîr kirin. ... Begêd me, axialêdêd me jî çûne piştê daşnaka. Ûsib-beg, Cangîr -axa û Qulî -beg esker ji kurmanca dane daşnaka." (r. 145-146)

"Ûsib beg bû uzvê parlamênat daşnaka, Cangîr axa jî pumandarê ser eskerê kurmanca nav daşnakada. Egît beg bû prîstavê kurmanca. Egît beg xelq ussa talan kir, idî "neynuk tunne bû" wekî xwe bişxuranda." (r. 146)

6.1.15. Danberheva Gund û Bajaran

Şemo di romana xwe de gund û bajaran dide berhev.

"... çimku, şîhir ji gund xirabtire. Lê vira meriv nikare derkeve, aza xwera bigere." (r. 39)

"Na! Gund ji seher çêtire. Çolê çîqa dixazî bibez, têke gazî, bistrê, bilîz, kê l ite binêre, kê te pêpeske!" (r. 40)

7. Ziman û Şêwe

7.1. Devoka ku roman pê hatiye nivîsîn

Şemo, di pirtûka xwe de devoka Serhedê bi kar aniye.

Zimanê ku Şemo bi kar aniye, zimanekî rojane ye. Ku di hemû romanê de ev ziman xwe eşkere dike. Hûnandina hevokan li dor zimanê rojanê yê sadê û zelal hatine avakirin. Di hevokan de ne li gor rêzikên grametîk, li gor axaftina rojane peyv hatine rastin. Bêje wek ku li hêrema Serhadê tene bikaranîn hatine nivîsîn:

Carna navên heman tiştî cuda nivîsiye. Wek; *Barbir* (r. 18), *merkeb* (r. 18), *guhdirêj* (r. 19)

Carna jî navên heman tiştî bu du zimana gotiye:

"... min zaf dixwast bibme dûajo yanê jî yançî." (r. 14)

"Li wan deka diçêrin û kak dibin kerî-sûriye wan." (r. 53)

Şemo di pirtûkê de gelek peyvên biyanî bi kar anîne. Bi taybetî bêjeyên Tirkî û bêjeyên Ermenkî/Rûsî bi kar anîne:

Peyvên Tirkî; *duşurmîş* (r. 12), *bol* (r. 16), *çayîr* (r. 16), *êpêce* (r. 16), *temiz* (r. 16), *başqa* (r. 17), *mart* (r. 19), *yançî* (r. 19), *ekincî* (r. 20), *tirmix* (r.20), *guc* (r.29), *oyin* (r.48), *obebaşî* (r.55), *ale-balix* (r.60), *dikançî* (r. 109), *arîşvêrişçî* (r. 109), *nerazlixî* (r. 124), *barîşixî* (r. 124)

Hevok bi zimanekî zelal hatine hûnandin. Bi devoka Serhediyên hatine vegotin.

"paiz" (r. 16), *kurtkirina payîzê*, *"zara"* (r. 17) *kurtkirina zaroyan*, *"çûktir"* (r. 17) *kurtkirina biçûktirê ye*. Di seranserê romanê de ev cure nivîsandina bêjeyan xwe diyar dike.

7.2 Di Romanê de Montaj

Di rûpelê 23an de Şemo dema ku bûye mirovekî girîng yê civatê bi saya ku behsa mirovekî ku navê wî Cewoyê Pîr e û jê re Kalê dihate gotin, li romana xwe montaj kiriye û rewşa xwe yî ku roman nivîsiye xistiye nav bûyerên zaroktiya xwe:

"Ew xwe hê saxe li gundê Camuşvana mezindane nehiya Axbaranêdanê. Wextê ez dîtîm, ecemayî ma û biken kire bîra min, got:" (r. 23)

Wek di piştî çend sala dema ku hevlekî xwe dibîne wê hevdiîtinê dixwe nav rûpelên romanê:

"Zivistanê, 1933-s, hevalê Xîjnyak li Lënîngardê rastî min hat." (r. 144)

7.3. Diyalog

Ji ber ku roman bi devê Şemo hatiye nivîsandin û ji ber ku Şemo behsa serboriya xwe dike ji hêla diyalogan ve qels maye. Lê ev qelsbûn wateyeke neyînî nade romanê. Ji ber ku roman serboriyeke dive nevē çirokkirin an ku vegotin bêhtir be. Bêhtir vegotin heye an ku çirokkirin di romanê de serdest e. Lêbelê ev nayê vê wateye ku roman bê diyalog e. Li çend devêrên romanê diyalogên kurt hene:

"Îvan derket, hate ber dêrî, ji min pirsî:

-Tu çî dixazî?

Min caba wî da, got:

-Ez dixazim bibme xulamê mala te.

Ivan keniya, got:

-Tu xwe zarî, çi xebatê ji te çêbe.

-Na? Min caba wî da. - wekî tu min bigrî, çîqa xebata te zivistanê hebe, ezê bikim.

Wa li min nihêrî. Hevekî duşurmîş bû, got:

-Lazekê vir bisekine, ezê hatim.” (r. 32)

7.4. Name

Dema ku Şemo li nav kaxezên bavê xwe dinêre kaxezeke taybet dibîne:

“Hukum

Hukum dikim hamû gîlaviya û hemû ketxude gunda, komekê binde Şemoyê Adî, yê ku digere mihineke unda bûy. Rengê wê mihîne pooz ji cîsnê hespê erebane, nişaneke dexmekirî ser hêta paşîne çepêye.

Kê ku vî hukumî heqedîne, ezê bidme cîzareke qanûniyê û cabdariyê.

Pristavê nehîya Qizilçeçeqê(qol)

Katibê wi (qol)” (r. 49)

Li gorî ve kaxezê rojbûna Şemo diyar dibe:

“- Ewê roja ew kaxez dane min, tu eynî wê rojê zar bûyî...

Bi vî tîherî mêtrika emrê min bû 23-oktyabrê-sala 1898. Kurmancî em wê mehêra dibênmeha ‘çiriya pêşin” (r. 50)

8. Dem

Bûyer di romanê de ji salên 1890î dest pê dikin heta sala 1924an bi dawî dibe. Eger em romanê li gora demê bixin beş, du beşên sereke derdikevin pêş. Jixwe em romanê li gorî çî bixin beş her dem du beşên sereke derdikevin pêş. Roman beriya ku Şemo were dinyayê dest pê dîke û heta sala 1924an ku dema Şemo bi wezîfe tê nav Kurdan, didome. Heta sala 1914an jiyana Şemo ya li gund û zozan û çiyayan bi şivantî û rêncbertî di bin zor û zehmetiyan de didome. Sala 1914an piştî ku Şerê Cihanê dest pê dîke ji bo Şemo jî jiyaneke nû an ku jiyaneke cuda dest pê dîke. Ji bo ku Şemo çend zimanên ji hev cuda (Kurdî, Tirkî, Ermenkî, Rûsî) dizane wekî zimanwergêrekî di nav artêşa Rûs de cih digre.

Di romanê de dema herî girîng bêguman sala 1917an e ku heman salê şoreşa Bolşevîkan bi ser dîkeve. Ji bo ku Şemo jî endamekî Bolşevîkan e ev wek serfiraziyekê ye. Jixwe bûyer li gor deman rûyê xwe diguherîne. Piştî şoreşê jî jiyana Şemo guheriye.

Roman sala 1924an dema ku Şemo wek kesekî wezîfedar tê nav Kurdan diqede. Wê demê dewleteke nû bi navê YKSS (Yekîtiya Komarên Sovyeta Sosyalîst) ava bûye. Vê jî li ser jiyana Şemo bandoreke mezin hiştiye.

Encam

Wek di xebatê de hate dîtin Ereb Şemo jiyana xwe bi awayekî otobiyografîk nivîsandîye. Di vê romanê de gelek çavkaniyên folklorîk û sosyolojîk derdikevin berçav. Di serî de rewşa mirovên ji rêzê an ku gundiyan û pirsgrêkên siyasî yê destpêka sedsala bîstan bi awayekî zelal hatine nivîsandin.

Ev roman her çiqas girîngiya xwe ji yekemîn-bûna romana Kurmancî bigre jî bi xwe re arşîveke dewlemend jî hiştiye. Ev xebat tenê lêkolîneke biçûk e. Eger xebatên berfirehtir werin kirin, jî vê romanê gelek kodên civakî, siyasî û kesayetî wê derkevin meydanê. ✨

Gulan 2019, Nîsebin, Êlih (Batman)

Çavkanî

Şemo Ereb, *Şivanê Kurmanca*, amadekar: Mustafa Aydoğan, Lis, 2015
Diyarbakir
https://ku.wikipedia.org/wiki/Erebê_Şemo (01.05.2019)

Jêrenot

- 1 Ji ber ku mijarên folklorîk di Kovara *Nûbihar* hejmara 147an de di rûpelê 76an de wek mijareke taybet û serbixwe hatîye nivîsîn di vê xebatê de nehatine nivîsîn. (Dilazad A.R.T)
- 2 https://ku.wikipedia.org/wiki/Erebê_Şemo (01.05.2019)
- 3 B.n.b

Roja Tarî[~]

MEHMET ÇELİK

Tu çûyî Seyda îro ser û sitû min xwar bû
Rojeke tav û germ bû lê dilê min sar bû

Mirin ji min dûr bû heta roja tu mirî
Îro jîyan ji min ra ji mirinê dijwar bû

Rojê tu bîra min î ji min jî qet dûr nînî
Çima nayî xewna min ma hevaltî yek car bû

Mal û xanî û hewş îro vala ma ji te
Tu çûyî nivê rojê ji min ra wek êvar bû

Ehd û peymanî te bû, te min bermedida
Te sonda xwe şikand nizanîm ev çî kar bû

Îro jîyan şî e tama jîyanê qet nîne
Ez dinalîm şev û roj dilê min zarezar bû

Tûfana Nûh baran bû, ya min çûna te ye
Tûfan zor e yan mirin bêje kîjan xeddar bû

Ewrên mirinê reş bû li ser malî dimeşa
Li ku ket dikuşt dilopên wê hezar bû

Dilopeke wê li te ket ewên dî ma nava min da
Tu carek mirî lê mirina min bi hejmar bû

Herkes ji min dipirse emrê Seyda çend sal bû
Çî ji wera ey nezanno ma hebûna wî li we bar bû


Were xewna min Seyda bibe li min mîvan
Ew feqeyî dîn piştî te tim xemxwar bû

Ez çî bêjim nizanîm eql û hiş li min nema
Dil kete kul û xeman qelema min naçarbû

* Ev mersiye bi minasebeta wefata Mela Hesênê Ciwanîkî ji aliyê kurê wî Mehmet Çelik ve hatiye nivisandin.

TAZIYE

*Inna lillahi we inna ileyhi raciun
Em ji Xweda ne û emê disa vegerin bal wi
(Beqere: 156)*



Seydayê Mela **HESENÊ CIWANIKÎ**
di 01.07.2019an de li Wanê wefat kiriye
û li Wanê hatiye definkirin.

Xwedê wî bi rehmeta xwe şad bike. Em ji malbat,
zarok û ji xizm û dostên wî re sebr û metanetê
dixwazin, serê tevan sax be.



Xêrhatineke li du berhemen
Edebiyata Zarokan a Kurdî:

Du Legleg û Daweta Noko û Nîskê

MEMÊ MALA HINE

Di dîroka mirovahiye de heta dawiya sed-sala 18an zarok wekî mirovên negeyiştî hatine dîtin. Lewre rastiya cihêbûna derûniya zarokan û cihana wan a xeyalî gelek dereng hatiye dîtin. Zêdetir jî du sed sal berê mirovahiye pê hesiyaye ku zarok ne mirovên negeyiştî, lêbelê mirovên xwedî awayê cihê yê ramanê ne.

Gelek kes hevîr in ku beriya berhema Lewis Carroll a bi navê “Alice Li Welatekî Ecêb” ku di sala 1865an de hatî nivîsîn, mirov nikare qala heyîna edebiyata zarokan bike. Di vê berhemen de nivîskar bi Aliceê wiha dide gotin: “Kitêbeke bêyî wêne û diyalogan bi kêrî çi tê?” Li gor gelek nivîskarên edebiyata zarokan, ev gotin dibe destpêka edebiyata nivîskî ya zarokan. Lewis Carroll bi vê gotina xwe çarçoveya edebiyata zarokan destnîşan kiriye: Wêne û diyalog.

Wekî ku gazinca Lewis Carroll jî nîşan dide di edebiyata her neteweyekê de edebiyata zarokan piştî pêşketina edebiyata mirovên geştiyê pêk hatiye. Bi taybetî jî piştî pêşketina pedagojiyê girîngiya edebiyata zarokan bêtir hatiye dîtin. Niha mirov dikare bêje ku di edebiyata her neteweyekê xwedî dewlet de kuliya teke mezin a edebiyata zarokan heye.

Dema ku em bala xwe didin Kurdan, cihê mixabin e ku edebiyata zarokan di nav Kurdan de gelek dereng dest pê kiriye û di rewşa heyî de gelek qels e. Heta li gor gelek kesan mirov nikare behsa edebiyata zarokan a Kurdî li bakurê welêt jî bike. Dibe ku ew gotin, gotineke dijwar be û neheqî li çend xemxurên edebiyata zarokan a Kurdî bike.

Belê, ev çend sal in weşanxaneyên wisa dest bi kar kirine ku tenê berhemen edebiyata zarokan diweşînin. Bi taybetî piştî ku li bakurê Kurdis-

tanê di dibistanên seretayî de dersên hînkirina zimanê Kurdî dest pê kir, hewcedariya berhemên edebiyata zarokan a Kurdî bêtir derket holê û hin mamoste û rewşenbîrên Kurd di vî warî de dest bi xebateke hêja kirin.

Du ji van xebatên dawîn ku hêviyê dide mirov yên dramaturg û nivîskar Çetoyê Zêdo ne. Ev du berhemên bi navê “Du Legleg” û “Daweta Noko û Nîskê” ji hêla Weşanxaneya Nûbiharê ve demeke berê hatin çapkirin. Çetoyê Zêdo ku bêtir bi şano û berhemên xwe yên li ser dîroka şanoya Kurdî tê naskirin êdî dest bi nivîskariya edebiyata zarokan kiriye. Ya rastî ev herdu berhem ne berhemên wî yên ewil in ji bo edebiyata zarokan. Lewre wî di sala 2014an de şonanameya zarokan a bi navê *Şengê û Pengê* nivîsandibû û dramaturjiya şanoya wê berhemê jî kiribû. Ji ber ku ew bixwe di dibistana amadeyî de mamosteyê edebiyatê ye, nikare ji edebiyata zarokan dûr bimîne û ev çend sal in bêtir bala xwe daye edebiyata zarokan.

Ez û Çetoyê Zêdo ji nêz ve hevdu nas dikin û em ji nêz ve xebatên hev dişopînin. Ji ber vê yekê ez yek ji şahidên çiroka pêkhatina van herdu berhemên navborî me. Jixwe min wek redaktor di nav yek ji van xebatan de cih girtiye. Her wisa mirov divê behsa xêzên Ronî Battê jî bike. Xêzkarê van herdu berheman Ronî ye û wî hewl daye ku xêzeke Kurdewarî li van çirokên Kurdî bike. Lewre xêz di berhemên edebiyata zarokan de gelek girîng in. Zarok dema ku metnekê bixwînin, divê vegotîneke wêneyî jî ji bo alîkariya metnê li berçavên wan hebe. Dikarin bêjim ku Ronî Battê karî bi xêzeke Kurdî van berheman temam bike.

Çetoyê Zêdo di berhema xwe ya *Du Legleg* de qala çiroka du leglegên ciwan dike ku ji malbata xwe qetiyane. Ev çivîkên koçer li gelek deverên cihê yên Kurdistanê digerin. Li vir divê behsa wê yekê bikim ku Çetoyê Zêdo hewl daye ku bîyî ku pê bihesîne erdnîgariya Kurdistanê di binhişê zarokan de bi cih bike. Lewre dema ku ew qala mekanê dike, behsa deştek, çemek an jî çiyayekî nake. Navê cihan navê rasteqîn ên deverên cihê yên Kurdistanê yên mîna Çiyayê Sîpanê, Gola Nemrûdê, Bendava Çînarê, Qerejdax, Malabadê, Artos, Axtirman û hwd. derbas dibe.

Ev taybetmendî, bi dîtina min balê dikêşîne ser kêmasiya nerasteqîniya mekanê ya di edebi-

yata Kurdî de. Di gelek berhemên romannivîs û çiroknivîsên bakurê welêt de mekan hertim bûye mekanên giştî. Gelek nivîskar bîyî ku qala cihêkî taybet bikin, mekanên bûyeran yên berhemên xwe wekî gundek, çiyayek, deverek an jî çemek bi nav dikin.. Di romanên de ku bûyerên wan li Diyarbekirê derbas dibin, em dibînin leheng derdikevin ser bircên Diyarbekir, lêbelê ev, kîjan birc e, nediyar e. Ji ber vê yekê Çetoyê Zêdo hewl daye ku nexşeyeke hişî ya Kurdistanê di hişê xwênerên xwe de pêk bîne. Ez pê bawer im ku ewê di vê hewldana xwe de bi ser keve.

Di zargotina Kurdî de ji legleg re “hecîlegleg” tê gotin. Ji ber ku legleg zivistanê ber bi başûr difirin, Kurd mîna ku ew çûbûn Meke û Medîneyê, ji vê çivîkê re “hecîlegleg” dibêjin. Lê di van salên dawî de tê dîtin ku legleg zivistanê jî li Kurdistanê dimînin û koç nakin. Di vê berhemê de qala wan leglegên ku êdî zivistanê naçin başûr, tê kirin.

Çetoyê Zêdo bi hin bûyerên rasteqîn ku li Kurdistanê qewimîne bi çiroka xwe neqşandiye. Ev yek jî dihêle ku zarokên ku vê berhemê bixwînin, ji bîr nekin ku ev çirok li welatê wan û di serdemeke diyar de derbas dibe.

Berhema duyem ango “Daweta Noko û Nîskê” jî ji zargotina Kurdî hatiye wergirtin û tê de çiroka dîkekî bi navê Diklan Axa tê qalkirin. Ev berhem bêtir tehmeke çirokên Fablên Kurdî dide mirov. Di vê berhemê de jî mekanên rasteqîn derbas dibin û her wisa wekî ku di gelek Fablên Kurdî de heye, di vê çirokê de jî gur cihê xwe yê girîng digire.

Herdu berhemên navborî ji hêla zimên ve gelek sade ne û Çetoyê Zêdo hewl daye ku zarok bi hêsanî jê fêm bikin. Kesên ku dixwazin Kurdî hîn bin dikarin sûd ji van berheman bigirin. Lewre çirok her çiqas jî hêla bûyeran ve rengîn bin jî ji hêla peyvan ve sade ne. Ango ev herdu berhem di hînkirina Kurmancî de wekî materyalên alîkar dikarin werin bikaranîn.

Bêguman herdu berhem pirtûkxaneya edebiyata zarokan a Kurdî dewlemendtir û rengîntir bikin û rê li ber xebatên nû vekin. Hêvî dikim ku zarokên Kurd tehm ji van herdu berheman bigirin û cîhaneke xeyalî ya kurdewar di hişê xwe de ava bikin. ✎

Risteyên ji wê Hayjêbûnê: **Xezela Siyahpoş ya bi Tîpa “E”yê ve Paşserwa**

MAHSÛN ÇAKMAK

Ezê di vê lêkolînê de hewl bidim ku xezela Siyahpoş ya bi tîpa “e”yê ve paşserwa ye di çarçoveya wêjeya klasîk de rave û şîrove bikim. Beriya her tiştî divê meriv vê bizanibe, nîgaşên her tiştêkî bi navê “mezmûn”ê ji xwe re di her helbestvaneke klasîk de cî girtiye. Wekî ku helbestvanek çaxa dibêje “xonçeleb”, di wê wextê de “hezkirî” tê li bîra me. Ji ber ku di pênasekirina hezkiriyê de helbestvan bi têgînên razber ên bi vî teherî bîyî ku pevte rabin û rûnên di navbera xwe de bi rêya maweyeke dirêj qewl danîne. Tiştên ku yê qal bê kirin di vê maweyê de bo xwe cînine qewîn girtine. Ez mînakekê bidim heger dikarim bibêjim ku “bilindî” û çaxa ku ez bêjim bilindî, ji aliyê nazikî û birêveçûna wê/wî ya ku bo êşkêşî çêdibe, di helbesta klasîk de bikaranîna têgîna

dara “serwî”yê pêşberî bikaranînê dike. Ango di helbesteke klasîk de rengdêrên mînanî “serwiya xonçeleb” derbas bibe wê gavê em dikarin bibêjin ku, hezkirî mîna dara serwiye bi bejn û bal e û lîvên wê jî notîla gulpikên kulîlkan piçûk û bedew in ku qala wê bi van wateyan ve tê kirin. Bîyî ku nasnavê wê kesê bê diyarkirin. Mijareke dinê jî êşkêşiya helbestvan e, ji ber ku hezkirî rû nadê, bi armanca êşa dilê wî daxîne helbestvan di helbestên xwe de ji hezkiriyê re lomeyan dike, carina jî şa dibe bi van tevgeran. Lê bi tenê hezkirî ne wek merivekê ye, dibe ku ew Xwedayî û esmanî jî be. Lê, di vê xezela Siyahpoşî ya jêrê de hezkirî meriv nîne, bêtir bi taybetiyên Xwedayî, nûranî û bi bîr û pênaseyên pîroz ve hatiye hûnandin. Di xezelê de karîgeriya tesewifê berbiçav e. Xezel ji pênc malikan pêk tê û ji bo metirsiya

rêbaza vegotinê jirêzêbûnê xelas bike di *Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemalê* de di nava malikan de hatiye saz kirin. Ezê li ser her malikê bi wateya wê ya taybet a ku mebesta wan her vegotineke xweş û nîgaşên/hêmayên nedîtî ne bisekinim:

Xezel

Kêşe: Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun

--+/+---+/+---+/+---

Malika 1em

'Aşiq be perîzade me bê nam û nîşan e

Çavnêrê mehê me ku ji 'ewrî ne xûya ne

Perîzade: Kesa ku ji cinên qaşo mê welidiye. **Meh:** Hîv, heyv. **Nam:** Nav.

"Ez evîndarê/aşiqê wê ya ji periyar çêbûye me ku bê nav û bê nîşan e, çav li hîvê dixim ku ew (jî) bi xêra ewran nayê xuya."

Helbestvan di vê malikê de behsa berdilka xwe dike û ew ji wî re xwe nîşan nade, lê risteya di binî de pê de diçe û çavekî li avgonê dide, li wir hîv jî heye lêbelê nayê kifşê. Ango evîna xwe ya ku nabîne bi teherekî zîrekane dişibîne hîvê. Evîndar her tim evîndar e û hez dike, hema wisa bi awayekî xemgîn evîna xwe dihebîne û pêda diçe. Evîna ku evîndar li pêşberî hezkiriyê tijî ye, evîneke germ û razber e. Her dem ji hezkiriyê xwe dilovaniyê dipê û ji vê yekê hêvîdar e, lê hezkirî rû nadê. Ev in taybetiyên evîna di navbera "evîndar û hezkiriyê" de. Di navbera ya ku tê hezkirin û hîvê de şibandin heye ku di wêjeya klasîk de ev yek bikaranîna ji wan mezmûnan e. Helbestvan ji aliyê bedewî, spîbûn û ronîkirinê ve rû û dêmên hezkiriyê bi şibandina hîvê dibin. Gava ku em li vir dinêrin ku di malikê de hîv nayê xuyanê em wê demê fêhm dikin ku maşûq li xwe nade dest û ev jî taybetiyeke dinê ya berdilkê ye di wêjeya dîwanê de wekî taybetiyên berdilkê ku bi awayê mezmûnê teşe girtiye. Bi awayeke din em çaxa ku lê binêrin û wisa bixwînin emê pê bihisin ku di nava "nîşan" û "xuyan"ê de serwa heye, tîpa "e"yê jî dibe paşserwa. Helbestvan bi vî awayî aheangeke xwezayî bi dest xistiye. Tiştêkî wiha jî

heye ku di wêjeya klasîk de hîv dema dibe rûyê hezkiriyê, por jî wê rûyê bi reşbûna xwe ve dinimin û digirin heta ku evîndar wê rûyê nabîne û dikeve nava xeman û bedbîn dibe di jînê de. Lê, di vir de helbestvan çêla porên hezkiriyê nekiriye, hema em jê tê digihêjin; lewra ku ev taybetiyeke wêjeya dîwanê ye, hezkirî bi tiştên şibandinê yên ji xwe bijarte bûne ve tê nimandin. Wekî mînak, hezkirî ji aliyê bejn û balê ve wisa dirêj e ku ev aliyê dişibe dara serwiyê û mîna keke din jî heger bê qal kirin helbestvan wê lêvên hezkiriyê ji aliyê piçûkbûn û nazikî û bedewiyê ve bişibîne "xonçê" ango bişkuh-gulpikê.

Malika 2yem

Ger çî ku hebîb xaîb e pêş çahvê me lêkin

Wek "Şemsê Dûha" yê di dilê min da 'eyan e

Hebîb: Ya/yê ku tê hezkirin. **Xaîb:** ya/yê nayê zanîn, xeyb. **Şemsê Dûha:** Sibe zû, berbang

'Eyan: xuya, kifş.

"Ya bi rastî hezkirî ji xeybê ye, yar ne di pêş çavan e, li pêş çavan lê bikin, mîna 'tava berbangê' ya ku di dilê min de xuya ye."

Helbestvan di vê malikê de qala ya ku nayê têgihîştin dike, lê di vê gavê de ji xeybê li hayedarbûna xwe mikur tê. Aloziya ji giliya "hebîb"ê yar e, ango ewê/ewa ye ku di dil de ye û hema wisa dil şewitandine. Ya rastî ew e ku wateya "hebîbê" di wêjeya klasîk de yek ji wan ev e ku C. Pêxember jê tê behskirin. Em dikarin bibêjin ku di vê ristê de "Hunera Bîranînê" heye ji ber ku Rêzdar Pêxember jî bi awayekî mijara çêle dibe. Lê ji aliyekî din ve jî hebîb bi hêztir tê wateya evîndarê/yarê, ew dibe ku evîna bi Xwedê ve pêwendîdar be jî. Di gotina "şemsê dûha"yê de tiştêkî notila agahiyeke olî-dîrokî heye ku ew jî bûyera ramangerê navdar Hellacê Mensûr e. Ya ku xeyb e û nayê kifşê bi tu awayî, ji helbestvên re hatiye xuyanê. Ji ber vî jî "enel heq" tê li bîra merivan, ango ez ji rastiye û parçeyek ji Xwedê me gotiye Hellac. Behsa evîna Xwedayî dibe. Helbestvan di sêrî de evîna derbasdar dike bergeha xwe, lê di pey re radihêje evîna herî bilind û pîroz. Şemsê dûha berbangê ji

helbestvan re zelal dike, mebest ji berbangê jîna li dinê ye, ev jî tê vê wateyê ku ji “xeyb”ê hayedar dibe êdî. Xaib û ‘eyan di nav xwe de dijberiyekê dihebinin, ev jî yek ji “hunera gotinê” ya wêjeya klasîk e. Di navbera “hebîb-çav-dil” de hunera levhatinê (tenasib) heye.

Malika 3yem

Ehwalê xemê ‘îşqê li ‘ammê çi ‘eyan kem

Tuhmetzêdeyê maherûyêyem xaîbane

Ehwal: Rewş. **‘îşq:** evîn, hezkirin **‘Amm:** Gel. **Tuhmetzêde:** Ya/yê ku tawanbarî dîtiye. **Maherûyêyem:** Rû hîv, rûyê ku mîna hîvê ye.

“Ez rewşa evîna xemê ji gel re (ji bo) çi xuya bikim, ew a ku min jê tawanbarî dîtiye (jixwe) ji xeybê ye (nayê kifşê).”

Helbestvan li vir dibêje ku xema ku ji ber evîndariyê çêdibe û ji wir di kesayeteke cuda de rewşeke nû di mêriv de disêwirîne bo çi ez ji xelkê re xuya bikim. Ez bixwazim jî ew nayê xuyakirin ku ji ciyekî meriv jê nikare were fehmê ye, ango ji devera nezanîne ye û tenê ew kesê ku ketiye li rêya evîna Xwedayî diyar e. Giliya “ehwal”ê di tesewifê de rewşa dildêr ya ku ji hişmendiyê dûrtir e pênase dike. Ji dilê pak ê perestkar re, bêyî hewldana perestkar, ji aliyê Xwedê ve bexişandina tiştên xweyî hin wateyên xeybê ne dinimîne. Yê ku tawanbarî ji hêla rûyê wê mîna heyvê ye dîtiye wê rewşa xwe tenê di dilê xwe de dikare bijî û ji ber vê jî bixwaze jî nikare vê rewşê li yên din diyar bike û di wê astê de ji wan bide jiyîn. Ewa ku mebest bi van ristan vegotina vê ramanê ye. Di navbera “xem-xaib, ‘îşq-tuhmetzêde”yê de hunera “leff û neşr”ê heye. Di nava ‘eyan-xaîbanê de hunera dijberiyê (tezad) heye.

Malika 4em

‘Ammî çi bibêjin di heqê halê me meqbûl

Çil roj e çi zanit lezzetê ceng û cefa ne

Meqbûl: Ya ku bê pejirandin. **Ceng û cefa:** Rênc, derd, acizî.

“Gel di derbarê me de çi dibêje bila bibêje emê bi-pejirînin, (em) çil roj in çêja rênc û derdan digirin (lê xelk vê nizane).”

Hejmara çilê di malikê de hatiye bi kar anîn ku wateya wê di ol û nêrît-kevneşopiyên gelê me û gelên din de xweyî wateyên girîng e. Kesek ku bixwaze têkeve rêya tesewifê dikeve rênckêşiya olî ya bi rêzikên maweya rojên xwe bisînorkirî ne. Rêzdar Pêxember jî di sala xwe ya çilemîn de bûye pêxember, ev hejmara wê jî tîne li bîra merivan. Di Peyama Nû û Peyama Kevin de jî Xwedê bi maweyên hejmaran ve bi rêya Qasidên xwe ji perestkarên xwe re dikeve têkiliyê. Çilê zarokêkî heta derneket ji aliyê xweyên wê/wî ve ji tu kesî re nayê nîşandan. Bi taybetî di tesewifê de rê û rêgezên sofîtiyê tîne li bîra merivan. Ketina sofî ya maweya rênckêşanê û hwd... Sofî tiştên ku di hundirê xwe de dijî. Bi tu awayî nikare ji derdora xwe re diyar bike, lewra ew tiştê ku dijî bi dilê xwe û terîqetê ve têkildar e, jixwe mebesteka wî ya bi vî teherî tune ye. Sofî, ji xêra vê rewşa çil rojî çêjeke gelekî geş ji xwe re girtiye û jiyan bi van çêgirtinên xeybî ve watedartir kiriye bêyî ku çêja civata bi çeng û tenbûrê. Ev bikaranîna bi vê şeweyê jî têdebûna rewşa helbestvan a asayî dide der. Mebesta helbestvan a bikaranîna hejmara çilê ya di nav xezelê de ew e ku bigêje wehdet (yekîtî)ê. Yekîtî cîgeheke gelek nûranî ye, pîroz e û ji qetîna cîhana xeyalî pênaseya xwe nirxdar dike.

Malika 5em

Ser ta bi pêyan dê bikem ez xwe bi

Siyahpoş

Ku şemê munîra me ji zulmatê nihan e

Siyahpoş: Di Kurmancî de tê wateya reşgirêdayî, peyveke Farisî ye. **Şem:** Find, mûm, momik. **Munîr:** Ronahî, ronak, çirsok, birqok. **Zulmat:** Tarîti, **Nihan:** Veşartî.

“Ezê li xwe ji serî heta binî (pêyan) reş girêdim ku finda ronahiya me (li xwe) tarîtiyê veşartî ye.”

Siyahpoş, di malika dawîn de li xwe ji pêkhatina razan pênase dike. Ji ber vê jî divê ku li xwe li raya wan razên di wî de pêk hatine, di jîne de bipêçe. Tiştên ku ew tê de dije vê rewşê jê re tînin. Em ji vê malika dawîn fehm dikin ku ew rewşa xwe ya ku di malikên jorîn de jî daye xuyakirin

jîna wî kifş dîke êdî. Ew ji sêrî heta binî li xwe di vê rêya dirêj ya tesewifê de wekî rêwî dibîne û li gorî wê tevdigere. Li xwe ji binyadê ve radestî vê ramangeriyê dîke.

Ev xezel cî cî ji aliyên naverokî -mijar, bikanîna nîgaşên tesewifî û hejmar...- munacatê taybetîyan dihundurîne. Di malikên wê de bandora tesewifê rasterast berbiçav e. Helbestvan bi besta hejmaran jî xwe spartîye xezelê. Siyahpoşê peyrevê Mewlana Xalidê Şarezorî ye ku ji terîqeta wî ya karîger sûd wergirtiye di helbestên xwe da. Di vê çûnê de em ji malika dawîn fehm dikin

ku gihîştîye mebesta xwe ya Xwedayî. Jixwe ji nasnavê wî yê di helbestan de bi kar aniye diyar e ev tişt.

Çavkanî

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, Stembol 2015.

Amedî, Bedirxan, *Siyahpoş: Seyf-ul Milûk û Bedî-ul Cemal*, Weşanên Nûbiharê, Stembol 2011.

Erdoğan, Mehtap, *Güzellik Unsurlarıyla Divan Şiirinde Sevgili*, Weşanên Kitabevi, Stembol 2013.

Irgat, M. Reşîd, *Siyahpûs: Çend Xezel û Helbest*, Weşanên Enstituya Kurdî, Stembol 1999.

Parlatır, İsmail, *Osmanlı Türkçesi Sözlüğü*, Weşanên Yargı, Enqere 2012.

Çavbirçiyê hevşabûnê

FIRAT KEKLİK

Xwazgîniyê xweşiyê me

Dikim doza ramûsanekê bikim ji te ra

Bûme çavbirçiyê xêlek hevşabûn û yariyan

Bi nexme û newayên ji Kûrahiya henase û hilme gulma ji

kezevê da tîn da qesta'm;

"qasekê di nava sing û berê te esmerê da bikim kêf û zewqa dînyalîka derewîn" e.

Di Kilama Hedê Rebenê de Guhertina Peyvên “Bêbext” û “Xayîn”

EVDÎ HESQERA

Hedê Rebenê yan jî Kilama Şêx Zahir li ser du peyayên Mala Şêx Baba; Şêx Zahir û Şêx Evdîrehman hatiye gotin. Şêx Mehmed Emînê kurê Şêx Evdîrehman¹ got, “ew çûne Serhildana Agiriyê û pişt re bûne firar.” Bi gotina dengbêj Sîdîqê Patnosê² jî “Ew li ser Kurmanciyê [Kurmancbûnê] di hikûmatê de bûne qaçax”. Ji wan Şêx Zahir li nêzî sînore Îranê hatiye kuştin, Şêx Evdîrehman jî hatiye hepiskirin. Heda/Emîneya ku di kilamê de qal dibe kulfeta Şêx Evdîrehman e. Dengbêj Sîdîqê Patnosê got “Kerîm Efendî jî fermandarê qereqolê bûye.”

Li gorî gotina dengbêj Sîdîqê Patnosê Kilama Şêx Zahir an jî Kilama Hedê Rebenê ya dengbêj Filîtê Axtepe ye. Lawê Hedê û Şêx Evdîrehman, Dengbêj Şêx Mehmed Emîn got ku “Sifteh Evdiyê

Topal³ ev kilam got. Lê sê heb kilamên Şêx Zahir hene.” Dengbêj Zahîro⁴ jî got “di sala 1976an de li ser Germava Çêrmûgê min dayikek nas kir. Navê wê Almast bû, ji gundê Teperizê yê Bazîdê bû. Wê jî min re got Şêx Zahir li ba me hat kuştin. Digirîya û digot. Min jî li gorî gotinên wê şaxekî kilamê çêkir. Lê dengbêjê aliyê Îranê Smayîlê Ormiyê jî ev kilam gotiye. Pişt re ez pê hesiyam.”

Gava vê kilamê dibêjin hin dengbêj⁵ peyvên “Kurmancî bêbext/Kurmancê xayîn” bilêv dikin û hin dengbêj⁶ jî van peyvên nabêjin. Dengbêj Sîdîqê Patnosê got, gava meriv bêje ‘Kurmancî xayîn/Kurmancî bêbext’ ew kiras li hemû Kurmancan dibe. Ev yek jî ne rast e: “Gelek dengbêjan re min xeber şand. Min go wisa nîne. [Heger bêjim Kurmancî bêbext] ez xwe jî dixim tevî wê kelîmê. Dibê ‘Piştî Şêx Zahir, Şêx Evdîrehman

sekna [li] Turkiyê, çûyîna Îranê bila li min heram be...? Başqe pêvadayîn yazix e, tişteki wisa xweş nîne. Di kilamê de heye lê yanliş dikin. Eva min ji kurê wî [Şêx Mehmed Emînê kurê Şêx Evdirehman] re jî go. Go, welle Zahir [Dengbêj Zahiro] wisakî dibêje. İca Zahir jî niha evî... Çûye kilam! Zû va ketiye qlîpa çûye [Klîba Dengbêj İhsanê Mûşî]. Jixwe xayîn, xayîn e... Li ser xwe bêjim, li ser kesî nabêjim, emê çima xayîn bin!” Lê dengbêj Zahiro jî got “min ji bo Kerîm Efendî wisa got. Min ji bo yên [Kurmancên] din negotiye. Meriv nikare hemû Kurmancan tevlê ke.”

Dengbêj Sidiqê Patnosê kilam wiha got:

Lê lê Hedê, rebenê sibe ye, rabe îro şerekî li me çêbû

Daweka li me qewimî, lawo

Li Şehîdê Gazê, li Gola Newêlê, meskenê qazan û beta

De kula kor bi kul be, xwe berde mala Kerîm Efendî

Li pê kekê mi ajotî rêka sê saeta

Şêx Zahir bi sê denga ban dikir go Evdirehman,

Tu bavê bavê mi bî, rabe çê be, çê bisekine

Lawo hatiye ser me eskerê sê wilayeta

Kesekî xêrxwazî xêra tune cewabekê bihere Kirê Celalîya

Bibêje Şêx Xiyasedîn, birayê dilşewitî

Bibê, rabe mala te şewitiyo, derbekê bi dest berdane

Şêx Zahir Bexê Mala Baba

Di nav me da şikêrandin pişta qaçax û firarê sê dewleta...

Lê lê dayê nabe, bile nabe

Welatê me Serhed e, payîz e, berf û bager e

Dûyê mîratê çapilya ketye Gelyê Newêlê

Ser serê Bexê Mala Baba sahil nabe

Lê lê dayê rebênê piştî Şêx Zahir, Şêx Evdirehman

Welatê Turkiyê, topraxa Îranê li min towbe be, siwaro...

Lê lê Hedê, rebenê sibe ye, rabe îro şerekî li me çêbû

Daweka li me qewimî, lawo

Li Şehîdê Gazê, li Gola Newêlê, li wirê wê bi hevde ye

Hela reba ber çavê kekê mi durbîn e, desta de dixwîne xarîte ye

Şêx Zahir go Şêx Evdirehman,

Tu bavê bavê mi bî, rabe çê be, çê bixebite

Ez çi b'kim, Xwedê em herdu jî zanin kes tune

Cewabê bide Kirê Celalîya, bibêje Şêx Xiyasedîn mala te şewitiyo

Derbekê bi dest berdane Şêx Zahir Bexê Mala Baba

Birîna kekê mi xedar e, bê fayde ye...

Lê lê dayê nabe, bile nabe

Welatê me Serhed e, payîz e, berf û bager e

Dûyê mîratê çapilya ketye Gelyê Newêlê

Ser serê Bexê Mala Baba sahil nabe

Ez çi bikim piştî Şêx Zahir, Şêx Evdirehman

Welatê Turkiyê, topraxa Îranê li min towbe be, siwaro...

Lê lê Hedê, rebenê sibe ye, rabe îro şerekî li me çêbû

Daweka li me qewimî, li Şehîdê Gazê ez çi bikim

Xwedê mêr dizane payîz e, berf dibare çiqqa nerm e

Li ser serê Bexê Mala Baba rûyê erdê girtî çerm e

Mi dî Şêx Zahir go Şêx Evdirehman

Tu bavê bavê mi bî, rabe çê be, çê bixebite

Eskerê sê wilayeta hate ser me

Law navê revê pey Bexê Mala Baba nexe

Tu çiqqa bibêjî hewqa şerm e

Lo lo lawo tu rabe, ez çi bikim topê serê tiliyê birayê te firandiye

Cixarê mi derxe, cixarekê jî mi ra çê ke, cixarekê bikşînim


Hê birîne birayê te germ e...

Çavkani

- Dengbêj Ahmedê Agirî: <https://www.youtube.com/watch?v=5gkKeT-YOQY8>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Hecl Evdîlkerîmê Patnosî: https://www.youtube.com/watch?v=_mk2IDqt9kl, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Ihsanê Mûşî: <https://www.youtube.com/watch?v=8R-Xk-OPavXw>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Kurmanç Bakurî: <https://www.youtube.com/watch?v=No1W-RXz-f4>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Nûroyê Meter/Agirî: <https://www.youtube.com/watch?v=kB-lJRCnO4U0>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Safyedîn di sala 1964an de jidayik bûye. Ew ji Elbaka Wanê, ji eşîra Pinyanişîyan e. Maleke wî li Stenbolê, yek li Elbakê ye.
- Dengbêj Salihê Qubînî: <https://www.youtube.com/watch?v=kkZ-5cxHxEPE>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Sidîqê Patnosê ji gundê Belekurtka ye. Di 1952yan de jidayik bûye lê 4 salan dereng hatiye qeydkirin. Mala wî niha li Mersinê, li qeza Tersusê ye.
- Dengbêj Şakirê Kopê: <https://www.youtube.com/watch?v=uRrOXgS-VIO0>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Şêx Mehmed Emîrî, di sala 1945an de jidayik bûye. Mala wî li Îdirê ye.
- Dengbêj Şêx Mehmed Emîrî: https://www.youtube.com/watch?v=7Y_arv2eHV0 navbera 14.23-18.44an, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.
- Dengbêj Zahiro, di 15.01.1950yî de li gundê Kinyatê yê Farqîna Amedê jidayik bûye. Mala wî li Aydinê ye.
- Dengbêj Zahiro: <https://www.youtube.com/watch?v=yVAOsh4S2K0>, Guhdarîkirina dawî: 18.05.2019.

Jererot

- 1 Dengbêj Şêx Mehmed Emîrî, di sala 1945an de jidayik bûye. Mala wî li Îdirê ye.
- 2 Sidîqê Patnosê ji gundê Belekurtka ye. Di 1952yan de jidayik bûye lê 4 salan dereng hatiye qeydkirin. Mala wî niha li Mersinê, li qeza Tersusê ye.
- 3 Dengbêj Safyedîn got "Ji Evdiyê Topal re dibêjin Evdiyê Qop. Ji gundê Bêjîngê yê Elbakê bû. Di 1986an de rehmet kir. Ez texmîn dikim Evdî ev kilam ji dengbêj Hecl Ehmedê Kebabîkê/Wanî Ehmed, wî ji jî bavê xwe Hecl Ôsiv girtiye." Dengbêj Safyedîn li gorî resmîyetê di sala 1964an de jidayik bûye. Ew ji Elbaka Wanê, ji eşîra Pinyanişîyan e. Maleke wî li Stenbolê, yek li Elbakê ye; li her du bajaran dimîne.
- 4 Dengbêj Zahiro, di 15.01.1950yî de li gundê Kinyatê yê Farqîna Amedê jidayik bûye. Mala wî li Aydinê ye.
- 5 Zahiro: <https://www.youtube.com/watch?v=yVAOsh4S2K0>, Kurmanç Bakurî: <https://www.youtube.com/watch?v=No1W-RXz-f4>, Ihsanê Mûşî: <https://www.youtube.com/watch?v=8R-Xk-OPavXw>, Şakirê Kopê: <https://www.youtube.com/watch?v=uRrOXgSVIO0>, Salihê Qubînî: <https://www.youtube.com/watch?v=kkZ5cxHxEPE>. Guhdarîkirina dawî ya hemûyan: 18.05.2019.
- 6 Nûroyê Meter/Agirî: <https://www.youtube.com/watch?v=kB-lJRCnO4U0>, Ahmedê Agirî: <https://www.youtube.com/watch?v=5gkKeT-YOQY8>, Şêx Mehmed Emîrî: https://www.youtube.com/watch?v=7Y_arv2eHV0 navbera 14.23-18.44an, Hecl Evdîlkerîmê Patnosî: https://www.youtube.com/watch?v=_mk2IDqt9kl. Guhdarîkirina dawî ya hemûyan: 18.05.2019.



33ê 3ê Rêz Hasbîhal

MELA MUHEMED GULNAR
TÎPGUHÊZÎ/LATÎNÎZEKIRIN: SÎPANÎ

Şubhetê derya ê Wanê dil me bû meskenê derdan
Bûye zindan teng û tarî her çiyû sehra ê erdan
Navebit keyfa me êdî ne bi zozan û werdan
 Bax û zozanê wisalê lê bûye çawan xela ye
 Bager û bayê payîzê li gulan bûye bela ye
 Sosin û reyhan ê van erdan yek tenê jê nemaye
Mewsîmê payîz e daran zer kirin bagerê dayê
Felekê dewr û zemanê li gulan kirye fenayê
Piştî wan yar û nedîman van çiyân sebra me nayê
 Dê evan erdan çî seyr kem bê gulê bê dilrûbayê
 Bê hevalên şeng û şoxan çiçekê yekreng û tayê
 Bilbilan ew maye bê gul çiçekan zer kir hewayê
Lê ziyaretgah e bo min he çiyê pê danî dîlber
Dê ziyaret kem mekan û menzilê yarê seranser
Çavê xwe kildem ji axa wan cihê lingê xwe da ser
 Bi kilê subhanê tu car nadem ewê ax û turabê
 Wan cihên dîlber digel me vedixwar çay û şerabê
 Ax çawan rojê wisalê geryan eynî serabê
Çend qeder gel rûgulan min jî sefa kir van deran da
Resm û asaran binêrin derkenar û ser beran da
Çû ji destê me tamam keyfa di wan roj û şevan da
 Meskem û bax û rezê mîr min dikem lê bikem tewafê
 Wan çiyê umrê me lê borî digel gerden şefafê
 Me ji wê xweştir nevêtin cenetê ew bo me kafê
Kuçik û şûnmal û erd û çîmen û mêrg û terazin
Ka xweyê wan kemerê zêr gerdenê xal zendê bazin
Hû ji wan yaran xebirdin dil kul in yan ne bi saz in
 Ger ji derdê wan dinalîn ew bira daîm di şa bin
 Nexweşin daîm ji derdan ew ji her derdan dewa bin
 Em ketin narê firaqê ew di nav lutfa Xweda bin
Ax di van pal û nîzaran dol û kendal û tev
Nav ewan qaz û qulingan ku dibûn ser ban riyan ref
Me fikir keyf û kenîne em dibûn gel qumriyan sef
 Ka gelo lezet û zewqa wî heyata gundê Unsûs
 Suhbet û seyran û geştê dûrê Sinban baxê Kundûs
 Henek û keyf û ken û laqirdî yê zazanê Sundûs
Ax eyamê bulbilan nav sorgulan canim çî xweş bûn
Em dibûn serxwoş ji bihna nêrgîzan sosin ku geş bûn
Axirê mahê gulanê çû ji dest tail me reş bûn
 Axirê bayê peyizê gulşen û baxan xerab kir
 Berf û ba bager û vistanê li ser me çî şitab kir
 Wê şeraba eyş û noşê bi Xwedê eynî serb kir
Gel perîrûyan biharan em diçûn zozanê jorîn
Lê li ser me bûye payîz gul neman rojê me borîn
Lew şevan ta subehê daîm dinalîn hem dilorîn

Ez dikim nalîn ji bona wan gulên, wan çiçekên sor
 Sed mîxabin bîbîlê wan bê zêber in dîr
 Lew dibarmim li ser wan sûretan van histirên hîr
 Ey dilo ger bîmirim ez kuştîyê wan keleşan im
 Ez ji ber tîran serad im hedefa wan çavreşan im
 Ev gelo fî im di eşqê belki ez kohê Beşam im
 Ey dilo qelbê me tîşê ji hicreta nazîk û şîrînan
 Me nema melhem ji bona van curûh û van bîrînan
 Agirê hicrê pêjandin em ketin nav van çav girînan
 Neke tekîfê ji bo min bê ewan nazîk kîbaran
 Geşt û seyrana tu zozan û tu werdan û tu waran
 Me çîger barût e dil pereng e çavê me baran
 Piştî nazdaran û şîrînan esmeran qamet bilîndan
 Şah û xaqan û emîran begleran wan şeblewendan
 Min nevé biçim hiç meclîsa xûban û rîndan
 Hicreta xûban heyata me gerand eynî ziravê
 Ji devê min tehlîyê da gewrîyê daye hinavê
 Lew ji çavê min dibarî xwîn û zox û wek seylê avê
 Dilber û ez bi tenê hatime waran bê dil û mil
 Ka were carek binêre halê min çavê me ê şî
 Dimrim canim ji derdê çavê reş hîrbên te yê kil
 Van cih û erdan dinêrim rast û çep hiç nazwuyê tu
 Te kirim mehrûm ji jinê çî kesî xanim çî yê tu
 Ma nîzanî şubhê Leyla Amîrî ba min heyî tu
 Belki ba min Sînem î Zîn î Xec î şubhê Şîrîn î
 Nexweş û kestê te me tu melhemê derdî birînî
 Dê çî bit carek werî eşan ji qelbê min derimî
 Em digel hev mil bi mil seyran dihatin van çîyan tew
 Me dîdîr keyfê teji bûn ref bîref nav van çîyan kew
 Şubhê Mecnûn lew dinalim ketme van dîrb û rîyan lew
 Ketme van çol û çîyan bê deng û his ketme emîne
 Ketme pey bêhna gulê wê dilberê aşîq hewînê
 Çiçeka barê mirazan çav xezala sumeçînê
 Te bi hicranê evîndarê xwe ça daye ezabê
 Te bi pêta agirê Gulnar gerand eynî kebabê
 Navebit keyfa me êdî hiç bi tembûr û rebabê
 Ez dikem gazî hewar hemê biken carek gula min
 Yek demê bo min bîbeje endellê û bûbîla min
 Ta ebed dê bo te bêjim sorgul û hem sunbula min
 Ez dikem gazî perîzadan ji wan dengê qe nayê
 Ça evîndarê xwe hîştin kî diye wan rewayê
 Ax halem bê wan delalan zer dibim şubhê şemayê
 Leşkerên hicrên kîre talan temam mehbûb qelandin
 Felekê kew kender û gozel ji zozanan firandin
 Çerx û dolaba dinê aşîq ji meşûqan qetandin
 Ma ne xalî menzil û Mesken ji wan yar û hebûsan
 Geştêgaha kofîxaran bûye cewlana reqîban
 Der hima û heremê çerxê kirim eynê xerîban
 Ey dilo Mîrê zirav bûye nexweş derman tunîn e
 Bûye mehrûmê wîsalê nav hinavê wî bîrîn e
 Dilberan piştî xwe danê bû nemayek xem revîn e
 Bar kirin wan dilberan Gulnarê Mîkaf ma tenê hey
 Şahişînê nazenînan mane bê goveng û ney
 Şemîrî dengê kewanê nazwuyê hiç saqî û mey





Ji herêma Surmeliyê jineke Kurd
Foto: Ji arşîva Mehmet Bayrak